# ŞOPÊN GEŞ

## Bîranînên Gerîla I


***Amedekar***
**Şivan KAVÊ**
**Aynûr AMED**
**Doğan XEZNA**



**Weşanên Dibistana Wêje ya Sarya-Baran**

**Çapkirin:** Adar 2003

**Çapxane:** Çapxaneya Ronahî

## NAVEROK

Pêşgotin………………………………………………… 5
Şerê yekemîn…………………………………………… 7
Mirinê her kêlî silav dida……………………………… 13
11 Stêrkên asîmana welatê me……………………..... 20
Wî  jiyana xwe kir qelena jiyanekî………………….. 34
Çiyayê Reşkê………………………………………….. 40
Ew şev ji bîr naçe……………………………………… 50
Birînêk bêderman……………………………………… 56
Xatir xwestinek, bêdeng……………………...…... 64
Me bêşer hêviya xwe parast……………………….... 71
Soz û peyman di rêya wan de……………………….... 76
Hêviya di xaka mirî de………………………………… 88
Serûwena ku nivî de ma……………………………..… 99
Êvar derya……………………………………………..… 107
Ax ji xwînê hêza xwe digire…………………...….. 117
Pepûleya çaremîn…………………………………….. 121
Wî baştir didît……………………………………...... 124
Berfa sor……………………………………………...... 127
Rastiyêk ji awiran dûr ……………………………..….. 135

# PÊŞGOTİN

Di dîroka her netewekî de wêje xwedî cihekî mezin û pîroz e. her gelekî û bi taybet jî her şoreşekî têkoşîn û serpêhatiyên xwe û welatên xwe bi wêjeyê kirine mîrasê paşiyên xwe. Wêja ya sedsala bîstan jî, mînaka vê yekê ye. Sedsala bîstan ku bû şahîdê gelek şoreş û serhildanan, di berhemên wêjeyî ên wan şoreşan de baş diyar dibe ku serdemeke çawa derbas bû? Wêje ya ku di siya şoreşê de li pêş ket mora xwe di sedsala derbasbûyî xist. Berhemên ku di dema şoreşa Oktoberê, Kuba, Angola û hwd. derketin mînaka herî berbiçav e. Di hêla din de, wêjevan û nîvîskarên ku di wan deman de derketin ji zêdetirên xwe di bin bandora ramanên şoreşgerî de rewşenbîrî li pêşxistin. Ronakbîrên ku li tevahî cîhanê û bi taybet jî li Rusya, li Emerîka Latîn, li Filîstîn û hwd. derketin jî, di berhemên wan de diyar dibe ku ew bûne bersiva gerîna azadiyê a gelê xwe. Di vê yekê de ronakbîran erkekî mezin bi cîh anîn.

Belê, şoreşa Rizgariya Netewa Kurd jî mînakêk ji van şoreşa ye. Bi dirêjahiya şerê çardeh salan, bi sedan bi hezaran bûyerên tirajedîk, bi jan û derasayî rûdan. Ger em bêjin ku li her deverekî welatê Kurdan bûyerekî rûdayî daye wê neşaş be. Di her bûyerekî de jî, xwîna lawekî an keçikeke Kurd rijiya ye. Di dirêjahiya şerê çekdarî de gelê Kurd her cengawerekî gerîlayekî Kurd bûye şahîd. Bi sedan bûyerên bi êş û jan. Her yekî ji wan bi sedan caran şewitandinên

gundê welatê xwe, koçberiya gelê xwe, şehîdbûna rêhevalên herî hêja li ber dilê xwe, bi çavên xwe dîtin e. Gelek caran gava ew diketin, cengê de, mirin mîna guleyên ku li ber wan diketin, wisa silav dida wan û derbas dibû. Wate, heryekî ji wan bi sedan caran mirin bi çavan dîtibû. Êdî dilê wan bibû mîna wargeha bîranîn û serpêhatiyên welatekî ji jan!

Her bûyerekî bibû mîna gulokekî rîs di dilê wan de. Lê, ma ewê tenê di dilê wan de mabana? Na…Pêwîst bû ku ew bîranînên biban mîrasekî netewî ji bo nîfşên paşerojê…û wisa bû! Pênûsê sê destan ew erkê pîroz girtin ser milê xwe. Hersê kesan pênûsên xwe kirin teşî û bi gulokên bîranînan ku di dilan de rawestiyayî bûn, dest bi hunandinê kirin. Ev pirtuka ku hûn dixweynin jî, hûnandina ku hersê pênûsa kirine ne. Ew hîn jî digerin bi xêzkirina wan bîranînên ku kesî nedîtine û jî bihîstine didomînin. Tişta ku di hembêza vê pirtûkê de hatiye nivîsandin, beşekî pir biçûk ji serpêhatiyên gerîlayên Kurd, wate mîna dilopekî ji deryaya jan û êşê wan e.

Di dawî de hêjayî gotinê ye ku beşa duyem ê pirtûka bîranînên gerîla wê di demekî pêş de derbikeve.

***Şivan KAVÊ***

# ŞERÊ YEKEMÎN

***"Laşê bêserî hatin ekranê! Serî li derûdora laşan bûn. Min got qey hinek dîmenên filman amade dikin, lê ne wisa bû! "***

Şoreş ji bo min xewnek bû. Azadî ji bo min armanc bû. Lewra di her rabûn û rûniştina xwe de min behsa welat, gerîla û şer dikir. Sal 1988 bû. Şoreşa Rizgariya Netewa Kurdistan ku agirê zayîna wê nû belav bibû, bi germahiyekî bêsînor dihate guftugoh kirin. Li kolanan li bajaran li gundan her roj gel di nava xwe de behsa şerê gerîla dikirin. Wê demê ji wan dihat gotin; "Apocî" û hineka jî digot "yên ji me çêtirin." Ez jî di wê demê de ciwanek bûm. Heskirinekî min ê mezin çêbû ku ez tevlî refên şoreşê bibim. Lê wekî ku herkes dizanî di wê demê de zêde tevgera hevala nebû. Ji ber ku hîn gel di nava wê tirsa ku dijmin bi darê zorê di nava wan de dabû rûnişkandin. Wate çûn û hatina hevala jî zêde li gundê me nebû. Fikrê min her timî belav bû û ez difikirîm; "ez ê çawa xwe bigihînim serê çiyan. Xeyalên min dûr diçûn. Min carna xwe weke bazêkî didît, ku li ser Çiyayê Cudî difiriyam û li ser lûtke ya wî datînim." Demek bi vî rengî derbas bû.

Min berê xwe da "Îstanbul" lê ez çi biçim...Min nefret ji xwe kir. Dinya li ber çavên min tarî bû, ji ber ku li wê derê tu rûmet nedidan kurdan. Berde kurd heger bizanibûyan ku tu rojhilat a Anadolêyê, wate bakurê Kurdistan kesekî kar nedida. Bi çavsoriyekî tijî kîn mirov temaşe dikirin. Lê tişta ku herî bandor li min kir ev bû. Şevêkî dema em li ber

ekranê televîzyona Tirkan rûniştibûn, laşê bêserî hatin ser ekrana. Serî li derûdora laşan bûn. Min got qey hinek dîmenên filiman amade kirin. Lê ne wisa bû. Ew dîmen bi rastî bûn. Ew serê gerîla bûn. Piştî ku ez tevlî bûm min navê yek ji ew hevalana jî fêr bûm. Ew serî yek jî ê heval Adîl bûye.

Min ji wê rojê ve xwe nema girt. Ez hema vegeriyam gund. Min ji bavê xwe re got; "belkî ev cara dawî be ku em hevûdu bibînin." Malbata me zêde di nava ramanên kemalîzmê de nehatibû helandin. Ji ber ku di rabûn û rûniştandinên xwe de wan silav didan Çiyayê Cudî. Lewra aliyê welatparêziyê her li pêş bû. Bavê min jî wiha bersiv da;

-Kurê min rê li pêşiya we vekiriye. Hûn çawa ji bo xwe baş dibînin. Wisa bikin.

Bi wê dilşewatiya xwe û xemginiyekî ku ez di vê nivîsîdê nikarim xîz bikim lewra hestê min tevde wekî di nîva agir û çiyayekî berfê de mabû. Min dest bi lêgerînê kir. Dem payîz bû, meha Îlonê bû. Daran kirasê xwe ji xwe kirin.

Min mîlîsan dît û ez bi wan re axifîm. Her çendê min partî bi şêweyekî zanistî jî nas nekiribû. Lê ez di wê baweriyê de me ku xewnê mirov çi bin ew ê bixwazê di jiyanê de heyanê ku derfetê wî hebe pêkbîne. Ji 11 Îlonê heya 16 yê Îlonê em li malekî man. Gelek guman di serê min de diçûn û dihatin. Em dihizirîn gelo ev mîlîs me nexê dest dijmin em ê kengê ji vir biçin?...Ber êvar bû mîlîs hatin û em ber bi çiyan ve ketin rê de. Ez gelek keyfxweş bûm û hîn bêhtir dema em gihiştin gerîla û bi çavan me ew dîtin. Lê bi rastî tiştek bi min nexweş hat ku ew jî ev bû; gerîla gelek pirsan dikin. "tu ji kû yî? Navê te çi ye? Ji kîjan gundî yî?..." Min hinekî bêhna xwe veda, lê nalînek bergohê min ket. Min temaşekir ku sê heval birîndarin. Di wê tariyê de firmêsk ji çavên min hatin xwarê, hestên min serûbin bû, agir bi dilê min ket. Min di hundirê xwe de got; "gereke ez tola van hevala rakim. Xwîna ku rijandine ez ji cendekên dijmin

peyale bi peyale bigrim. Min destê xwe dirêjî riwê xwe kir û firmêskên xwe paqij kir.

Min serê xwe danî ser çenteyê xwe li asîmanan temaşe kir. Stêrk wekî pezekî bêşivan di bedena asîman de diçirûsîn. Çiyayê Cudî jî bi bejn û bala xwe wekî xortekî çardeh salî bû. Qet kalbûn lê nedixuya û ba taybet di wê mehê de xurt bû. Berf zêde nema bû. Tenê di bilindahiya çiyayan de kêmek hebû. Berê ku çivîk û bilbil awazê xwe bi xwunîn dengê "rojbaş hat" em rabûne ser xwe. Piştî xwarin û vexwarinê hevalekî çek anîn û bi me dane nasîn.

-Ev klaşnîkof e.., Ev BKC ye...Ev bisivîng e...

Me çek û rextên xwe girtin. Pratîgî ketin Çiyayê Cudî qada şer. Bi grubek hevalan re em ber bi Çiyayê Cudî ve çûn û li cihekî ku jê re dibêjin "Girê Hirmo" em lê sekinîn.

Piştî ku me şevbêrka xwe bihurand, me dest bi xewê kir. Sibehê heval ji xew şiyar bûn. Hevalê Sefkan bi xemginiyekî ku lê diyar bû, rûnişt û wiha ji me re got; "

-Hevalno min xewnek dît. Min dît ku em hemû bi hev re ne. Ken li ser lêvê me ye. Bi hev re yariya dikin. Lê ji nişkêve, mij û dumanek çêbû. Keskesî nabîne...Em tev de li hev kom dibûn û ji her aliyê ve gule wek kevirên agirîn ku ji devê volkanê derkevin bi ser me de dibariya. Min hew xwe nedît destê min li tiştekî germ ket. Heya wê demê min nizanî çi ye… Lê dema ku min destê xwe anî ber çavên xwe, min fêmkir ku rûyê min ji xwîne bibû gol. Ez birîndar diketim.

Bi wî şêweyî hevalekî din jî wek wê xewnê, xewnekî dîtibû. Lê belê, şerm dikir ku xewna xwe bibêje. Lê me hemûyan a xwe xiste yek ku bêje û got;

-Gelî hevala ez naxwazim dilê we bi xewna xwe ve bihêlim. Bi kurtayî min didît ku em ketin şer de. Gule li ser çeka min nedima, ji pişt min gulek dihat û di singa min de bi cih dibû. Tişta ku tê bîra min, min çend hevok digotin û min xatirê xwe dixwest. Ez şehît diketim.

Bi rastî jî em ketin nava gumanan de. Me li hev temaşe dikir. Deng ji kesekî derneket. Bêdengiyek sar bû. Hinek

hevalan ji ber kela hestan titûna xwe derxistin û cixare li dûv cixarê kişandin. Her çendî ew xewn jî bûn, nedixwestin ku bawer bikin. Piştî ku em bi hev şêwirîn şûna ku em lê diman me bi cî hişt. Navberêk tê re derbas nebû, dijmin Girê Hırmo dan ber hawanan. Em wê demê gihiştibûn Sirtê Hasana, beranberî deriyê Dêra Kemalî ê ku li ser deştê ye. Tiştek nebû em bixwun. Saet 12 nîvê şevê bû. Hevala got em ji vir jî biçin. Her kesek ji me meraq dikir, gelo çi heye lê di vê saetê de. Me di cih de amadekariyên xwe kirin û em bi rê ketin. Meşekî dûr û dirêj di bin tava hêyvê de em meşiyan. Te digot qey neşev e. Ez hinekî li pêş hevalan bûm. Tiştekî ku diçirûsî hate ser rûyê min. Min lê niherî ew kêzikekî ku bi şevê ronahiya wan heye bû. Min ji xwe re digot;

-Gelo ev çi dixwaze bibêje. Qey kes li van waran nemaye.

Lewra ew bi xêr hatinê li me dike yan dixwaze bibêje ezê rêka we ronî bikim. Saet pênc û nîvê sibehê bû. Tenê stêrkek dihat xuya. Her çendî di meşa xwe de em bi hişyarî jî tevdigeriyan, lê me nedizanibû ku dijmin derûdora me girtiye. Bêhnekî em sekinîn. Ji nişkê ve dengê çekan hat. Gule wekî ku tovê genim biçinî bi ser me de barandin. Erdêkî rût bû, mirov nikarîbû xwe biparêzî jî. Gelek heval nû bûn. Zêde şer nedîtibûn. Dengek bilind bû û got;

-Xwe bavêjine erdê.

Me hemû ya bi hev re xwe avete erdê. Te digot qey em aşiqê axê bûne û em wê bi çekan radimusin û bi guleyan dixemlînin. Gule ji her hêlî ve dihatin; paş, pêş, çep, rast... Di nava wan de wekî gêja li min hatibû. Min berê xwe da aliyê ku gule ji pişt min ve dihatin. Hîna ez zêde nemeşîbûm. Hevalekî ez girtim û got;

-Bi sekne tu yê bi kû ve biçî?

Min jê re got;

-Ez ê herim cem hevala.

Wî bersiva min da û got;

-Ew nehevalin heval Cihat. Ew jî dijminin. Were bi min re be û ji min dûr nekeve.”

Ji her hêlîkî ve pizotê agir dihatin. Her hevalek li cihêkê bûn, li şûnêkî bûn. Barê min hinekî giran bû. Lê dîsa min berxwedan dikir. Me hewil da ku em xwe ji çemberê rizgar bikin. Hinekî em ber bi jor ve çûn hêza me zêde nemabû, û bi taybet piştî ku sê hevalê me li wir şehît ketin. Lê her yekî hevalê me wekî gurê har lê hatibû. Xwîna hevalên şehît bi dest û cilên me ve hişk bibû. Her ku me çav lê dikir, hêrsa me hîn bêhtir zêde dibû. Lê çi bibêjim. Her peqrewanek, her şehîdekî me ku xwîna xwe rijandiye ser vê xaka pîroz, ew ê rojek were û destanê wan ê qehremaniyê were nivisandin. Ew her sê heval qet ji bîra min naçin. Belkî demê ez wan hevokan dibêjim pir bi hêsanî tînim ziman. Lê ew bi kela hinavên min, ji kûrahiya kezebê bi zorê derdikevin. Li milê din, eynî van hevalên ku xewn dibînin, birîndar bûn. Şer giran bû. Guleyê min zêde nemabû. Hevalekî me yê birîndar mabû. Min ew jî dît. Birînê her sê hevala kûr bû, lê dîsa jî bi coşekî mezin dimeşiyan. Hinekî me xwe ji çemberê dûr xistin, hevalekî ji wan zêde nikarîbû bimeşe. Em du heval ketin ber pala wî de û me bi xwe re meşand.

Em gihiştin binya gundekî zêde ne mezin bû. Malên wî kevnare bû. Te digot qey ev sedsale hatiye avakirin. Bênderê kunciyan jî li nêzî gund serê xwe hildabûn. Rewşa hevalên me yê birîndar ber bi xirabûnê ve diçû. Lewra hevala ku emê hevalê Sefkan di nava bênderên kunciyan de veşêrin. Lê me nepejirand û me got em hinekî din wî derbixin ji ber ku şopa xwînê li dûv me diyar bû. Saet bibû sisê û nîvê şevê. Yan emê xwe ji wir dûr bixin yan jî şehadet li benda me hemûyan e. Di wê navberê de ez li ber pala hevalê Sefkan de bûm. Bi deng nizmiyekî bi hev re diaxifîn. Her çendî gelek xwîn ji canê wî çûbû, lê dîsa jî dixwest bi min re riya xwe bidomîne. Lê zêde nema dikarîbû. Lewra me ew li şûnekî veşart û du bombe danê. Lê wî xwest ku ez pê re bimînim. Hevalan ji min pirsî, çima hevalê Sefkan vê daxwaziyê ji min dike. Bi

rastî min nizanîbû çi bersivê bidim? Lewra min got; “ez û hevalê Sefkan du rûpelê gulekî ne. Dergehê şarêkî ne. Ava çem û rûbarekî ne. Du tîpên navêkî ne. Giyanek û du bedenin. Du dilopê ava kaniyekî ne. Du firmêskên çavekî ne. Lê dîsa jî em hevalê hevûdu ne.” Min jî xwest ku ez li cem wî bimînim. Lê hevala nepejirand û me ew bi cî hişt û me rêka xwe domand. Şefaqa sibehê diyar bû. Zerîqeyên rojê hêdî hêdî ji ser çiyan ve derdiketin. Em jî mecbûr man ku em xwe ji ber çavan veşêrin. Di nava daran de me xwe veşart. Heya êvarê me ne av, ne cixare vexwar. Ji bo ku em xwe xilas bikin, aramiyekî gelek mezin dihat xwestin. Ez bi vê sekname zêde neêşiyam. Tişta ku ez pê êşiyam ew bû ku hevalekî birîndar bi me re bû. Lê qet jê deng derneket. Te digot qey, ew birîn di canê wî de nînin. Min bi dengekî nizim jê pirsî;

-Heval ma qey tu naêşî?

Ewî wiha bersiv da min û got;

-Hevalê Cihat birîna min gelekî diêşê. Lê dema ku ez li wê temaşe dikim ez jibîr dikim.

Şivanên ku nêzî me bûn, berê xwe dan gund. Êvarê perdên xwe yê reş li ser gerdûnê ve berda. Hêdî hêdî em bendewarê wê bûn. Belkî ji bo gelekan şev tê wateya tarîtiya jiyanê ango mirina bi lez, lê ji bo me şev mizgîniya hebûnê ye. Me bi baskên teyrekî şikestî, şalûrekî bêziman ew hembêz kir. Ji ber ku şev kirasê gerîla ye û tê de her şahî û kêfa xwe dike. Ew şer, şerê min ê yekemîn bû. Ji bo min, bû ezmûna herî mezin di jiyana gerîla de.

# MİRİNÊ HER KÊLÎ SİLAV DİDA!

***"Ji hevalan qutbûn, perçekî ji dilê min qut dikir. Gihiştina çiya û refê gerîla xewna min a pêkhatî bû. Lê nexweşiya bêbext bi suwarbûna kêleka li ser Çemê Dîcle re hêdî hêdî ez ji hevalan dûr dikirin."***

Di nava her mercî de, di nava serma û seqema deşt û zozanên welatê agir û rojê de, mîna berfîna serî ji nava berfê hildidin û rû didin tava pîroz. Bav û kalên wan xwe di nava wan çiyayan de dîtin, hîn jî nifşên wan li van çiyan, bi navê gerîla ji bo mafê netewa xwe a çewsawe têdikoşin.

Hogir jî yek ji wan gerîlaya ne. Ew tenê dixwaze serpêhatiyekî bilêv bike. Ew ê me ji Çiyayê Gabarê ber bi şarên bav û kalan ve bibe.

Di payîza 1990'an de em li Çiyayê Gabarê bûn. Wê çaxê ez taze tevlî refên gerîla bibûm. Mixabin, hîn demek dirêj derbas nebibû, ji ber sermayê ez nexweş ketim. Sermaya wê salê li Çiyayê Gabarê heya niha di bîra min de ye. Di nava bêderfetiyeke pir giran de hevalan jiyana li çiya hembêz dikirin. Tişta ku heya niha mîna dîmenekî li ber çavê min e, sipîbûna pişta hevala ye! Gava em li ber agir rûdiniştin, rû û singên me gerim dibû, lê pişta me tevan mîna deşta nim girtî, ji xusiyê sipî dikir. Ev mercên ku bi mehan dirêj dikir, hişt ku nexweşiya min, min ji çiya yên Kurdistan û bi taybet jî ji Gabarê dûr bixe. Ji ber giranbûna nexweşiyê,

hevalan biryara şandina min a cem bijîjşk dan. Devara ku ez ê bibam rêwiyê reya wê, Cizira Botan bû.

Edî katjimêrên ji hev veqetînê hatibû. Piştî amadekariyê em hatin li axa Çemê Dicle sekinîn. Ji bo ku em bigihiştan Cizirê, pêwist bû ku em çem derbas bikin. Katjimêrên dawî ên sala 1990'an bû. Ji ber ku ew şeva sersalê bû, hevalan em hişyar kirin.

"Heval, leşker van rojan li Cizirê pir digerin. Çend roj berê du heval şehît xistin. Hûn şiyar bin û hay ji xwe hebin. Hûn serkeftî biçin."

Ji hevalan qutbûn, parçekî ji dilê min qut dikir. Gihiştina çiya û refê gêrîla xewna min a pêkhatî bû. Lê nexweşiya bêbêxt, bi siwarbûna keleka li ser Çemê Dicle re, hêdî hêdî ez ji hevalan dûr dikirim.

Li paş demekî kurt, bi silavdayîna milîsan re, roja tevlîbûna min a li refê gerîla hat bîra min. Lê ev car berovajî bû. Ew silav, nîşana ji hevalan dûrbûyînê bû! Silava gihiştina Cizîra Bota bû. Bi rêberiya wan herdû milîsan em gihan gundekî Cizîrê ê bi navê "Deşta Darê!" Li wir heval Yusuf li pêşwaziya me bû. Heval Yusuf wê demê rêvebirê wê herêmê bû. Gundê Deşta Darê ji ber ku di hêla ewlekariyê de baş bû, hevalan em li wir bi cih kirin. Lê mayîna me ya li wir hinekî dirêj kir. Ji ber ku mercên tîmarkirinê li Cizîrê ne zêde baş bû, hevalan berê me dan Misêbînê. Lê, mayîna me ya bîst rojan li Cizirê bandorekê mezin li ser min hişt. Her rojek dûrbûyîna min ji hevalan, li ber min mîna mehekî bû. Tenê dilsozî û girêdana welatparêzên Deşta Darê, dihişt ku em zêde bi tenêbûnê nehisin. Bi hilîna roja bîstan ji mayîna me a li Deşta Darê, me xwe ji bo çûnê amade kir. Bi hatina êvarê re, bozinga ku tangêra avê hildigirt, hat ber deriyê mala em lê bûn. Ji bo gihiştina Misêbînê em neçarbûn ku têkevin tangêra avê de. Li paş xatirxwestinê em ketin hundirê tangêrê de û derî bi mifteyan asê kirin. Tangêra ku nîv metire av tê de bû, ewqas cemidî bû ku mîna berfaqerisî li me dihat. Gava em rudiniştin, av dighişt singa me. Lê serma û seqema

hundirê tangêrê li hêlekî bû û hizirîna me li ser rû bi rû mayîna bi dijmin re, li hêlek din bû. Ji bo tedbira ku bi dijmin re hatina rû bi rû yê, me sîlahên xwe jî rakiribûn û di hundirê tangêra qerisî de, me wan dabû ber hembêza xwe, mîna dayîka ku zaroka xwe hilgire û nehêlê tu êşê bibîne, me çekên xwe bi meşa bozingê re hişk hembêz dikir.

Piştî çend katjimêran, bozing rawestiya. Ew sekna wê, nîşana gihiştina cî bû. Bii sekna bozingê re, dengê deriyê bi birxuya (vîda) hatibû kilîtkirin, hat. Bi dengê şifêrê bozingê re, me daxwe;

“Heval em gihiştin, derkevin!”

Piştî çend saetan ji nedîtina rojê, em derketin derve. Heya em gihiştin wir, roj ber bi ava bû. Te digot qey, kincên me bûne ewrên payîzê, wisa av jê dinuqitî. Bi derketina ji tangêre, gundiyê li cem me, di cih de kincên me yê şilo pilo bûyî, bi yên zuha re gûhertin. Bi pirsa xwe re me navê gundê ku em li wir bûn, fêrbûn.

“Navê gundê we çi ye?”

“Zorava ye. Gundê Mala Egidê Qaso ye heval.”

Gelê welatparêz ên Zorava bi dilgermî û pêşwaziya xwe tevahî êşên nexweşiya min, ji bîra min bir. Her çendî herdû hevalên ku ji Kongra Partiyê hatibûn dipeyîvîn, lê dîsa jî min xwe li ber gotin û girêdana van welatparêzan bi partiyê re, biçûk didît. Min bi van welatparêza û başiyên wan, rastiya gelê xwe ê Kurd hîn bêhtir dinasî.

Li dûv rojekî em ji Zorava veqetiyan û derbasî Gundê Qurdîsê yê girêdayî Misêybîn ê bûn. Her çend Zorava li paş me ma jî, lê weke masiyê ku li tûra nêçirvanekî bisekine, wisa Zorava di dilê min de bi cih bû. Vê carê ez ji herdu havalên ku ji roja yekem a rêwitiyê bi hev re bûn, veqetiyam û bi tenê li gund mam. Piştî ku hevalê Kemal ê rêvebirê navçeyê, çek û rextên me wergirt, ji min re got;

“Heval Hogir! Tu li vir be. Dema ku me rewş guncaw dît, em ê te rêbikin nik bijîjşk.”

Ew cara yekem bû ku ez bi tena serê xwe li nav gel dimam. Gundê Qurdîsê jî ev tenê mayîna min hembêz dikir. Ew gund bi giştî û bi taybet mala Hemîd ku ez lê dimam, ne tenê heval, eskerên dijmin jî pir dihatinê de. Di wê demê de ger çûn û hatina hevalan li deverekî zêde ba, dihişt ku çûn û hatina dijmin jî pir be. Gundê Qurdîsê jî rewşa wê wisa bû.! Ez 5 rojan li wir, li mala Hemîd mam. Lê ji ber ku hatina havalan dereng ma, min lawê malê rê kir nik wan. Her di wê rojê de hevalan xeber da ku ez dikarim biçim cem dixtor. Ji bo ewlekariyê jî Hemîdê xwediyê malê nasnama lawê xwe da min. Tevî ku wêne yê li ser nasnamê nedişibihî min, lê ji tinebûnê, baştir bû. Bi vî şeweyî ez roja din çûm Qiziltepe ji bo tîmarkirina xwe. Lê dixtor li şûna emeliyatkirina mîda min, hinek derman da û got;

"Ger bi dermanan baş nebe, em ê pişt re emeliyat bikin."

Nêzîkbûna ku dixtor kir, diyar bû ku welatparêz e.

Lê çûna cem dixtor û nexweşiya min li hêlekî, dîtina ewqas leşker ku li hin deran jii mirovan pirtir bûn, li hêlek din bû. Min bi gera xwe gelek cihên leşker lê radiwestin nasî. Di wê gerê de gelek tişt ketin bîra min. Yek ji wan; ji bo êrîşkirina li ser Mêrdinê, min ji nêz ve qereqol û cihê wan nasîn. Di nava ewqas esker de bêguman tirsa girtinê û nasînê jî li ba min çê dibû. Lê bêyî ku tu pirisgirêk rû bide, bi erebeya gûnd, piştî em gihiştin Mêrdinê, em vegeriyan gundê ku em jê hatibûn. Lê ji ber ku xwediyê erebê ez nasîm û ji ber ku hîn roj bû, bi armanca kes min nebîne, ez birim mala xwe. Tevî ku xwediyê erebê li ser welat û zora dijmin dipeyivî jî, min xwe neda nasîn. Bi hatina êvarê re, wî ez dîsa birim mala Hemîd.

Malbata Hemîd ji du law û çar qîzan pêk dihat. Bi rastî jî min mal weke wê nedîtibûn. Gava ez gihiştim weke ku endamekê malê piştî demek dirêj vegere wisa keyfxweşbûn. Ez çiqas li ser wê malê bêjim jî, wê nebes be, tenê dibêjim di koşeya herî binirx a dilê min de cî girtine. Min pênc roja li wir jiyan kir, lê min rojekî xwe biyanî hisnekir. Ji bo vê yekê

tişta ji destê min dihat, min dikir, tenê ji bo mal ji destê dijmin tu êşê nekişîne. Lê mayîna min li wir roja dehan jî dagirt. Lê belê jixwe nêzîkatiya wan ji min re ewqas germ û baş bû, ez êdî li hember wan xwe hertim deyndar hîsdikir. Hemû tiştê xwe ji bo xatirê me feda dikirin. Ji bo parastina hevalan û bi cî anîna erkên xwe yê welatparaziyê, gelek caran mirin jî digirtin ber çavan. Ger ez bêjim wan çend rojên min ê li mala Hemît welatparêziya rasteqîn bi min da naskirin, wê neşaş be. Her endameke malê te digot qey erkekî wî ê welatperweriyê heye, wisa bi fedakarî dixebitîn. Min gelek caran ji xwe digot, ger dijmin were gund gelo malbata Hemît bi taybet û malên gund bi tevahî wê çi bikin? Hevalan gelek caran qala welatparêziya gel kiribû. Min ew rastî tenê bi gotinan bihîstibû û naskiribû. Lê, mayîna min ê çend rojan di nava gel de ev rastî bi zelalî ji min re da nîşan-dan. Wê çaxê gotina bav û kalên me ket bîra min; “Ger Kurd, bi çavên xwe nebîne, bawernake.” Lê ê min ji hêlekî bi gotin ji hêla din ve bi çavên xwe jî min dît.

Tevî ewqas parastina xwe, rojekî serê sibehê ez bi dengê reyîna kuçikan şiyar bûm. Wê gavê xwediyê malê, ez hişyar kirim.

“Heval, eskeran dora gund girtine. Wê li malan bigerin!”

Wê çaxê min ji xwe re got ku; xebera mayina min a li gund gihiştiye dewletê. Bii tirsa hatina eskeran re min û xwediyê malê nîqaş kir. Em destpêkê gihiştin biryara ku ger esker werin hundir em ê bigrin. Lê me ev nêrîn gûhert û min kincên lawê malê “Delîl” ku şivantî dikir  (Niha di nav gerîla de ye) li xwe kir û ketim nav pez de. Piştî ku min dît esker nehatin şûna mayîna min, bi armanca ji gund dûrketinê min pez derxist çolê.

Lê hîn ez ji gund derbas nebibûm, eskerek hat pêşiya min û got;

“Hê, çoban (şivan) vegere gund. Kontirolkirina nasnaman heye.”

Wê çaxê min hinekî cesaret girt. Ji ber ku wî ez şivan nasîm. Min bi tirkî fêm dikir lê bi kurdî min bersiva wî da:

"Ez venagerim."

Lê piştî wî sîlaha xwe xist nava min, min ew tehv da paş. Dema min ev yek kir, jii jor çend eskerên din hatin, wê çaxê ji bo ku ez newim nasîn, min berê xwe careke din da gund. Hecî lawê Hemîd bû. Ji ber ku wê demê wî karê milîstiyê dikir, ew hatibû naskirin. Vê yekê hişt ku di wê rojê de were girtin. Di nava vê rewşî de tevî ku min ji xwediyê malê xwest ku min derbasî malekî din bike jî, lê wî nepejirand;

"Tu ji mala min dernakevî!"

Ew mal pir ji hêla hevalan ve hatibû bikaranîn. Ji ber vê yekê, her cara ku esker hatibana gund, dihatin wir. Dema ku eskeran li derî xist ez li ser piştê vezelandî bûm. Ji bo min nenasin ez li gel zarokan bi heftokan mijul dibûm. Gava esker silav da ez ji şûna xwe ranebûm. Wî got;

"Ma mirov wisa nêzî mêvanan dibe?" Lê xwediyê malê dest bi axaftinê kir:

"Ew zêde fêm nake, mîna dîna ye."

Tevî ku vê gotinê zora min bir jî, lê ji bo parastina min bû. Esker ku asta wî sûbay bû, pirsî:

"Lawê te ê dîn bênasname bû, ma a vî jî nîn e?"

Wê çaxê xwediyê malê ji min re got;

"Kimlîkê bidyê de."

Dema sûbay li nasnamê û wêneyê wê nêrî, serî hejand û got;

"Ev ne a te ye. Lê bila a te be!"

Û ji xwediyê malê re got;

"Bila bi me re derkeve nav gund."

"Ew zêde fêmnake bila lawê min ê din bi we re bigere."

"Wê çaxê bila bi me re li mala xwe bigere."

Ez neçarbûm ku bi wan re li mala ez lê dimam bigerim. Piştî gera li malê bi dawî bû, esker çûn malên din geriyan. Lê wekê min li jor got; piştî ji malê derketin, lawê malê heval Hecî girtin. Vê yekê hişt ku jin û zarokên gund bi eskeran re

bikevin nava şerê bi dar û qoskan. Piştî pevçûnek dirêj şazdeh esker û albayek birîndar bûn. Erebeyên wan bêcam mabûn hingî kevir lê ketibûn. Lê mixabin heval Hecî ji nava destê wan nehat derxistin. Piştî bîst û pênc rojan ji îşkence û şaş mehên hepsê, hevalê Hecî tu tiştî nabêje. Ji ber ku dijmin tu tişt jê nagire, xwestin wî di rêya qontir gerîla re, bikujin. Dema ew ji hepsê dibirin reya mirinê, heval Hecî xwe davêje dolekî li rexê rê û di bin kevirekî de xwe vedişêre. Lê ew dîsa ji hêla eskeran ve li wir tê girtin.

Hemîdê bavê heval Hecî piştî çûna eskeran got;

“Hecî hat girtin tişt nabe, tenê başe tu nehatî girtin.”

Ev peyva wî mîna morekî ku tu car winda nabe, li ser dilê min şûna xwe çêkir. Tevî ku lawê wî û zarokên wî tevan ewqas îşkence dîtin, hîn jî ji ber neişkerebûna min keyfxweş bû. Vê yekê peyvên ku li jor li ser welatparêziya gelê me digot baştir ronî kir. Mirov gelek caran dibe şahîdê gelek bûyeran. Lê tişta herî mezin ew e ku ew bûyer bi ser min bi xwe re derbas bû. Ji ber vê yekê ew mayîna min û gotinên bavê heval Hecî bûne xwedî cihekî hîn taybettir di dilê min de.( Piştî wê rojê min pir caran dixwest ku car din biçim mala heval Hemît. Mixabin, çûna min negengaz bû. Ji ber ku malbata Hemît tev de tevlî refê partiyê bibûn. Lawê wî ê ku min nasnama wî hilgirtibû di zindanê de, ji ber îşkencê şehît ket. Ên din jî tev di nav gerîla de cih digrin.)

***Vegotin: Heval Hogir***

# 11 STÊRKÊN ASÎMANA WELATÊ ME

***“Tu car zarokên rojê tîrêjên ku ji axê re dibûn çavkaniya behremê, ji bîr nedikirin. Jibîrkirin di qanûna şoreşgertiyê de tune ye.”***

Jiyan careke din di bihara 91 an de vedijiya. Bihara gul û kulîlka jiyanê ye, bihara ku senfoniya sulav û lîlava ye, bi ahenga meşa gerîla ve bibû yek can û rih…Çûk û bilbil bi dengê xwe yê bêhempa re ji gerîla re dibû xelata heviyê…Welatê minê xweşik û bêhempa bi wateyeke cuda ve pêşwaziya gerîla dibû. Bi ew xwezaya xwe ya tije raz û nepenî re rê ji jiyana azad re vedikir.

Ew bedewa nazik û zirav ji ber zordarên dil hesin tim û tim dinalî, niha bi rûkenî dilên xwe yê şikestî bi stêrkên azadiyê re şa dike. Çav şil, dil honik bibû. Ew şilî şiliya heviya ku sed hezaran salan binax bibû tê. Bi zarokên rojê re keziyên rojên azad dihat hûnandin. Her diçû kezî zêde dibûn. Her hûnandina gisûyek, dibû kêliyek dîrokî..Her tayek porê axa nazik bi êş bû, lewra hûnandina wê jî ewqas bi jan dibû. Lê, ew rûken û dilşa bû. Zarokên rojê, li derûdora wê kombûne û bi baldarî hêdî hêdî keziyên wê şeh dikin û dihûnandin. Bi hatina biharê re xweşikbûna axa şêrîn, hîn bi zelalî dixuya. Çiyayên wê yê bilind û asê bi keskayî ve dixemiliya…Di dengê çem û sulava de awaza dengê hezîn ya dîroka birîndar dihat. Bilbil dengê xwe yê ku stranên dîroka wenda digot, li ser asîmanan dixist. Stêrkên şewqdar bi hemû delalî û xweşikbûna xwe re mirov cezb dikirin.

Erê, bihara welatê min a bi navê xwe yê şêrîn Kurdistan, weke keskesoreke reng bi reng û di her rengê xwe de jî wetaya hemû hebûnan vedişart. Comerd û dilnizme xwezaya welatê min. Raza wê ji bêdawîbûna wê tê. Gerîla hevkarê vê xwezaya bêpênase ye. Ew ji deng û awaza wê re heval in. Ew çavên wê yê tarî re çirûskên jiyanê ne. Êş, jan, şadî û coşî ya wan wekhev in. Her yek gerîla bibû parçeyek vê axê. Dilê wan ê fireh li her derê vê axê diavêt. Ew zeman û cih derbas dikirin. Jixwe di nav vê xweşikbûnê de, ne mimkûne ku dil teng, hebûn bi sînor be.

Ez di wê di dema vejîna bihara nû de, li Bestayê bûm û li meskenê mîr û began dibûm şahîdê zayîna jiyaneke nû. Kela axa şêrîn bi coşa zarokên rojê re bilind bibû. Kela germa rojê bandor li zarokên xwe, zarok li axên xwe, ax jî roj û zarokan re dikir. Şerê hêvî û azadiyê gihiştibû asta herî bilind. Hestên serkeftinê divejiya, pêlên şoreşê li her derî welat belav bibû. Botan û eyaletên din tola hezar salan hildidan. Bi zanebûna rastiya dîrokê ve û bi dahûrandina tiştên paşverû re ku hiştine her tim binkeftin bibe para Kurdan, tevgerek û xebatekî mezin û nû roj bi roj li herderî welat wekî lehiyekî diherikî.

Zarokên rojê bi baldarî kom bibûn û bi pênûsên xwe yê bijarte re rûpelên dîrokê dinivisandin. Biryarên girîng û zehmet digirtin. Xweydana ku ji bedenên wan diherikî, ji pênûsên wan re dibû murekeb. Kombûyînekî giran û girîng, civînekî dîrokî dest pê kiribû. Kongreya çara ya gerîla, pêkdihat. Biryarên dîrokî û jiyanî dihatin girtin. Ji bo vejîna jiyana Kurd û rizgariya axa bedew, pêwîst bû ku li her derê welat şer hîn bi xurtir û berfirehtir bidomiya. Herêmên ku naskirina gerîla zêde pêknehatibûn, diviya ku bihata nasîn û li wan herêman jî gerîla bi cih bibûya. Herêmên stratejîk bi lez û bez pêwîst bû ku bihata girtin. Kêlî bi kêlî gerîla keziyên jiyanê dihonand. Kêlî tu car kêm û kurtiyan nediperjirand. Ji ber vê yekê jî her gavek ku dihate avêtin, gelek hessas bû. Heyecana vê berpirsiyartiya dîrokî dilê

hemû hevalan hildipekand. Dengê dilên ku bi coş û peroşmendiyekî mezin diavêt, li her derî welat wekî senfoniya rizgariyê deng dida.

Edî, kêliyê tevgerdariyê hatibû. Gerîla li hemû hereman belav dibû. Herêmên stratejîk, diviya ku di destpêk de werin girtin. Herêma Garzanê jî yek ji van herêmên stratejîk bû. Herêm, di navbera eyaleta Botan û Amedê de ye û milekî wî jî digihije Serhedê. Partî ji bo ketina vê herêmê hîn di sala 1985 an de biryar girtibû. Qerargeh li Sasonê wê bihata avakirin. Ji ber ku Garzan wekî me diyar kir, cihekî stratejîk û di nav herêmên din de reya derbasbûyînê ye. Ew, wekî dilê Bakur e. Rê divê sêkujê de digihijin hev. Ew hem niqta dîdariya rêyan hem jî niqta dîdariya rêya dirokê ye jî. Girîngiya Garzanê di dîrokê de jî gelek mihîm e. Ew, dergûştî ji raperînên dîrokî re jî kiriye. Gelek qehremanên veşartî di bin axa Garzanê de bi hêviya tolhildana dîrokî jan dikşînin. Rewşa wî ya stratejîk hiştiye ku dijmin jî vê herêmê bi lez nasbike û siyaseta xwe ya qirêj pêkbîne. Gelê Garzanê ji ber raperînên dîrokî hem welatparêz e û hem jî ji ber ku dijmin jî girîngiya vê herêmê di wextê xwe de fêmkiriye, pê re leyîstiye û li hember hest û nêzikatiyên welatparêzî, ajantî û koricitî pêşxistiye. Yanê di aliyekî de ajantî û koricitî, di aliyekî de jî welatparêzî li vê herêmê bi cih bûye. Ji ber vê yekê jî li herêmê cihbûyîna gerîla, gelek caran li gorî ku dihat xwestin pêknehati bû. Gelek caran gerîla hewildaye ku bikeve vê herêmê, lê hem ji erdnigariya herêmê re biyanî bûn û hem jî ji gelê herêmê re biyanî bûn hiştiye ku gerîla vê herêmê baş nasneke. Bi jiyaneke eşirtî jiyankirin hişt ku, ger cihekî gerîla nas bike, gelê wê cihê jî tev de gerîla nas bikin û alîkarbin, ger ciheke ku gerîla nasneke, gelê wê cihê jî tev de gerîla nasnekin û bibin alîgirê dijmin.

Eşirê Xerzî li vê heremê jiyan dikin û herêm navê xwe ji navê vê eşirê girtiye. Dîsa ev sêkuj bûye şahîdê raperînê wekî Eliyê Yunus. Kela Yunusa (Kelenûs)ku navê xwe ji rewşa xwe yê dişibe kalê girtiye, di herêmê de hîn jî di

navbera sêkuja Baykan-Motkî-Kozluk de girekî stratejîk e. Wekî dîroka xwe asê û tenê têketanekê wî heye. Bi vî awayî jî wekî kalekî sirûştî ye. Di derdorê vê de eşirê Xerzî jiyan dikin. Gerîla belkî ji vê herêmê re biyanî bû, belkî li gorî dihat xwestin bi awayekî berfireh li vê derê cih negirtibû, lê hêviya rizgariyê, girêdayiya axê û hestên ponijîn, li hember gelek wendabûn û şehîdbûnan re dîsa jî têkoşîna gerîla ku li vê herêma zor û zehmet bi cih bibe, berdewam kir. Li hember hemû astengî û keleman, têkoşîn domandin û heviya xwe tu car neşikênandin pîvanekî gerîla û şoreşgeriyê bû.

Erê gerîla bi biryarên xwe yê dîrokî re dîsa berê xwe dabû "an serkeftin an serkeftinê." Dirûşma jiyana gerîla serkeftin û tolhildan bû. Bi dawîbûna kongra çaremîn û bi amadekirina yekîneyên ku wê biçûyana Xerzanê heyameke nû vedibû. Tola heval Numan û hevalên din ku deşta Bismilê bi îxaneta rûreş re hatin şehîd kirin wê bi hata hilanîn. Tu car zarokên rojê tîrêjên ku ji axê re dibûn çavkaniya berhemê, jibîr nedikirin. Jibîrkirin di qanuna şoreşgertiyê de tune ye. Mereto çiqas bi înat û asê be, gerîla jî ewqas wekî xeta asoyekî xwedî sebr û heviyekî bêdawî bû. Wekî Şêx Cuma ya ku di geliyekî kûr de bêsekin diherikî û bi herîkîna xwe yê nazdar ve çawa bi Ava Sason, pişt re Ava Botan û pişt re jî delaliya malê Ava Dîcle re yek dibû, gerîla jî dixwest ku xwîna ku li ser van axan hatiye rijandin bike yek av. Perçebûyîna hezar salan kom bike û nirxên belabûyî bîne cem hev. Ji çemên bêdeng, çiyayên bêaso re bibe deng û aso.

Gerîla, heviya çêmên nazdar, gelî û deştên bêberhem re toxima jiyanê, niha berê xwe dide Xerzana dilşewat û jê re wê bibe dermana hezar salan. Xayîntî û îxaneta ku di nav xwe de wekî "kurmên daran" vedişêre jibîrnake û li hember çembera îxanetê, çembereke ji ronahî û çirûskên agirê çêdikî û baweriya xwe bi vê çembera ronak tînî. Du yekîne, du yekîneyê xwedî çembera ronak, derdiketin rê. Yekîneyekî di bin fermandariya heval Mervan, yekîneyekî jî di bin fermandariya heval Xeyrî û Mizgîn hatibû amadekirin. Her

hevalekî ku di nav van yekîneyan de cih digirt, bijarte bûn. Ji ber peywireke ku dabûn ser milê van yekîneyan, peywireke dîrokî bû. Edî tu asteng û kelem li hember neketina û nebicihbûyîna vê herêmê re nedikarî bibe pêwîstek. Heyama nû û biryarên ku hatibûn girtin, tu pêwîstek nedipejirand.

Di nav vê mêşa dîrokî de, cih girtina min, şensekî girîng bû. Ew şensa ku derfeta naskirina gelek hevalên nemir dabû min, di jiyana min de jî cihekî cuda digire û wekî şervanekî di yekîneya heval Mervan de cihê xwe digirtim.

Di nav çavên her hevalekî de wateyeke gelek cuda dihat dîtin. Di çirûskên çavan de dîmena dibey qey her hevalekî ketiye nav xebata neqişkirina bingeha rizgariyê, diyar dibû. Di meşa me de astenga yekem ku derket pêşiya me, derbaskirina çema ku bi ava baranê re gur bûye û diherike bû. Lê belê derbasbûyîna li ser vê avê, me gelek dida fikrandin. Emê çawa bikin, ji ku derê bi çi rengî derbas bibin?.. Av gelek gûr bû, ne mimkun bû ku em bi destê hev girtin an jî bi ben girtinê re derbas bibin. Diviya ku em di ser pirê de derbas bibin. Lê belê pira heyî jî, ji aliyê dijmin ve hatibû girtin. Derbasbûyîna me li ser pirê îhtîmala dîmendayînê mezin dikir. Lewra ji ber ku me herêm naz nedikir, vebirjarka me yê em di reyeke cûda de meşa xwe berdewam bikin jî tunebû. Bi zor û zehmetî, bi wendabûn û rîskan re emê herêm nasbikiran. Ji vê yekê jî derdorê naskirin, cihê ku careke ji wir derbasbûn wir baş naskirin û keşif kirin ji bo me gelek girîng bû. Heval hemû bi baldarî li derûdorên xwe dinêriyan. Pişt re me biryara, ji ser pirê derbas bin girt. Me bi baldarî û bi rîskên mezin re hedî hêdî bi mesafe mesafe dest bi derbasbûnê kir. Heval Mervan bi werektiyeke û bi berpirsiyartiyeke girîng, yek bi yek me ji ser pirê derbas kir. Destê me li ser tetîkê, çavên me li derdorê bû. Heyecaneke mezin û bi vê heyecanê re jî cîddiyeteke mezin me jiyan dikir. Dema ku me li hev dinêriya hiskirin û hevalbendî ya di navbera me de weke behrek e kûr û bêdawî di çavên me de dixuya. Di encam de me ew kêliyên bi

ponijîn, bi alîkariya heval Mervan re derbas kirin û meş berdewam kir. Lê belê, nenaskirina herêmê, meşê hêdî dikir. Li rastê çi werin, wê çi were jiyandin nediyar bû. Çav hişyar, rih di nava heviyê de bû. Hema di her kêliyê de wê çi biba nedihat zanîn.

Mereto, Kurîs-Kember-Sîser, Zoveser bêdeng, hatina me temaşe dikirin. Di bey qey ew jî, nexwestina me yê beriya ku em li herêmê bi cih bibin rastî dijmin werin û ketina me yê herêmê dijmin bihese, fêmdikirin û bêdeng diman. Rêzeçiyayên Kurîs-Kember-Sîser, bi tecrûbeyên xwe yê bedelgiran re dixwestin raman û hêza gerîla re bibin ronak. Ew jî hêviya dilê xwe di nav bêdengiya bi raz de vedişartin. Sîser –ku ji birû heta erçena xwe rûyê wî di şerê navbera wî û xwişka wî Kember de, bi kêr lêxistina Kember ve hatiye birîndar kirin, bûye geliyekî û rê ji bendava Sîser re vedike-ji zarokên rojê re ji bo ku bibe war û cî di nav hêviyekî de bû. Kember -ku sitûyê wê ji hêla Sîser ve piştî ku Kember rûyê wî bi kêrê diqelişîne sîrkut li serê wê dixe û sitûyê wê dikeve nav bedena wê- wekî rêzeçiyayekî bêsitû hatina gerîla silav dikir. Kurîs jî –ku birayê navîn e, di şerê navbera Kember û Sîser êdî nema şerê xwişk û birayê xwe re tehamûl dike û dikeve navbera wan. Lê belê piştî ku bi nifrînên diya xwe re ku hemû di cih de dibin çiya -bi ciwanbûn û xweşikbûna xwe re bala gêrîla dikşîne. Sîser di aliyê başûr de bi ew geliyê ku ji bendavê wî heta jêrê cihê kêra Kember nîşan dide, bilind dibe. Di aliyê bakur de Kember bêstû ku nîşaneya cihê sîrkûta Sîser e, xuya dibe. Di navîn de jî Kurîs hildikşe asîmanan. Erê, bakur, başûr û di navîna Xerzanê de ev hersê çiya dîmenekî cuda dide vê herêmê.

Meşa me di aliyê Şêrwanê de berdewam dikir. Bi rastî jî ev der cihekî gelek dîrokî û stratejîk bû. Dema ku me, Çiyayê Mêrgelo ya ku dikeve başurê rêhevrîşmê, dît, em gihiştin wê qeneatê ku, tu gotin û peyv nikare xweşikayiya vir pênase bike. Bi daristana xwe yê mezin û bi kaniyên xwe yê bêhempa re çiyayekî gelek xweşik bû. Me ji van

xweşikayiyan hezeke mezin digirt. Coş û heyecana me her diçû zêde dibû. Lê belê ji ber ku dijmin tedbîrê xwe bigre beriya me ketibû herêmê û di gelek cihan de jehra xwe vala kiribû û gelek gelê vê herêmê xistibû bin bandora xwe. Ji ber vê yekê jî em di tevgereke gelek bi xeternak de bûn.

Koricitî di sala 1985 an de ewil di Şêrwan û Mutkê de bi awayekî veşartî dest pê kiribû. 1987 an de bi awayekî fermî ev leystoka dijmin li herêmê cih girt. Dijmin li herêmê zêdetir dest avêtiye qelhên ku bi eşirtî jiyan dikin û çiyayî ne. Gelek qelh piştî raperînên ku li herêmê çêbûne û hatine perçixandin, xwe ji bajêr û tekiliyên derûdor qut kirine û bêhayê cihanê jiyan dikirine. Sala 1985 an de grubek hevalên me dikevin vê herêmê, lê belê ji ber ku bi gelê herêmê re bi awayekî germ û kûr nakevin têkiliyê û baş xwe nadin nasîn, hin qelh ji me ditirsin û di wê demê de dijminê ku dixwest li wir bi cih bibe vê derfetê ji xwe re weke firsendekî dibîne û dide şixulandin. Li vê herêmê di aliyekî de qelhekî bi vî rengî heye, di aliyekî de jî qelhekî ku bi awayekî hestên waletparêzî re bi me re ketine têkiliyê û alîgirên me ne jî hene. Zêdetir koçer di vê herêmê de piştgirên me yê herî girîng bûn. Gelê vir, hem ji ber raperînan û ji ber şerê navbera eşîran, bi awayekî şerker mezin bûne û şerker in. Lê belê bandorên xisusiyetên eşîrtî ku kî bi hêz be û kî bi bandor be dibin alîgirê wî, di aliyê şerê netewî de astengbûyîna xwe li vê herêmê jî bi vî rengî diyar dikir.

Encax nezanîna li vê herêmê kî-kî ye û çawa ye, dihişt ku em bi xeternak û şayîş bin. Dijmin ketina me yê herêmê hesiya bû û ji tirsa gerîla li vê herêmê bi cih bibe re ketibû nav tevgerê. Agahî bi çi şêweyê dihişt dijmin kêm-zêde hêdî hêdî me naskiribû. Lê hîn jî pirsgirekê me yê hînbûyîn û naskirina herêmê hebû. Kî koriciye, kî welatparêz û alîgir e, me hêdî hêdî dinasî. Her ku roj derbas dibû, me di herêmê de cihên nû keşif dikir. Mergelo di aliyê cihgirtina me yê Şêrwanê de cihê me yê destpêkê bû. Ew kaniyên wî yê bêpênase hîn jî di hiş û bîra min de ye. Kaniya Mara ku navê

xwe ji rastiya xwe girtibû, wekî efsaneyê ku li ser dihat gotin nepenî bû. Li gorî ku dihat gotin; mar di dema cotbûna xwe de tên ser vê kaniyê û piştî cotbûnê, xwe li ser vê kaniyê dişon. Bi rastî jî, li ser vê kaniyê gelek mar hebûn û mirov digot qey ev der cih û warê wan e. Dîsa ew kaniya wê ya bi navê Birgê, li gorî gotinan ev kanî ku ji latekî derdikeve -bi lexistina birûskekî re diderize û ji vê derizandinê av havînan wekî cemedê sar, zivistanan jî şiregermê tê- mirov efsûn dikir, nayê jibîr kirin. Ger erdnîgariya vê herêmê were bilêv kirin û teswîr kirin ne pênûs û ne jî hêza milan têrê dike.

Erê, em li vê herêma efsûnî roj bi roj hîn bi kûrtir diketin bin bindora hem xweşikayiya wê, hem jî zor û zehmetiya wê. Bi tecrûbeyan re me herêm nas dikir. Her diçû xebatê me pêşdiket. Dijmin bi agahiyên ku li ser xebatên me digirt zêdetir tirs û xof jiyan dikir û ew jî li herêmê xebatê xwe bi kûrtir dikir. Tirsa wî yê li hember gerîla dihişt ku bi lez û bez xebatên dijber bidomîne. Armanca me jî ew bû ku li hember hemû tiştên neyînî û dijber, bi îradeyekî bêhempa re hedefên xwe pêkanîn û rastiya Apocitî dayîna naskirinê bû. Hêviyekî bêsînor di nav me de hebû. Parvekirina me ji hev re, rêz û hiskirina di navbera hemû hevalan de nîşaneya ew biryarên dîrokî û rihê Apocitîyê bû.

Heval Mervan bi berpirsiyartiya ew biryarên girîng tevger dikir û yek bi yek bi hevalan re nîqaş dikir, fikr û nirxandina me yê li ser bûyeran digirt û bi vî rengî dixwest bigihije biryara herî baş. Yekîne ya me demêk bû ku li herêma Şîrwanê bû. Heval Mizgîn û heval Xeyrî hatin gel me. Ew wê biçûyana herêma Tatwanê. Lê heval Mizgîn, demêke li gel me ma. Di wê demê de bi pêşengtiya heval Mizgîn, moralekî hat çêkirin. Moral pir bi coş û şabûnê re derbas bû. Heval Mizgîn bi ew dengê xwe yê ku gûl û kulîlk, çiya û ber, av û lîlav, çûk û bilbilên xwezayê re dibû çavkaniya senfoniya giyanê û rengekî cûda da moralê. Careke din bi dengê heval Mizgîn re, di rih û ramana me de şewqa serkeftinê bi awayekî bêemsal beriqî. Ew deng dengê

hemû xwezayê di nav xwe de kom kiribû. Ew deng dengê serkeftinê û azadiyê bû. Xwîna ku di damarên me de derbas dibûn, bi dengê heval Mizgîn re gûr bibû, kelagerma dilê me, pola û hesinan diheland. Ev germahî û hêza me yê bêpênase tu asteng û keleman nas nedikir. Ev herêma ku ji aliyê me ve hîn jî temamî nehatibû nasîn de çavên me yê bêtirs, dilê me yê wekî agir ji me re dibû rêber. Roj û dem derbas dibûn, pêwîst bû ku êdî em bikevin nav amadekariya çalakiyekî xurt. Lewra jî di vê herêma ku pevçûn û nakokiya di navbera me û dijmin re dibû şahîd, pêwîstiya vê pevçûn û nakokiya bêdeng, bideng xistin xwe bi girîngî diyar dikir.

Hevalên rêvebir demekî bû ku ketibûn nav nîqaşa çalakî wê çawa, li kû derê û bi çi rengî pêkwere?.. Di encam de grubekî ji bo çalakiyê hate amade kirin. Ev çalakî ji ber ku li herêmê wê bibûya çalakiya me yê yekem, gelek girîng bû. Hemû heval bi baldarî û heyecanekî mezin re kêlî bi kêlî amadekariyên çalakiyê takîp dikirin. Ji bo me ev çalakî di bey qey wê bibûya nîşaneya me yê hebûn û nebûnê!....

Wateya vê çalakiyê hem di warê siyasî û hem jî di warê leşkerî de gelek girîng bû. Ger ev çalakî di aliyê me de serbiketa wê înîsiyatîf herêmê biketa destê me, lê ger ev çalakî vala derbiketa û binbiketa ji bo dijmin wê biba avantaj. Ji ber van hesasiyetan hemû heval ketibûn nav lekolîn û amadekariyê. Gruba çalakiyê bi fermandahiya heval Seîd hatibû amadekirin. Heval Seîd, hevalekî şerker, wêrek û di şerê xwe de bi mantik û xwînsar bû. Cihê çalakiyê jî piştî gelek nîqaş û nirxandinan "Şîrvan" hat pejirandin. Her biryarek ji bo çalakiyê girîng bû. Lê belê her çendî di aliyê fedekarî, coşî û tevlêbûn û şerkeriya hevalan de tu pirsgirekên me tûnebûn jî, di aliyê hakîmbûna erdnîgariya herêmê de, dîsa naskirina gelê herêmê û sazkirina binesaziyan de gelek kêm û lewaziyên me hebûn.

Wê çalakî çawa bihata çêkirin, kijan noktê sexlemtir bû ku bihata şixulandin, dijmin kîjan aliyan de cih girtiye û kî an jî kê alîgirên dijmin bûn?.. Ji aliyên me ve baş nedihat

nasîn. Lê, li hember van dezavantajan me dîsa bi hêviya serkeftinê re dest bi amadekariyên çalakiyê kiribû. Belam, ji aliyê cehş û dijmin ve hesandina cihê çalakiya me re ev çalakî guncaw nehat dîtin û em vegeriyan cihê xwe. Em hemû hîn behtir hêrs bibûn û serkeftin hîn behtir ji bo me bibû wekî azweriyekî.

Heval Mervan civînekî çêkir û pêwîstiya pêkanîna çalakiyê nirxand û careke din ji bo çalakiya Şîrwanê grubek nû hat li dar xistin. Ji ber ku çalakî û hevalên ku vê çalakiyê pêk bînin ji aliyê dijmin ve hatibû nasîn, diviya ku guhertin bihata çêkirin. Cihê çalakiyê dîsa Şîrwan bû….

Belam dijmin koricitî destpêkî li Şîrwanê pêşxistibû. Eşirtî û jiyana eşirtî li vir gelek bi cih bû. Dijmin ji bo ku ev jiyana eşirtiyê ku bi gewşînê xwe dijî cewherê Apocitî ye biparêze, destpekî serokê eşîran parast û eşîr tev de bi xwe ve girê da bû. Her wiha ji aliyê me jî ji ber ku ev çalakî bibûya çalakiya me yê yekem, divê ku cihê çalakiyê hem ji aliyê bîrdoziyê ve, hem jî ji aliyê stratejiya erdnîgariyê jî Şîrwan cihê herî baş û watedar bû. Bi lexistina Şîrwanê bersiva jiyana paşverû, hevkariyê û her wiha di herêmê de bi awayekî balkêş, me hebûn û hêza xwe nîşanê dijmin û hêzên hevkar re bidan. Ji ber  van sedeman, Şîrwan careke din bû cihê me yê çalakiyê. Gruba çalakiyê bi hesastir hat amade kirin. Fermandahiya grubê, heval Zeydîn û heval Mustafa bûn. Her du heval jî ji aliyên hevalan ve gelek dihatin heskirin û bi giranbûna xwe, zanebûn û gihiştandina xwe  mînak bûn.

Heval dîsa ketibûn nav tevgerekî bêaman. Coş û atîkbûna wan re tu gotin tunebû. Lê belê, di kûrahiya dilê me de şayîşekî hebû ku nedihat pênase kirin. Lewra jî bersiva vê hebû, nenaskirina erdnîgariya herêmê û nenaskirina koricî û sîxuran!…

Erê, plana çalakiyê amade bû… Li hember hemû metirsiyan û astengan, me dîsa jî vê çalakiya bixeternak dixwestin bixin nav pratîgê. Ewr û asîman, dar û berê ku şahîdên gelek gavên dîrokî û metirsiyanê careke din dil

bicoş, çav bihêvîdar li vê amadekarî û nîqaşan temaşe dikir. Di her lebitandinê me de çavê me li ew asoya bêsînor ve dieliqî. Bihar tenê ne a xwezaya bêhempa bû, bihar, bihara dilê me û armanca me bû jî. Dilê me bi vê pratîgbûyîna çalakiyê, wê bihara xwe hîn bi giyanber bijiya. Em, êdî bi vê dilbiharî ve ketibûn rê. Di rê de di bey qey em nedimeşiyan, piyê me ne li ser erdê bû, ewqas coşî û peroşmendî me jiyan dikir ku tu westandin an jî zorayî em nedihesiyan. Tu metirsî, me nedida seknandin. Metirsiya nenaskirina erdnîgarî û gelê derdorê ne xem bû…Careke me biryar girtibû û ev ji bo me biryarekî dîrokî bû…Di xeyal û ramana me teva de serkeftina vê çalakiyê hebû. Bi van xeyal û ramanan em sê roj bûn dimeşiyan. Her gavekî me bi gelek hesab û hesasiyetan dihat avêtin. Bi hişyarî û baldarî li derdorê xwe dinêriyan û her tiştê vê xwezayê me dixwest ku di ramana xwe de xêz bikin. Em, hem ber bi cihê çalakiyê ve dimeşiyan, hem jî derdorê xwe bi vî awayî dinasiyan. Her du bi hev re pêk dihat. Lê em baş dizanibûn ku ev rewş ji bo me çiqas metirsiyekî û dezavantajekî girîng e. Dîsa jî me her tişt girtibû ber çavê xwe, sê roj bi vî awayî em meşiyan û gihiştin nêzê cihê çalakiyê. Ji bo çalakiyê her tişt hem di ali-yê zindîbûna rih, hem jî di aliyê plan û amadekariyên çalakiyê de hazir bûn.

Heval hemû ji bilî nobedaran piştî ewqas meş û westandinê dema nîvro ketin xeweke şîrîn. Xewna biharê û germahiya nîvro, xewneke di bey qey li ser purtên kevoka xew dikî, ewqas mirov dikşîne nav xwe… Heval hemû bi xeyalên çalakiyê xew kiribûn. Piştî demekî kurt, ez jî bi xeyal û heyecanê çalakiyê ketibûm bin bandora xewna şêrîn.

Bi bangkirina hevalên me yê nobedaran ji nişka ve em ji xew hilpekiyan. Dijmin me xistibû çemberê, derdora me hatibû girtin. Paşverûtiya hevkaran û îxanetê careke din bi hemû talbûna xwe ve derketibû pêşiya me. Meşa me ji destpêkê ve heta vê dema me yê îstirehetê ji aliyê qelhên koricî û hevkaran ve hatibû dîtin. Şayîşa me yê di vê warî de

bi awayekî berbiçav li ber me disekiniya. Koricî rêya me şopandibûn û agahî dabûn dijmin. Dijmin bi vê agahiyê dikeve nav tevgerê û bi hêzeke xurt re kêlî bi kêlî firseta “me bixin dest” sekiniye. Ew di vê xalê de ji me bêhtir bi avantaj bûn. Lewra pêşengên wan, qelhên ku erdnîgariya Şîrwanê û çiyayên vê herêmê baş dinasîn bûn.

Em hemû di kêliyekî de gelek tişt fikirîn û hema ketin nav tevgerê ku dest bi şer bikin. Hêrs û kîna me bibû wek volqanekî teqiyayî, diviya ku em bi vê lawên xwe dijmin û îxanetê bihelînin û bişewitînin. Armanca me qelişandina çemberê bû. Bersiva me ji dijmin re teqandina guleyan û heta dawî berxwedan bû. Di her helî de çavên hemû hevalan de werektî û fedakariyekî bêdawî dixuya. Di her aliyan de avantaj ya dijmin bû. Lê tenê tiştekî wan tunebû ku ew ji bo wan darbeyê mirinê bû, ew jî fedekarî û netirsiya mirinê bû. Lewra Apocitî mirinê kiribû jiyan…Her xwînekî şehîdan bi vê rihê bibû giyana hezar û mîlyonan. Bi vê rihê mirovên nemir hatibûn afirandin. Em 16 heval ji ber vê yekê bi bêtirs û werekiyekî bêemsal ve hêviya xwe neşikênand û me biryar da ku girê li ber me -ku cihekî stratejîk bû- destbixin û çemberê bi vî awayî biqelişînin. Bi fermana heval Zeydîn ku ew dengê wî yê ji xwe bawer tu car ji bîra min naçe, em bi pevçûn û bin barana guleyan de ber bi girê ve şerê xwe didomand û diçûn. Leşker, koricî û sîxuran li ser rêya me wekî xweliyê bûn. Di bin her latekî û tehtekî de tije bibûn. Her yekî me li ber hevalên xwe, xwe dikir sîper. Nedîtina şehadeta hev û ji bo hev xwe fedakirin di her tevgerekî hevalan de diyar dibû.

Şer ewqas xurt bibû ku her hevalekî ketibûn bin bandora hêrs û tolhildanê. Gelek heval ji hev qut bibûn. Bang li hev kirina me gelek caran bêbersiv dima. Dengê heval Mustafa jî nema dihat…Ew dengê wî yê ku berpirsiyartiya şoreşgerî û germahiya hevaltî ve hatibû pijandin nema digihişt guhên min. Heval Mustafa ku di dema seha Serokatî de ji aliyên Serok ve bi werektî û dirûstbûna xwe, mînak dihat nîşan dan,

niha bi ew werektiya xwe re di kîjan stêrkên asîmanan de nîşanê bû û dirijiya, tenê ew dilên ku pêre diavêtin dizanibû.

Di wê heyecan, toz û duman dîsa di bin baranê fişekan de ez û heval Zekî nêzê hev bûn. Hebûna heval Zekî ji bo min dibû hêzekî bêpênase û di hebûna wî de hevalan hevalên ku niha ji wan bêagahî bibûm didîtim. Lewra jî ez û heval Zekî bi hev re bêhn û hewaya Botanê girtibûn. Li Botanê jî em bi hev re mabûn. Şerkeriya wî kena wî ya ji dil di wê pevçûna ku asîman jî ji me nedihat xuya li ber çavên min bû. Lê ew guleyên îxanet û paşverûtiyê heval Zekî jî ket. Di wê kêliyê de hemû jiyana min û hestên minê ku di nav şoreşê de di dil û rihê min de cih girtibûn, carekî de gûr bûn, di aliyekî de li ser dijmin guleyên xwe yê tolhildanê dirijandim, di aliyekî de jî min hewil dida xwe ku bigihijim heval Zekî. Bi gelek metirsiyan re xwe gihandim cem heval Zekî. Lê belê heval Zekî bi giranî birîndar bibû û tenê dixwest ku ez xwe xilas bikim. Lê kîjan dil di wê kêliyê de dixwest dest ji hevalê xwe berde. Kîjan dilê şoreşger wê vê xwestekê pêkbiniya. Tu hêz û kuweta heval Zekî nemabû û nikaribû xwe bilebitîne. Cara dawî bi awayekî hişk li min nihêrî û got; “Daxwaziya min ewe ku biçî û bigihijî hevalên din. Ez êdî nema dikarim” Fermanekî hişk û pêwîstekekî şoreşgerî da pêşiya min. Bi dil şikestî û bi êşên bêpênase, çanta û çeka heval Zekî girt û beziyam cem hevalên din. Em heft heval mabûn. Derbaskirina çemberê gelek kêm mabû. Lê belê em, li ku derê ne, erdnîgariya vir bi çi rengiye nizanibûn. Lê hîn jî em di nav şer de bûn. Carna ji hev vediqetiyan û careke din dihatin cem hev. Ez û hîn hevalên din derketibûn devreyê çemberê.

Dawiya pevçûnê 11 hevalên me bi qehremanî şehîd ketin. Ew roj di asîmana bêdawî de 11 stêrk rijiyan. 11 stêrk êdî bibûn tîrêjê rojê û şewqa xwe di germahiya roja bêhempa de digihijandin me. Heval Mustafa Gulo, Salîh Keçî, Resûl Şirnax, Rêzan (ji başûrê biçûk bû), Bişar Didêrê, Ferhad Dîdêrê, heval Adîfe û Sîdar dîsa du hevalên ji ber ku em

zêde gel hevûdu nemabûn navê wan nizanim, di vê pevçûnê de tevî karwanê şehîdan bûn. Ew bibûn efsaneyê qehremanî û fedekariyê. Her ji van stêrkan yek efsaneyekî bi serê xwe ye. Ew ji bo min û hemû hevalên me, her tim dibin çavkaniya hêvî, bawerî, fedekarî û berxwedaniyê. Ew bi rihê Apocitî, di rih û ramanên xwe de bûne yek. Pîvanekî me yê xwe ji ber çavan derbas kirinê û xwe paqij kirinê jî ew in. 11 hevalên nemir ku di di ronahiyê rojê de giyanber bûn, di herêmê de ji bo me bûn bingehê serkeftin û herêm bixin bin bandora xwe. Çawa ku em bi qehremanî û şerkeriya hevalan bandor bûn, ewqas gelê vê herêmê jî li hember vê berxwedanê bi zindî rihê Apocitî û rastiya gerîla naskir. Belkî di kêliyê pevçûnê de avantaj ê dijmin bû, lê belê di aliyê serkeftin û qehremantî avantaj ya me bû. Piştî van qehremantiyan gelê herêmê bi rêztir û germtir nêzê me bûn, koricî û hevkar jî êdî bitirs bibûn. Gelek pîvanên şoreşgertî bi berbiçavî di vê herêmê de xwe dide xuya kirin. Ewê ji me re her tim bibin pîvana jiyan û mirinê.

***Vegotin: Osman Ala***

# WÎ JİYANA XWE KİR QELENA JİYANEKÎ!

***"Wê çaxê gotinan xwe j imin dûr dikirin. wê çaxê tevahî peyv nîvço ji zimanê min derdiketin."***

Cara yekem min hevalê Salim di sala 1993 an de li Zelê di perwerdê de nasî. Di serî de me baş hev nas nedikir. Jixwe di wê çaxê de tişta herî girîng ew bû ku, em bi perwerdê re jiyan bikin. Ji ber vê yekê em zêdetir bi kar û perwerdê re mijûl dibûn. Tevî vê yekê me hevalên li kêleka xwe jî, hêdî hêdî dinasîn. Yek ji wan hevalên ku min naskir, hevalê Salimê Bazîtê bû. Heval Salim di dawiya sala 1991 ê de tevlî partiyê bibû û yek ji gerîlayên ku di şerê başûrê 92 yê de cî girtibû bû.

Dema ku min heval Salim nasî, ez pir pê bandor bûm. Wî di wê demê de bi hevaltiya xwe gelekî alîkarî bi min re kir. Dikarim bêjim ku "ew sembola rêhevaltiya rasteqîn bû." Wî bi şêweyê axaftine, dan û sitandine, meşandina jiyanê û bi hevalê kêleka xwe re mijûl bûnê re ev rastî nîşan dida. Bi kûrtasî di her warên jiyanê de, wî ev rastî bi me dida jiyankirin.

Ev naskirina min ji heval Salim re, bi qasî salekî di wê perwerde de domand. Piştî salekî tijî dersên ku min ji wî hevalî wergirtî, perwerde bi dawî bû û em belav bûn. Tevî wê yekê jî tişta di dilê min de bi cî hat! Min qet rojekî nedixwest ku ji wî cuda bibim. Ev yek jî bi çûna me ya qampa Bedewan, nêzî Hewlêrê, bi cî hat. Li wir jî bi qasî mehekî, em dîsa li gel hev man. Heyanî wê çaxê heval Salim

serleşkerê manga me bû. Wî di dirêjahiya salekî de, bi kesayeta xwe gihiştî, ez ferî gelek tiştên nû ên jiyanê kirim.

Dema ku belavbûna me hat çêkirin, em ji bo xebatê derbasî Heftanîn bûn. Devera ku em çûnê de jê re digotin "Geliyê Pisava, Dola Zawitê" wê çaxê ew bibû sê sal ez tevlî partiyê bibûm. Lê heya hingî ez derbasî nava şer nebibûm. Çûna me a Heftanînê jî di vê hêlê de ji bo min xwedî wateyeke mezin bû. Piştî demek dirêj di nava gerîla de û derfetên ku me ji perwerdan wergirtibûn, derbasbûna nava şer mîna xewnekî bû ji bo min. Di hêla din de ew nêrîna ku li ser Zelê û hevalên di Zelê de hatî rûniştandin, encax bi piratîkeke serkeftî bihata rakirin. Wê çaxê hevalên di Zelê de diman mîna kesên li rehetî û xweşiyê digerin dihatin nirxandin. Bi kinasî peyva "oportînîst" bibû behra me. Ji ber wan nêrînên wê demê, me dixwest rojek berî rojekî em derbasî nava şer bibin û xwe nîşan bidin. Wate weke misilmanê ku zû diçe mizgeftê, berî dema limêjê derbas dibe, li me hatibû. Çûna me a Heftanînê jî despêkek nû bû ji bo me. Me êdî serkeftin di karê xwe de kiribû qelenê derbaskirina wan nêrîna.

Gava em gihiştin Heftanînê, ji bo me komcivînek hat lidarxistin. Di civînê de biryara belavkirina hevalan li ser heremên cuda hat girtin. Ji ber zêdebûna hijmarê, yekîneyekî nû çêbû û me di nav de çi girt. Ji bo bi cîbûna me, Deriyê Dawetiya ku devereke stratejîk e di Heftanînê de, hatibû diyarkirin. Ew dever dikeve nêzî sînorê bakurê Kurdistan. Wate em di nava heval û dijmin de bi cî bûn. Deriyê Dawetiya xwediyê deşt û zozanekî gelek xweş û bedew bû. Ew der ji bo xwe parastin û şerkirinê pir guncaw bû. Gellek deverên xwe yên asê û saxlem hebûn. Jixwe darên wir mîna xemlekî bû û ew zozan dixemilandin. Bi kuratasî xwezaya Deriyê Dawetiya hêja bû ku mirov pişta xwe bidiyê de.

Di meha Tebaxê de me dest bi amadekariyê cîbûyînê kir. Me jî ji bo pîrozbahiya 15 Tebaxê amadekarî dikirin. Şensê min ê herî mezin jî ew bû ku çalakiya xwe a yekem, min ê di

rojek wisa pîroz de bikira bû. Ji bo ew roja watedar, hevalan çend rojan keşifa xwe kirin. Bi qasî heftekî amadekarî domandin. Armanca me, çalakiyek bêzerar bû. Bi sedema ku devera em lê diman di sînorê başûrê welat de bû û şûna ku me yê çalakî lê bikira di bakûr de bû, em neçar bûn ku hîn hefteyek ji roja çalakiyê re mayî, amadekariyên xwe bikin. Ji her hêlî ve heval pêdiviyên şer amade dikirin.

Êdî piştî wan rojên xwe hazirkirinê, hevalên yekîneyê ku hijmara wan digihişt deh kesî ketin rê. Bi coşiya çalakiya yekem, bi êvarî re em ketin rêya Gundê Alûç. Gundê Alûç ku girêdayî herema gûyîyan (Uludere) ye, şûna ku em ê lê bisekiniyan bû. Piştî şevekî ji meşê em gihiştin Gundê Alûç. Ji bo çalakî li gorî daxwaziyên me pêk were em di hêla parastinê de, gelek girên bilind ên li dora xwe girtin.

Devera ku çalakî wê lê bihata kirin, Gundê Roboskî ê girêdayî Uludere bû. Çalakî pêşî girtina panzêrên ku ji Uludere dihatin Roboskî û êrîşkirina li ser wan bû. Ew gund bi merkeza çetên Mala Peyrê tê nasîn. Devera ku hevalan ji bo êrîşkirina li ser dijmin diyar kiribûn, pênc deqan dûrî Gundê Roboskî bû. Ew der xwedî daristaneke fireh û mezin bû, ji her hêlî ve ew der guncaw bû.

Beriya destpêkirina çalakiyê, nav hatin xwendin. Hevalên êrîşê çar û ên ew diparastin jî çar bûn. Hevalê Salim jî di nava her çar hevalên parastina êrîşê dikirin de bû. Bi giştî yekîne bibû pênc gurup. A yekem ji bo êrîşê li ser panzêrê, li ser rê bi xwe. A didoyan nêzî wan li jor disekînin. A sisêyan a ku min di nav de cî digirt bû. Ew jî ji bo parastinê bû. A çaran jî ji bo destekdayînê û parastinê bû. Jixwe a dawî jî di hêlekî de revebiriya çalakiyê dikir, di hêla din de tim ji bo parastinê amade bûn. Wate bi giştî, ew girê nêzî rê, mîna bûkekî bi xelekên gerîla hatibû xemilandin. Tenê kêliyên kurt ji bo despêkirina awazên pîrozbahiya 15 tebaxê mabûn. Hîn êvara 13 yê tebax bû, her yekî enîstiromantala xwe hilgirtibû û di sengerê nêzî rê de bi cî bibûn. Her heval bi bêsebrî li benda katjimêra çalakiyê bûn.

Lê dema panzêr ji dûr xuya kirin, hevalan fermana ne êrîşkirinê dan! Wê kêliyê zanyarî gihiştin ku, erebekî çetan tê li şûna êrîşkirina li ser panzêrê û êsîrgirtina wan çetan bû armanc. Ji ber vê yekê panzêr di ber me re derbas bû bê ku em êrîş bikin. Paş demekî di heman rê re, ereba çetan diyar bû. Hevalên di êrîşê de cî digirtin, bi dîtina erebê, derketin ser rê, erebe sekînandin û dema ku yên di erebê dene peya kirin, me dît ku du jin, du zilam û zarokek 5-6 mehî di destê jinêkî de jî hebûn. Silahên sivik ên bi çetan re jî tev dest li ser hat dayîn. Armanc êdî bibû birina wan çetan ji bo şûna em lê diman. Pişt re jî bi şertê ku çetên wan gundan bi ser me de newin û sîlahên xwe deynin; me yê ew serbest berdabana. Tevî ku çetan dixwestin hevalan li ser rê dereng bihêlin û mijûl bikin jî, kes ji hevalan, bi tehdît û gotinên nexweş, nêzê wan nedibûn. Wê çaxê em pir keyfxweş bûn ku çalakî bêdeng ber bi serkeftinê ve diçe. Mixabin sengerekê çetan ku li milê din ê rê bû -ji ber ku pir veşartî bû, me nedîtibû- dema heval erebê disekinînin û çetan êsîr digrin, ew dibînin û di cî de xeberê didin dijmin. Ji ber ku şûna çalakiyê di nava çar gundan de bû û her yekî deh deqan ji me dûr bûn, hin heval li ser rê, em bi dengê kawenan veciniqîn. Tişta herî ji bo min seyr, tevî ku çetên dijmin jî bi hevalan re bûn, dîsa jî bi hawanan êrîş dikirin. Jixwe di demek kin de, ew der tijî leşkerên dijmin bû. Wê çaxê xeber gihişte me ku hevalê Seyat û Salim êsîran tînin û tên. Ji ber vê yekê fermana paşvekişê hat dayîn. Me jî bê avêtina guleyekî, hêdî hêdî ji nava guleyên dijmin xwe da paş. Dikarim bêjim ku me tevan bi zorê xwe ji cihê xwe gihande dola pişt me. Di hêla din de roleke mezin a daristanê hebû ji bo parastina me. Wê kêliye em ji hatina hevalan piştrast bûn. Ger me bizaniya heval li wir cîyê mane, me tu carî cihên xwe bernedida. Lê ji ber xeberdana rêvebiriyê ku heval bi êsîran re tên me paşvekiş kir. Piştî meşa du saetan em gihiştin Dola Roboskî. Keyfa her hevalekî ji ber nedayîna ziyan û şehîdan li cî bû. Bi gihiştina me ya dolê, hevalên din jî li paş me gihiştin. Êdî

metirsî derbas bibû û em dûrî dijmin mabûn. Lê hîna hevalê Salim û Seyat nehatibûn. Me wisa fam kir ku ew li pêş me çûne şûna ku em ê lê bighên hev. Ji ber vê yekê me rêya xwe domand heya em gihiştin cihê xwe.

Lê herdu heval nehatibûn wir û ji ber ku cihaz bi wan re tunebû, me nikaribû şûna ku lê dimînin jî fêr bibin. Wê çaxê sawek kete dilê min. Hevalê Salimê ku ew ji salekî zêdetir bû me hev dinasî û cihekê taybet di dilê min de digirt, bi nehatina wî re dilê min dikiziriya û ez ketim nava gumanan. Heya wê çaxê neketibû bîra min ku em ê ji hev qut bibin. Jixwe şehîtbûn tu carî neketibû xeyalê min, ya rast min nedixwest têximê de jî. Ew roj tev bi hizrandina li ser heval Salim derbas bû. Xew bi çavê min neket wê rojê. Bi derbasbûna wê rojê re û hatina rojek nû, min ji rêvebirên yekînê pirsî:

-Ka heval Salim nehat?

-Na heval Cihan, ew hîn nehatine. Xeman nexwe.

A rast wan nedixwest rastiyê ji min re bêjin! Lê dîsa jî ez neçarbûm ku xwe bi wan gotina qayîl û bawer bikim. Wan dizanî bê pêwendiyên min û heval Salim çiqas bi hev re xurt û rasteqîne ye. Wê rojê jî mîna mirovekî pir birçî, min xwe bi gotinên hevala gihand êvarê. Di van herdu rojên bêheval Salim derbasbûyî de, weke mirovekê bi tenê û bêxwedî min xwe hîs dikir. Kêlî li ber min dibûne sal hingî ez çav li rê bûm. Lê bi hatina wê evara dûyem re, û nehatina heval Salim û Seyat, mîna ku stêrkên ezman ji dilê min birijîn, min hîs bi şehîdbûna wan dikir. Lê tevî wê jî ez bêhevî nedimam.

Piştî du rojan ji vedana konê xemginiyê, hevalan da diyar kirin ku, herdu heval şehîd ketine. Wê çaxê gotinan xwe ji min dûr dikirin. Wê çaxê tevahî peyv nîvço ji zimanê min derdiketin. Jixwe giraniya vê nûçeyê li hêlekî bû û şêweyê şehîtketina herdu hevalan li hêlek din bû. Piştî çend rojan ew çetên êsîr gihiştin me û gotin:

-Hevalê Salim ji destpêkê û heya destpêkirina şer jî zaroka ku bi me re bû li ber singa xwe hildigirt. Wî mîna

parçeyek ji canê xwe nêzî zarokê dibû. Dema ku şer jî dest pê kir, heval Salim zarok di hembeza xwe de vedişart ku tu tişt ji zarok newe. Wî tim pişta xwe dida hêla ku gulê jê dihatin ji bo gûlê li zarokê nekevin. Lê mixabin ji ber ku dijmin pir nêzî me bû, heval Salim ji pişta xwe gule xwar û heya ket jî nehişt zarok ji hembêza wî bikeve.

Erê! Heya wan gundiyan jî bi keser çîroka şehîdbûna herdu hevalan vedigotin. Ew jî ji ber wê şehîdbûnê bibûn mirovên din. Ê yê me û bi taybet ê min ku ewqas demê ez bi wî hevalî re mabûm wê çawa be?.. Wî hevalî bi salan ji bo ku ken were li ser rûyê zarokên Kurd têkoşîn kir. Tevahî jiyana xwe fedayî wan armancên pîroz û binirx kir û di dawî de jî, ji bo jiyana zarokekî xwîna xwe feda kir û ew zarok xelas kir. Wî hembêza xwe ji a dayîka wî zarokî saxlemtir didî û wisa jî bû!

Heval Salim ne tenê di dilê me de, di dilê her kes ên welatperwer de bi cî bû. Ew ê bibe helbest, çîrok, destan û zarokên mîna ê li ber hembêza wî, we li ser mêrxasiya wî û yên wek wî fêr û hîn bibin. Ew ê tim di rûpelên herî paqij ên vî welatî de cî digire.

***Vegotin:Cîhan Qûrtelan***

# ÇİYAYÊ REŞKÊ

***“Êdî dema tevgerê hatibû. Heval hemû bi bîr û baweriya serkeftinê ve ketibûn nava tevgerê. Me xwe bi coş û peroşmendiyeke mezin ve ji bo vê peywira nû amade dikirin. Ew peywir ji bo me pîroz bû.”***

Sala 1994an, di meha Adarê de sererastkirina yekîneya me çêbû. Me, gelek hevalên vê yekîneyê, nedixwest ji herêma Uludere derbikevin û biçin herêma Metîna. Ji ber ku sala 1993an de gelek hevalên ku me nasdikir, li vê herêmê şehîd bibûn, lewma jî di hêla manewiyatê de ji bo me ev der gelek watedar bû. Me, li vê derê, gelek zor û zehmetî bi hevdu re parve kiribûn. Heskirin, bi ked û di rewşên zor û zehmet de tête afirandin. Heskirina me ya ji hev re û ji herêmê re jî, bi van merc û zirufên zehmet de vejiya bû. Ji hev û ji herêmê veqetandina me, weke neynokekî ku ji goşt bête veqetandin, bi êş û jan bû.

Lê, ev fermana partiyê bû. Her çiqas çavkaniya hestên me, li vê herêmê û hevalên ku me gelek caran bi hev re pira mirênê derbas kiribû de diherikî. Lê belê ji bo me, berjewendî û fermanên partiya me ji hemû tiştan zêdetir giring bû. Lewra em him bi moralekî geş û him jî bi moralekî nîvsar, hatin yekîneya herêma Metîna. Gelek hevalên ku bi me re hatibûn, tevlî konferansê bûn. Tevlîbûna konferansê ji bo me hêzekî mezin bû. Di rih û ramana me de moralekî bilind û hêzekî ku ji çavkaniyekî bêdawî bête xwedîkirin, diafirî. Dîsa berhema moralê me yek jê, ji bo derbasbûna herêmên hundir hêz wê ji vê herêma Metîna yê bihata

amadekirin. Ji vê yekê, li Metîna şahî û coşiyekî bêhempa dihat jiyandin. Her çiqas rewşa herêmên hundir zor û zehmet be jî, ewqas rihê hevaltî, îradeya şoreşgerî, heskirin û fedakariyên gelek mezin, di rewşên bi vî awayî de derdiket holê.

Di sererastkirina yekîne yê de, em tevî yekîne ya, heval Êrîş bûn. Heval Êrîş bii nêzikatî û helwestên xwe yê li gorî pîvanên bîrdoziyê ve, xwe dabû heskirin. Yekîneya ku heval Êrîş fermandar bû, hem di aliyê jiyanê de hem jî di aliyê şer de mînak bû. Yekîne ji heval Êrîş moralekî mezin digirt. Pêşengtiya wî yê jiyanê de baweriyekî giring dabû heval û hogirên wî. Cî girtina me yê di vê yekîneyê de, ji bo me şansekî baş bû û di demekî kurt de em hînê wê herêmê û hevalan bûn. Di nav vê yekîneyê de fedakarî û hevaltiyekî ku tu gotin nikare wê bide diyarkirin û taswîrkirin hatibû afirandin. Hemû heval, di rih û raman de yek bûn. Wêneyê hevalekî, wêneyê hemû hevalan bû! Ev rastî, baweriyekî gelek mezin di navbera hemû hevalan de çêkiribû.

Êdî dema tevgerê hatibû. Heval hemû bi bîr û baweriya serkeftinê ve ketin nav tevgerê. Me xwe bi coş û peroşmendiyekî mezin ve, ji bo vê peywira nû, amade dikirin. ew peywir ji bo me pîroz bû. Herêma ku em ê biçûyanê, hîn di nav berf û sarma yê de bû. Gelek gir û dol hîn bi berf bûn. Ev, nîşana pratîkekî zor û zehmet bû. Lê belê, moral û viyana hevalan li hember vê rewşê hîn xurttir û bilindtir dibû. Me bi zanebûna berxwedanekî mezin ve, herêm kişf dikirin. Moralê me qet kêm nedibû. Neh-deh rojan em meşiyan. Meşekî gelek zor bû. Li hember bêpêdiviyan, serma û seqema hewayê şerekî dijwar dest pê kiribû. Lewra têkoşîna gerîla tenê bi dijmin re nîn e. Têkoşîna wan a herî mezin yek jî, têkoşîna bi xwezayê re ye. Ew jî, gelek caran di nav me de hin hevalên me yê ku ji parçekî rih û canê me bûn, girt! Di dilê me de şopên gelek bi êş û jan hişt. Lê belê, em li hember wê, ne bi kîn û rik in!. Ew bê me, em jî bêyî wê nabin. Di bêjin ku “heskirin, bê neheskirinê nabe!" Gerîla jî,

xweza yê him gelek jê hesdike û yên ku herî zêde bi xwezayê re yekdibin dîsa gerîla ye, him jî yên ku li hember xwezayê şerê mezin didin jî gerîla ye. Em bi şerekî bi vî awayî ve ku di her gavekî de li ser rûpelên dîrokê şopên xwe dida diyarkirin, meşiyan. Di bin hewayekî sar û seqem de bi zeraqeyên sibehê re gihiştin gundekî. Hatina me ya gund ji bo me gelek girîng bû, ji ber ku, em nêzî gel bibûn. Belkî ev ji bo mirovekî normal ne tiştekî wisa cuda be. Lê belê ji bo gerîla, ev tişt gelek girîng e. Gerîla, berî her tiştî parçekî ji dilê gel e. Ew bi gelê xwe re, heye. Bingeha berxwedana şerên dijwar û rewşên gelek zor û zehmet ji vir tê. Ew bi hêzên, zarokên ku di nav birçîbûn, tazîbûn û bêmafê jiyanê dijîn berxwedan dikin. Ew bi hêzên, ku dayîk bi şev û roj ji çavan rondikan kêm nakin, xwîna xwe dirjînin. Hatina me ya gund ji bo vê yekê girîng bû û di nav me de gelek hestên cuda-cuda diafirand.

Li daristina ku hinek li derveyî gund bû, em bi cih bûn. Lê, li hember ewqas westandinê, vehesandin û xewkirin nedihat bîra kesekî. Zindîbûnekî bêhempa di nav me de aj dida. Heta sibehê em li wir man, piştî ku roj bişkivî me xwe berda gund. Bi moralekî gelek bilind û bi hestên wekî deryayê nêzîkê gel dibûn. Dilê me bibû weke deryayekî û gel hembêz dikir. Her yekî wan ji bo me ji hemû xezîneyê dinyayê bêhtir bi rûmet bûn. Bi coş û peroşmendiyên bi vî awayî belavî nava malan bûn. Destpêkê gel, bi şêweyekî eceb li me nihêrî. Bi şêweyekî ku bi çi awayî ev sarma û seqem hatibû qelişandin, li me dinêriyan. Piştî demekî behitîbûyîna wan hinek kêm bû, di her malî de giliyê gel, ku dijmin li ser wan zor û zordarî dida meşandin, dihat bihîstin. Ew di nav dîdariya ku hezar salane dereng mabû de bûn. Hêvî û daxwaziyên xwe yê hezar salan, di vê dîdariyê de dianîn ziman. Her gotin û giliyê wan, ji bo gerîla wekî xençerekî jehrî, li ser dilan dihat çikandin. Gerîla êş û jana gelê xwe ji dil de hîs dikir. Gotinên gel, ku digotin; “hûn eskerê me ne. Serê me bi we bilind e. Neçin. Li vir cem me

bimînin. Em êdî ji leşkeran natirsin” li ser me bandorekî mezin dikir. Gund bi gund em di wê herêmê de digeriyan û di her gundekî de malbatên hevalên me hebûn. Dema ku me xwe dida naskirin, ew ewqas keyfxweş dibûn ku êdî nizanibûn me bi çi awayî hilgirin. Ew jî aboriya xwe, bi rojane pêkdianîn. Jixwe ji bo me pêwendiyên girîng, pêwistiyê me yê bi doxtor û dermanan pêkbihata bû. Çimkî em, gelek caran dibûn şahîdên, hevalên me yê ku birîndar ji ber bêdoxtor û dermantî bi çi awayî şehîd diketin. Ev rewş ji bo me, êş û elema herî zor bû. Lewra di wê dema zor de hevalekî me yê ku hîn nû tevlî refên gerîla bibû, li Katoyê Mînosê pêlî mayînekî kir û ji lingê xwe birîndar bû. Lê belê nepeydakirina me yê doxtor û derman, hişt ku ev hevalê me li ber çavên me şehîd bikeve. Dilê me, di bey qey li ser koza agirê bû, dikiziriya, dişewitiya. Lê belê, bêçaretî careke din derketibû pêşiya me. Ango em vê bêçaretiyê ji bo xwe nedikir asteng û kelem. Me ew ji bo xwe dikir sedema hêz û têkoşînekî hîn xurttir û bilindtir. Hevalekî me yê ku warê mîran û dîrokên veşartî li Botanê, Gabara bi nav û deng de mezin bibû, bi tevlîbûna xwe yê karwanê şehîdan ve êdî meşa xwe yê têkoşînê bi awayekî din didomand. Şehîd ji bo me, her tim pêngavên nû ne. Ew pêlên bilindbûna têkoşînê ne.

Erê, di aliyekî de bi dilşewatî di aliyekî de jî bi peroşmendiyê tevgereke nû ve, me meşa xwe berdewam kir. Her hevalekî me, li derdorê xwe bi baldarî dinêriyan. Naskirina arazî ji bo gerîla girîng bû. Ji ber vê yekê bi xwezayê re yekbûn û wekî parçeyekî xwezayê tevgerkirin pîvanekî jiyana me bû. Bi baldariya pîvanên bi vî awayî re, em ber bi Sevdinê ve diçûn. Naskirina herêmê tenê bi naskirina xwezayê re nebes bû. Divê te ku jiyan, çand, dab û nêrîtên wê civakên herêmê jî bihata naskirin. Her çûna me, ku em nêzî herêma ku em ê biçuyana wir dibûn, ewqas jî pêwendiyên me yê amadekariyê zêde dibûn. Pilana çalakiya me, hîn bi awayekî zelaltir xwe diyar dikir. Di wê navberê

de, ku pilana çalakiyê xwe me dikir, dijmin li milê Lewînê operasyon dest pê kiribû û çemberê wî gelek mezin bû. Hevalên me yên wir, di nav vê çemberê de bûn. Mecalên wan ê xwe xilaskirinê, gelek zor bû. Bi girtina vê agahiyê re, em ketin nav tevgera ku bala dijmin bi awayekî bikşînin ser xwe, bi vî awayî barêhevalên xwe sivik bikin û hevalan ji nav çemberê xilas bikin. Me biryara "Êrîşê li ser qerekola dijmin bikin" girt. Her çiqas gelê herêmê em nasdikirin û ew ji me bawer bûn jî, me dîsa ewlekariya xwe baş digirt û gelek hişyar bûn. Bi berpirsiyartiya şoreşgerî û tiştên ku me ji felsefa serokatî girtî ve, ji hevalên xwe yê ku rewşa wan nebaş bûn, me, xwe berpirsiyar didît û ji ber vê yekê jî tû hedana me nedihat. Yekîneya me tev de bêhedan bûn. Di her çavên hevalekî de, ew berpirsiyartî, ji hev heskirin, cesaret û bawerî dihat dîtin. Di nav bêdengiyê de, dengên ku guhên mirov diteqîne dihat jiyandin. Çavên me tim diçû ser heval Fîras. Bi nerînên xwe re, me ji heval Fîras re digot; "Me zû bighîjîne nêzî hevala û cihê ku em ê çalakî çêbikiran." Heval Fîras pêşengê me yê rê bû. Bi zîrektî û çelengiya xwe ve bi nav û deng bû. Cihê ku ew keşif dikir, careke din ji keşifkirinê re pêwistî nedihat dîtin. Yekîneya me, ji heval Fîras gelek hesdikir. Di pêşengtiya heval Fîras de gelek çalakiyên bi serkeftî hatibû pêkînandin. Ev rastiyên heval Fîras, di nav hevalan de baweriyekî mezin afirandibû. Bi heval Fîras re rêwîtiya çalakiyê tiştekî cuda bû.

Em bi nêrînên xwe yê ku di nav bêdengiyê de dengên gelek bilind jiyan dikir dîsa ketin bin bandora hestên xwe yê bêhedaniyê. Wêneyê hevalên me yên ku di çemberê de şehîd diketin, gundên ku di nava dumana şewitandinê de winda dibûn, zarok, jin kal û pîrên ku pêxwas ketibûn riyan, li ber çavên me yek bi yek derbas dibûn. Ev wêne, di dilê me de cî digirt. Şopa wan, bi şopên wêneyên komkujî û tevkujiyên hezar salan ve yek dibûn û di rûpelên mejiyê me de xwe bi cih dikir. Dengê gelê me yê ku digotin; "tu car em ji welatê xwe venaqetin. Em dev ji axa bab û kalê xwe bernadin. Canê

me û rihê me di van agiran de bête şewitandin û xwîna me bête zûhakirin jî dîsa naçin tu der" ji bîr û ramana me dernediket. Kîn û hêrsa me her diçû zêde dibû. Sonda me ya "heke mirinekî me hebe, wê ji bo vê gelî be" her tim dubare dibû. Hestên me dibûn lehî, tu asteng û kelem li hember xwe nedihişt. Di vê navberê de, amadekariya çalakiyê de agahiyekî gihişt destê me; yekîneya tevgerî, wê were cem me û bi hev re çalakî wê pek were. Vê agahî em gelek keyfxweş kirin. Ji bo hemû tiştan, di hêla aborî û pêwistiyên leşkerî de me amadekariyê xwe dikir. Bi hatina hevalên me yê tevgerî re çalakî wê bi awayekî hîn mezintir û xurttir bihata pêkanîn. Agirê dilê me hîn geştir bibû. Hemû heval ketibûn nav tevgerekî mezin. Moral, coş û peroşmendiya me, bi girtina tola gel û hevalên xwe re ku bi vê çalakiyê me yê pêkbianiyan, mezintir dibû. Amadekariya me temam bû û hevalên ku em benda wan bûn, hatin. Bi xêrhatina hevalan, me torenek çêkir. Piştî torenê, di aliyekî de ji bo hevala xwarin û cihê vehesandinê dihat amadekirin di aliyekî din de jî, bi moral û bîrkirinekî mezin me hev hembez dikir. Ev, dîmenekî bêhempa derdixist holê.

Nîqaşên wan ê li ser bîrdozî, rastiya serokatî û pîvanên diyalegtigê gelek biponijî  û kûr bû. Em jî ji wan re li ser erdnîgariya herêmê, dîsa li herêmê cih girtina dijmin bi çi awayiye, hêzên wan çiqas e, hêlê wan ê qels çi ne, çekên ku bi kar  dianîn çawa ne û hwd. agahî didan û li ser van guftugoh dikir. Her ku me hev nasdikir baweriya me ji hevdu re xurttir dibû. Jîrbûna wan hevalan li ser me gelek bandor kir. Tevlîbûna wan ê jiyanê, ciddiyeta wan ê jiyana eskerî û kûrbuna wan ê bîrdozî û siyasî li hember hev rûmet û qedrekî giring afirandibû.

Piştî şeş rojan, amadekariya çalakiyê temambûn. Êdî roja çalakiyê hatibû. Hemû hevalan bi rih û ramanekî bêhempa amadeyê pêkanîna çalakiyê bûn. Li gorî pilana ku çêkirî; destpêkî êrîşê pênc girên ku dijmin li wir cih girtibû, wê bibûya. Gruba êrîşê yekemîn û bi çi awayî wê êrîş çêbûya

hate amadekirin û nirxandin. Dema êrîşê, di kêliyekî de çêbû. Heval kêliyê baş nirxandin û tu şehîd neda dayîn. Her pênc gir jî, bi serkeftî hat destxistin. Coş û şahî ya ku me dijiya bêtarîf bû. Di navbera bîst deqan de her pênc gir ê me bû û deng û hisa dijmin qut bibû. Niha dora pilanê duyemîn bû. Êrîş wê li ser qerekolê pêkbihata. Em bi vê serkeftinê re ji xwe gelek bi bawerbûn, tenê dengê serkeftina me, dihat me. Lê gotinek heye; "av xewdike lê dijmin xewnake." Ev gotina kal û pîran careke din rastiya xwe dida xuyakirin. Dijmin dema vedigere û giran dihêle, fêmdike ku em ê niha êrîş bibin ser qerekolê û di cih de ew jî pilana xwe çêdikin. Li ser rê, hawan û sîlahên xwe yê giran bi cih dikin. Di kemînê de benda me disekinin. Me digot qey êdî dijmin nema dikare derbikeve pêşiya me. Ji ber vê yekê hêviyekî me ya ku kemîna dijmin heye qet tunebû. Dema ku em gihiştin ser vê riyê, nişkêve gulebaran û toz û dumana çekên giran ve em rû bi rû man. Di wê kêliyê de du hevalê me, ku yek ji wan heval Rifat bû, êrîş dibin ser dijmin û şehîd dikevin. Heval Rifat, hevalekî cansivik bû. Bi cansivikî û jîrbûna xwe yê di êrîşê de, dihat nasîn. Dîsa ew berî hemû hevalan hewil dabû xwe û ji êrîşa dijmin re bibû bersiv. Werekiya wî ya mezin, nehişt ku serkeftina me di bin siyê de bimîne. Erê, du şehîdê me çêbûn, du canê me dîsa şopê xwe di dilê me de hiştin û ber bi rojê ve meşiyan. Ji vê êrîşa dijmin em xilas bûn û serkeftina me bi şewqa rojê ve tarîtî qelişand. Lê, hedana me tê!? Lehîya dilê me disekine!? Na! Hîn bi xurttir lehiya dilê me pêl bi pêl diherikî û em ketin amadekariya çalakiyekî din.

Hedefa me ya vê carê milê Başkale bû. Hêzên dijmin li wî herêmê çiqas e, li ku derê û bi çi awayî bi cih bûne, hejmara mevzî û eskerên wan çendin, çekên bi çi awayî didin bikaranîn? Hemû hat nasîn û amadekariya çalakiyê hat pêkanîn. Ji hemû hevalan re agahî hat dayîn. Saet didu yê piştî êvarê agahî ji hêla hemû hevalan ve hatibû girtin.

Saet çaran, bi operasyona dijmin re, heval ketin pevçûnê. Lê me operasyonê derbas kir. Me nizanibû ku ev operasyona

dijmin, operasyonekî berfireh e. Belê bêhayî ji dijminê koremar, me gavên xwe bi bezê diavêt. Me, dest ji plana çalakiya xwe bernedabû. Erê! Em kêliyê bi êrîşê difikiriyan. Beyî agahiya ji berfirehiya operasyona dijmin, saet heftê êvarê em herdu yekîne bi dilrehetiyekî ve bi hêzên xwe re ber bi Çiyayê Reşkê ve ketin nav tevgerê. Hemû heval bi coş û peroşmendiya serkeftinekî din re, di rê de wekî firîşteyan difiriyan.

Rê, bi awayekî hesas û baş keşif nedikir. Haya me ji tevgerê dijmin tunebû, lê dijmin bi hizrê şopa me, operasyona xwe berfireh pêkdianî. Hatina me dîtibûn. Lê bêdeng disekinîn û dengê xwe nedikirin. Ji bo ku hemû nêçîrên xwe di carekî de bi dest bixin. Di wan kêliyan de tarîtiya şevê û bêdengiya xwezayê gelek tiştên dîrokî di hembêza xwe de vedişart. Kêlî bi kêlî ew dema aloziyê nêzîk dibû. Xweza ji berî kêliya aloziyê ketibû nav jana zarokên xwe. Lê ew jî bêdeng bû. Çiya bi serbilindiya xwe rondikên xwe hîn jî dirijand. Ba, bi senfoniya xwe ve dixwest van zarokên rojê ji aloziye agahdar bike. Lê, ew jî di nepeniya  raza xwe de winda dibû. Çimkî ew jî bayê dîroka winda û gelê bênasname bû.

Erê, gav bi gav zarokên rojê, nêzê roja xwe ya dîrokî dibûn. Wê kêliya hebûn an jî tunebûnê bijiyan. Saet ber bi sibeha 3:30 an diçû, ew çembera ku xwediyê taybetmendiyê kêmînên xayîn ya hezar salan bû, niha hêdî hêdî nêçîrên ku li bendê mabû  dixist nav qefesa xwe. Yekîneyekî û nîvê yekîneya din, bêhay û gumana vê çember û kemînên xayîn ve ketin nav kêliyê aloziyê. Ji yekîneya me, nîvê hevala ketibûn nav vê çemberê, nivê din jî derveyê çemberê mabûn. Dijmin dest bi êrîşê kir. Em di wê kêliyê de him di nav behitîmayînekî mezin de bûn, him jî bi newindakirina qontrola şer ve di cî de bersiv dan. Her hevalek heta ku hêz û ramana wî têr dikir şerê xwe dida meşandin. Lê amadekariya dijmin ji ber ku gelek zêde bû û bi çekên gelek giran ve êrîşî ser me dikir û yê girîng jî, ji ber ku heval di kêliyekî

neamade de hatibûn girtin, dijmin xwediyê gelek avantajan bû. Ew wisa dihesibandin ku gelek hevala bi dest bixin û wan teslîm bigrin. Li gorî hesabên wan gerîla nikaribû li hember ewqas çekên giran û li hember gelek hejmarên leşkerî bisekinin. Li gorî pîvanên wan bi destxistina van hevalan re viyana hemû gerîla û gelê welatparêz wê bête şikandin. Wê moral û cesareta wan lewaz be û bi vî awayî bi hîn êrîşên din ve him li ser gel û him jî li ser gerîla têkoşîn têkve bibin, qels bikin.

Li hember van heseban, gerîla bersivekî ne di bîr û baweriya wan de bû, da. Heta dilopa xwîna xwe a dawî berxwedan û têkoşîna xwe domandin. Her hevalek ban hevalê xwe ê din dikir û nedixwest şehadeta hevalên xwe bibînin. Berî hevalên xwe dixwestin ew şehîd bikevin. Hemû bi yek hestî, bi yek raman, hêz û viyanî, di nav toz, duman û dengê hewanan de li ber xwe didan. Li hember bangawaziya dijmin ku digot "teslîm ol (teslî bibin)" hîn bi xurttir şer didomandin. Bersiva dijmin û li hember koletiyê bi serfirazî şehîdbûn rûmettir dihat dîtin. Dijmin li hember vê berxwedaniyê bi hovîtî diçû ser hevala. Ji wan jî gelek windabûn çêdibûn. Lê, tola her yekî ji zarokên rojê, bi kuştina hezaran leşkeran ve jî nayê hilgirtin. Her yekî wekî mehdiyekî jiyana nû bûn. Ji ber vê yekê, qehremantî û berxwedaniya ku dikirin encax mehdiyê rojê û jiyana nû bikaribûn bikin. Ji sisê û nîvê sibehê heta êvarê şer berdewam kir. Her diçûna saetêkî de dijmin hîn bi harî û hovîtiya xwe ve ji devê xwe xwîn dirijand. Çil û neh ronî, şewqa xwe didan tarîtiya êvarê. Taritî ji beriqandina vê şewqê çavên xwe digirt. Çil û neh can bi vîyanekî bêhempa heta fişekên xwe yê dawî şerê xwe dan meşandin. Lê, wehşeta dijminê ku ji cewherê mirovahî dûrketî xilas nebû. Bi ceset û perçeyên canê bêgiyan leyistin. Êdî rih wan gihiştibûn rojê, di dilê gel û hevalên xwe de bibûn şopa azadî û xilasiyê. Bibûn sulava jiyana nû.

Axîna xwezayê digihişt asîmanan. Dîsa bi xwîna zarokên rojê ve hatibû şuştin. Bi perçeyên canê wan ku hur hurî bibûn, ji nûh de xwe diafirand. Ba, bi bêhnên canên şiwitandî ve bi aramî ber bi zindîweran ve dikete rê. Çiyayê Reşkê di nav wan çiyayên ku hêvî ji rojê digirtin, serê xwe hildabû jor.

Bûyera çil û neh hevala li Çiyayê Reşkê, bûyerekî ku ne pênûs dikarin binivsîn û ne rûpel dikarin têrê bikin. Bûyerekî ku nepeniya dîroka gel û şaristaniyekî dixe nav xwe de ye. Pakrewanên Çiyayê Reşkê bersiva têkoşeneke nû û mizginiya serkeftina jiyana nû bûn. Ceserat, viyan, serkeftin, rizgarî, heskirin û giredaniya azadî û parastina mafê gel, di vê berxwedana bêhempa de bi awayekî zelal dixuye.

***Vegotin: Zağros***

# EW ŞEV Jİ BÎR NAÇE!

***"Hêviyekî bêhempa dilê wan dagirt. Wan her tişt ji bo hevalên xwe yê birîndar dikirin. Tevî ku hêz bi wan re nemabû jî, lê wan biryara ku; hevalê xwe bighînin şunekî ewle dabûn."***

Sala 1995an bû. Kela zereqeyan ya roja Tebaxê zozanên Çiyayê Şehîdan di nava germahîya xwe de dihişt. Apê Hecî ku ev pêncî sal bû dihat serê Çiyayê Şehîdan û nobedariya çilmêrên şehît digirt, destê xwe vekiri bû û ji xwedeya dilovan lava û liyan dikir ku vê şevê kes ji şervanan şehît nekeve.

Yekiniya Xumaro û Zerzan hatibûn cem hev. Armanca wan; rakirina girê Dûrê bû.

Şervan li pişt gundê Tisê bi cih bibûn. Lê mixabin, di roja dawiya eşkerekirina armancê de cerdevanên gundê Soranser, tîma keşfê dibînin û dijî wan dikevin tevgerê. Di encamê vê bûyerê de hêzên dijmin ji hev bizava şervanan agahdar dibin. Di yekem roja di gulebaran dinê de heval Jiyan pêçiyêkî destê xwe winda dike.

Edî ji vir û şûn ve şer dibû. Du tîm ji bo êrîşê, yek jî ji bo alîkarî kirinê amade bûn. Şervanan tevahî girên bilind girtibûn. Di bernamê de danîna mayînekî du kîlo li ser riya di navbera Durê û Dêmanê jî hebû.

Rojê bi giranî xatir ji gerîlayan û tevahî zindîweran dixwest. Taritî wekî hevalbendekî dibû. Berî her tiştî tîmek mayînên xwe li ser pira Gundê Dêmanê binerd bikirana.

Jixwe vê çaxê ji bo rê girtina Zirîpoşa, pêwist bû ku rêkê bigrin.

Derbasbûna katjimêran re koma şervanan li gor hatibû diyarkirin cihê xwe girtin. Piştî ku komên parastinê cihê xwe girtin di nava ronahiya çireyên gund û giran de deste ya êrîşê ber bi hola şer ve ketin rê.

Hevalê bi navê Mahmudê reş, fermandarê deste ya êrîşê bû. Bilalê Ereb, fermandarê koma milê baregehê, Dijwarê Wan ê jî fermandarê baskê milê gund bû. Her komekî êrîşê ji deh şervanan pêk dihat.

Bi kêmayî şêst leşgerên hêzên dijmin di nava çeperên xwe de, destê wan li ser tetîka çekan danî bûn û bi lerizîna çendekên xwe rê li benda êrîşên gerîla bûn. Şervanan jî bi hişyarî hêdîka xwe derbasî qada şer dikirin.

Tevahî şervanan her keliyekî vê şevê, dikirin pênûsek û dilê xwe de bûyerên ku wê biqewimin xêz dikir. Li aliyê din jî niviskar û helbestvan ê gerîla Wasfî (Hemze Yavuz) li cem rêvebirê çalakiyê rawestiya bû. Ji bo ku wê şeva seyr û kesî nedîtî binivse, temaşeyê cihê ku narîncok wê lê biteqe dikir. Gelo wê çawa biteqe? Hestên wan şervanên li wir wê çawa be? Bi vê ponijina heval Wesfî re ronahiyek fireh belavî nava gelî bû. Ev nişana destpêkirina çalakiyê bû. Lê kesî nizanî çawa dest pê bû. Weke çiyayek ji pîzotê agir diyar bû. Mixabin çalakî ne bi narîncoka ku heval Wesfî li bendê bû destpêkir! Bi teqîna guleyekî roketavêja pencî û heftê destpêkir bû. Tarîtiya şevê hol ji jiyanê re nehiştibû. Şerekî bêhempa Çiyayê Zagrosê dihejand. Di heman demê de sterk bibûn temaşevanên destpêbûna şerê vê şevê. Kesî şeveke wisa dojehî, bi çavên serê xwe nedîtibû. Pêwîst bû ku tarîtî erkê xwe li şûna bihişta û rê bida ronahiyê. Bi wê teqînê re jî wisa bû.

Bi vê dengê re şervanan ji du milî ve gir dan ber xwe, bi narîncok û gulebarandinê sing bi sing şer kirin. Di vê keliyê de mirinê jî ferhenga wan barkiribû. Tenê ji binî de rakirina vî girî, di xeyalê wan de bi cî bibû. Biryar dabûn ku vî girî ji

nexşeya (xerîta) Mezopotamya yê derxînin. Di nava guleyan de deng hat;

-Heval Bilal rawest e, tenê neçe.

-Zû werin, zû. Ger em çemberê sist bikin, ew ê me li ber xwe bibin.

Dijwar bi germbûna şer ve ji Şivan re got;

-Şivan em bi hev re herin ser vê sengera pêş xwe û em ên ku tê dene paqij bikin.

Dijwar ku deh çeper rakiri bû, bi hevalê xwe Şivan re hîn bêhtir pêş de çû. Gelek leşkeran xwe di pişta gir de veşartibûn. Lê ji bo me rakirina gir pir zor bû. Tevî vê yekê gelek ji wan jî, xwe ji zinaran de avêtibûn xwar û miribûn. Tenê rêza çeperên li pişt gir li ber xwe didan.

Kesî nizanî bû li ser gir çi qewimiye. Vê çalakiyê wekî şerê salekî dirêj kir. Tenê herkesî dizanî bû ku li wir kuştin pir e û hew;

Hevalê Heval Mehmut;

-Dijwar û Şivan şehît ketin.

Rewş her di çû xirab dibû. Diviya heval Heval Mehmut bi hevalên xwe re maba. Lê her du tîmên êrîşê jî winda dibûn. Hîn wisa bû ji nişkava deng hat:

-Hevalê Artêş gulekî RPG bavêje vê sengera ku MG/3 lê tê avêtin. Pişt re em têkevin êrîş ê.

Êrişê niha sengerên sergirtî bigirta li pêş xwe. Lê diyar bû ku, rewş ne kare serkeftinê bû! Lê êrîş û ji xwe bawerbûyîna Heval Mehmut nedihişt ku paş ve vegerê. Nikari bû ku termên hevalên xwe di nava destê dijmin de bihêle.

Artêş guleyek rokethavêj li nava gir werkir û bi gurminiya gulê re agir ji nav şervanan belav bû. Toz û dumanê her dever nixumand. Heval Mehmut ê dirêj li erdê bû. Tenê Azad, Artêş û Şervan bi çend hevalên din re, li wir bûn. Heval Mehmut bi dîtina vê rewşê fermanên “paş de kişandinê” da bê ku raweste, Şervan hevalê Heval Mehmut da ser milê xwe û kete rê. Hevalê Doxan Osyan di dema êrî-

şê de ji milê xwe birîndar bibû. Êdî tevahî hewildanên wan ji bo gihandina fermandarê xwe Heval Mehmut yê ku cihekî taybet di dilê wan de girtibû bû. Ji bo devereke ewle ji koma heval Mervan ku ew jî ji ranê xwe gule xwaribû, heval derketin. Bilalê Ereb ku ereb ê sêrtê bû, bi coş û heyecana hevalên xwe, bi mêrxasî êrîşê komên leşkerê dijmin dikir. Lê mixabin ew jî di nava barana gulayan de dimîne û şehîd dikeve.

Dijwar fermandarê bi cesaret hevalê şerê giran, keseyeta bi pîvan, çavkaniya şahî û coşî dîsa bi temen ciwan, çeleng û bi kêyf, bi Şivan re mil bi mil êrîşê ser sengerê dijmin dikirin. Ji ber vê yekê ê en birîndar heval Heval Mehmut jî nikaribûn ji cihên şer dûrbixin. Ên ne birîndar, dest ji şer bernedidan. Li gel vê yekê jî diviya ku berî bibe sibe bigihin pişta gundê Tisê.

Êdî pêwist bû ku ji desteya parastinê henêk biçin alikariya wan. Di taritiya wê şevê de du tîmên parastinê, heval Memo û Welatê Herinkê xwe gihandin tîmên êrîşê. Bi qasî pênsed gavî ji şûna şer bi dûr ketibûn. Lê, pêwist bû lez bikin.

Heval Mehmut nizanîbû çawa birîndar bûye. Bi pêşveçûnê re wî xwe di nava teqînekî dijwar de dîtibû. Di cih de goştê milê rastê tev ji hev bibû û hestiyê ejnoya wî parçe bibû. Ji serê kaba xwe de jî parçeyekî xwaribû û kunekî mezin tê de vekiribû. Di tîma êrîşê de ên ku birîndar nebibûn bi hilgirtina heval Heval Mehmut, ji ên birîndar xirabtir li wan hatibû. Êdî ew jî westiya bûn. Di kêleka rê ve ber bi gundê Dêmanê ve diçûn. Heya gund tev reya katjimêrekî bû. Lê heval Heval Mehmut xwe li ser milan nedigirt. Xwîn mîna kaniyê ji kabok û milê wî diherikî. Heval Mehmut ji ber giraniya êşên birînan, xwe winda dikir:

-Min li vir bihêlin û xwe bighînin hevalan. Hinek av bidin min;

Û peyvên xwe didomand. Lê kesî av nedidayê ji ber ku av vexwarina birîndarekî tê wateya; her tişt bi dawî dibe! Lê

heval Heval Mehmut jî ji bo ku hevalên wî xwe xilas bikin, xwe ji pişta wan dixist xwar. Hema di wê demê de fermandarê desteya parastinê, Nazim bi riya cihaza bi têl ve bang kir;

-Heval va ye me hesp rêkir, êdî tu pirsgirêk nema, hesp niha dighên we...

Mazlûm;

-Başe heval, sipas.

Bi vê yekê hêviyek bêhempa dilê wan dagirt. Wan her tişt ji bo hevalên xwe yên birîndar dikirin. Tevî ku hêz bi wan re nemabû jî, lê wan biryara ku; hevalê xwe bighînin şûnekî ewle dabûn! Hîn ev li ser keviya rê li benda hespê bûn, dumanek, bi teqînekî dijwar re, dol dagirt. Nazim demek dirêj di cihazê de bangkir. Lê Mazlum bersiv nedida. Piştî demekî dîsa dengê Mazlum hat. Ev teqîn dengê mayînekî bû, hevalên ku hesp dianîn, her du çongê xwe winda kiribûn. Herdû hespên din jî reviya bûn. Çavên heval Jiyan, ji ber kel û hilma teqînê şewitîbûn. Tenê heval Mazlum bêbirîn filitîbû.Heval Xelîl ê birîndar hê pêncî gavî nebiribûn, ji ber birîna xwe a giran li ser kêleka rê şehît bibû.

Ev car Welat û Memo hêz dan xwe ji bo ku heval Mehmut ji wir dûr bixin. Lê ji ber ku heval Mehmut nediçû ser milên wan û dixwast ku wî bi tenê bihêlin û herin, wan ji biryar dan ku li wir bimînin û gava şer derket herçar heta saxbin wê şer bikin. Lê dîsa jî Memo bi tevahî hêvî û hêza xwe, heval Mehmut hilgirt û bi rê ket. Piştî demekî ji meş, gihiştin daran. Bi bayê bezê, darbestek çêkirin, heval Mehmut bi şutikê li ser darbestê hişk girêdan û riya xwe domandin. Bi lez û bez, bi ronahiya berbangê re, xwe gihandin pişta gundê Tisê. Êdî ew keyfxweşbûn ji ber ku hevalê xwe gihandin cihêkî ewle. Westandina rê tev li hêlêkî û gihiştina wan a cî li hêlek din bû. Di wê demê de doxtor Ernesto jî gihişt wir û di cih de seromek bi laşê heval Mehmut ve girêda. Memo ji keyfa gihandina heval Mehmut

û ji mirinê xilas kirina wî, pala xwe da textê reş û di xew re çû.

Encamê çalakiyê; kuştina gelek leşkeran bû. Lê mixabin şervanên herî hêja û bi nirx di vê şerî de şehît ketin. Wan heya dilopa xwîna xwe ya dawî, ji bo paşerojekî bi ronî, a-ram û xweşî li berxwedan. Asîmanên Çiyayên Şemzînan ê, bi stêrkên azadiyê, gerdûn xemilandibû. Her ku canek ji dest diçû biryara wan ji bo têkoşînê bi hêztir dibû. Wê şevê, kese-rek din ya tolhildanê li ba şervanan zêdetir dikir. Lê piştî keliyekî heval doxtor Ernesto destê xwe li milê Memo xist;

-Heval Memo! Ka rabe, hevalê Mehmut şehît ket!

***Vegotin: Ziyad Birûsk***

# BİRÎNEK BÊDERMAN

***"Min rabirduya xwe tev dikire kûrte sînarîok. Ew bibûn wesiyetê min û tolhildana…"***

Sala 1995 bû. Ev sal di gelek hêlan de ji bo me xwedî wateyeke mezin bû. Di wê salê de, dijmin bi gelek rêbazan bi ser me de dihat. Di vê derê de tevlîbûna çetan a şer ji bo dijmin dibû avantajekî. Ji ber ku deverên dijmin nedikarî bighêje, bi rêbertiya çetan re digihişt. Wê salê em yekîneyek gerîla li Mardînê bûn. Hejmara hevalan tev şêst kes bûn. Devera ku ji bo mayînê baş bû hêla Omeriyan bû. Ji ber vê yekê li şûnekî ku jê re digotin cihê yekîneyê, em bi cî bûn.

Her di wê demê de, hevalê Kawa yê Mardînê, ku karê quryetî dikir, bi destê çeteyekî hatibû kuştin. Me jî ji bo vê yekê amadekariya çalakiyekî kir. Armanca me, em ji dû hêlan ve derkevin. Ji hêla yekem, hejmarek heval wê biçûna Mehsertê ji bo kuştina wî çetî, ji hêla din ve, em ê biçûna keşfa çalakiyekî li Mardinê bixwe. Weke her car komcivîna yekîneyê hat çêkirin. Biryara me, sê heval wê biçin ji bo kuştina wî çeteyî. Pênc heval jî di heman roj û saetê de, wê dest bi keşfê bikiran. Wê demê, gava dengê gulekî dihat, dijmin hêzên xwe dibir devera ku deng jê dihat. Armanca me jî ew bû ku, heya dijmin bi hevalan re mijûl bibe, em jî keşfa xwe bi dawî bikin.

Ji ber ku cihê keşfê zozan bû, em neçar man ku bi hijmarek kêm biçin. Deşta Mêrdîn û çiyayê wê pir ji hev cuda ye. Devera ku em yekîneyek heval lê diman, tev dar û zinarên asê bû. Ji ber vê yekê, dijmin bihêsanî nedikarî ku

keysê ji me xweş bike. Ger mirov bêje “xweza mina dayîkan gerîla diparêze, wê ne şaş be.

Piştî amadekariyên çend rojekî, em ketin rêya Mêrdîn û hevalên din berê xwe dan Mehsertê û Mêrdîn heryekî şevekî dûrî cihê ku em lê diman bûn. Ji ber vê yekê hîn katjimêr sisê yê paş nîvro bû, em bi rê ketin. Em li wir bûn sê grup. Keşfê, me bi rakirina pêdiviyên rê re, çek û rextên xwe hildan û berê xwe dan Mêrdîn ê. Piştî meşa şevekî di deşta Mêrdîn de, em gihiştin rojhilatê bajêr. Devera ku me yê keşf bikira, hejmarek mezin esker û fermandarên dijmin lê diman. Em bi biryar û coşeke mezin gihiştin wê derê. Ji bo me jî di Mêrdînê de çalakiyek pêkanîn, dihate wateya serkeftinek mezin. Qonaxa ku partiya me di wê demê de gihiştibûyê de, ev yek li ser me mîna erkekê pîroz feriz dikir. Gel bi çalakiyên bajara, moralekî mezin digirt. Bi kinasî di bajarekî de çalakîkirin, wateyek xwe ya mezin hebû.

Bi katjimêr sisê yê sibehê re, em gihiştin nêzî bajêr. Ji ber ku deşteke rut bû, me xwe di nava hinek latên mezin de veşart. Mêrdîn di wê şevê de, mîna ezmanekê tijî stêrk dixuya. Ronahiyên gelek hewş û kolanan, bajêr ronî dikir. Tişta yekem ku em pê rabûn, derxistina nobedarekî bû. Piştî ku me zanî em di devereke ewle de ne, me hinekî bêhna xwe derxist. Ji xwe di heman demê de, her sê hevalên din, karê xwe bi dawî kiribûn. Lê ji ber êrîşa çetan li ser wan, heval neçar dimînin sê çetên din jî ku di nava wan de lawê Hesenê Fermê ê ku li ser çetan rêvebir bû, bikujin. Hêrsê heval ji ber vê yekê neçar dimînin ku di rêyek din re bighên yekîneyê. Dema ku xebera kuştina çetan digihije dijmin, di cî de operasyonê dest pê kir. Êdî dijmin ji her hêlî vê kete nava tevgerê. Ji ber ku em pir nêzî bajêr bûn, me nikaribû di derbarê hersê hevalan de, di rêya cihaz re nûçeyan werbigrin. Tişta ku me sibehê bihîst jî, di rêya nûçeyên radiyo ya dijmin de bû.

Wê êvarê heya sibehê em li nav keviran man. Me her tiştê xwe li gor sibehê amade kiribû. Lê dema em rabûn, em hijmarek esker ku di jor me re derbas bûn, dît. Êdî min û

hevalên xwe fêmkir ku li vir jî tevgera dijmin dest pê kiriye. Jixwe devera hatibû diyarkirin ji bo ku em piştî keşfê lê bighên hev, ji êvarî de dijmin pisû lê avêtibû. Ew dever dikete navbera çend gundan û ji wir rê dihat Mêrdînê. Piştî ku me zanî dijmin li wir bi cî bûye, em neçar man ku bi cihazê û li ser xeta giştî bi hevalan re, têkevin pêwendiyê. Piştî bankirina çend cara, hevala bersiv da. Wê gavê wan nizanî bû ku dijmin li wir e. Ji ber vê yekê bi şêweyekî veşartî (şîfre) me got;

-Vegerin.

Dijmin jî dengê cihazê me dibihîst. Wan jî fêmkir ku em di nava wan de ne. Hingî em ji cihê êvarî hatibûn nêzî dijmin bixwe. Piştî pêwendiya me ya bi hevalan re, dijmin li wan deran belav bû. Hevalên yekîneyê ku paş de vedigeriyan, ferman dan ku em jî vegerin. Tevî ku me dizanî vegera bi roj metirsî ye jî, lê hevalan got;

-Hûn zû newin dijmin wê we bibîne!

Ve yekê hişt ku em di wê rojê de amadekariyên vegerê bikin. Her çend min ji hêla xwe de ev ferman rast nedît jî, ez weke taxim qomitaniyekî neçar bûm ku pêk bînim. Di cî de, me rêya xwe girt û ber bi dolekî ve çûn. Pişrtî demekî meş, em gihiştin dola Gozelê ku nêzî Mêrdînê ye. Dol bi qasî 200 metrî fireh bû. Ava ku tê re derbas dibû, ji fabrîqa ya ku li jorî dolê bû, dihat. Av tev ji ber çîmento yê sipî bibû. Di ser avê re pirek hebû. Em pir bi hişyarî ber bi pirê ve diçûn. Armanca me ew bû ku, em derkevin girê aliyê din ê pir ê û di wir e herin cihê xwe. Lê wê kêliyê tenê bi qasî 200-250 metre di navbera me û leşkerên Tirk de mabû. Bê ku em kesekî bibînin, me rêya xwe domand. Hîn em negihiştibûn pirê, hevalekî ji min re bi henekî got;

-Heval Hogir! Ger em li ser vê pirê bikevin pisû yê, em ê çi bikin?!..

Ez bi wî hevalî de acîz bûm. Ji ber ku ev cara yekem bû ku em di nîvro de wisa serbest digerin. Tevî ku tevgera bi roj qedexe bû jî, lê em neçar bûn ku fermana hatiyedayîn pêk

bînin. Em gerîla ne. Ferman ku hatdayîn, çi dibe bila bibe, pêwîste pêk were. Bi roj jî vegera me, sedem ev bû.

Paş kêliyekî ji sekna me ya nêzî pirê, me dest bi meşê kir. Di navbera her yekî ji me de, deh pazdeh metire hebûn. Di xaçerêyekî kêlêka pirê re em dimeşiyan. Di wê kêliyê de hevalê nêzî min got;

-Heval Hogir! Gundiyek li ber wî kevirê hanê heye?

Kevir li nêzî me bû. Min meyze kir ku ne gundiye, eskereke çeka wî li kêlekê ye û difikire...Min fêm kir ku nobedar e. Hema di cî de min rahişt kevirekî ji bo bavêjim hevalê li pêşiya min diçe berî ku deng derxe û esker bi me bibîne. Qet nediket bîra min ku di vê dola nêzî Mêrdînê de pisû hebe. Mixabin, hîn min kevir neavêtibû, hevalê li pêş min, bankir;

-Hûn çima nayên heval Hogir?

Jixwe di deverên wisa de tim gule li ber e. Nexasim, ku em eskeran bibînin. Destê min li ser tetîka sîlaha min bû. Min hîs dikir ku ev ekser nebitenê ye. Ji ber vê yekê min paş te veger baştir didît. Lê dema wî hevalî sedema rawestandina me pirsî, ê esker ku heya wê kêliyê jî heval wisa ji nêzîk ve ne ditibûn, ji tirsa û behitibûnê daxwe û bê ku sîlaha xwe hilgire kire qîr û hewar:

-Terorîst...Terorîst...

Di cî de min fêm kir ku dem derbas bû ji bo xwe xilas kirinê. Gava ê esker kire qîr, min berê çeka xwe dayê û ew da ber gulan. Bi dengê çeka min û ketina esker re, min dît ku eskerên raketî tevan daxwe. Bi kêmayî sîh esker hebûn. Bi vî şêweyî ji xew rabûna wan, tev kirin panîk û hêyecanê de. Sanî di nav re derbas nebûn, min dît ku ezman bi guleyên wan tijî bû. Ji bo ku nikaribin yekser keysê ji me bînin, min gule li dûv gulan bi hêla wan ve davêt. Vê yekê hişt ku nikaribin ji pişt şikêrê derkevin. Tişta herî baş ew bû ku em li hember hev bûn. Ger ne wisa ba, me nikaribû ku gavekî ji cî bavêjin.

Di nava teqe reqa çekan de, ez bi rêya vegerê diponijîm. Lê zêde rê nemabû. Pişta me Mêrdîn e, em nikarin herin. Pêş me esker in. Tenê girêk li hêla din a pirê hebû, ger me ew bigirta, xilasbûna me hebû. Ji bo girtina wî girî min dû heval rêkirin. Heyan hingî jî eskeran keys ji me ne anî bû. Jixwe herdû hevalên li paş min jî xwe avêtibûn erdê û gule bi hêla latê ku esker di piştê bûn, davêtin. Êdî hêviya min ma herdû hevalên ku çûna gir bigrin. Mixabin wan şaş famkiribû û li wir ne sekinî bûn. Di kurtirîn dem de pêwist bû em ji wir dûr bi kevin. Lê di heman demê de, pêwîst bû ku em rê nedin eskeran ku sengeran bigrin. Em man sê heval li wir. Hingî xelasbûn ji bo min rehet bû, lê erkê min ê qomitantî û ji wê zêdetir ê hevaltî û şoreşgerî xelaskirina herdu hevalên din bû. Dema min dît ku du heval ji me qûtbûn û wext jî derbas dibe, min bangî herdu hevalên li paş xwe kir:

-Heval werin....Werin em ê derbas bin.

Lê yek ji herdu hevalan jî ji cî nedaxwe. Hîna min bangî wan dikir, min hîs kir ku destê min tevizî û giran bû. Tevî ku guleya M16 li milê min ê çepê ketibû jî, min qet nizanî bû. Çaxa destê min çek negirt, min zanî ku ez birîndar bûm. Êdî ji wir û şûn de, hêviya xilasbûn, dîtina hevalan û parastina herdu hevalên bi min re, weke keştiyekî, di deryaya bêdawî de winda bibe li min hat. Wijdanê min mîna girtiyê di nava lepê celadekî de dikire nalenal. Jixwe mirin di wê kêliyê de bibû gerokê nêçîra xwe. Lê ji bo min mirin pir hêsan bibû. Ji ber ku ji her hêlî ve guleyan berê xwe hêdî hêdî didan me. Di wê navber ê de tiştekî pir seyr hat bîra min. Berî ku ez tevlî partiyê bibim min li filmekî Filîstîniyan temaşe kiribû. Di wî filmî de kesê ku rola serekî dileyst navê wî Emîn bû. Emîn jî ji destê xwe birîndar dibû. Di cî de kefiya xwe weke werîsekî bi sukra xwe ve girê dida û destê xwe dixiste xeleka kefiyê de. Min jî bê ku dereng bimînim, wisa kir û çeka xwe danî ser destê birîndar û avêtina guleyan domand. Gelek caran çek ji qontirola destekî derdiket û gule tewş diçû. Di nava vê

qelebalixê de, dengê cihazê hevalan dihat. Lê min wext nedidît ku bersiv bidim.

Heya hingî jî, min bang li heval Azad û Çekdar dikir. Lê ne bersiv didan ne jî ji cihê xwe dihatin. Gava min dengê xwe hilda, heval Azad ku ji Misêbînê bû, daxwe û ber bi min ve hat. Hîn heft mitir di navbera me de hebû, heval Azad bêçek  ket. Dema min ew wisa dît, min fêm kir ku ew birîndar bûye. Lê min nizanî bê hîn li cihê xwe birîndar ket an jî dema rabû û ber bi min ve hat. Çaxa ket min jê pirsî;

-Heval Azad! Ka çeka te?

-Li şûna min maye heval Hogir.

Piştî ku min baş li heval Azad nêrî, min dît ku ji nava wî xwîn tê. Min di cî de çentê wî hilgirt û pişta wî da kevirekî nêzî me. Hîn ez bi wî ve mijûl bûm, min guleyek din xwar lê ev car li piyê çepê rast hat û birînek din li canê min vekir. Tişta baş ew bû ku herdu cara jî li goşt ket. Lê a pî, te di got qey agir girtiyê de, ez di cî de pê hesiyam. Hîna hevalê Azad gotinek negotibû guleyek din lê ket û li wir şehîd ket. Bi şehîdbûna heval Azad re min qilêşa xwe da ber serê xwe, mirin ji êsîrgirtinê bi sed carî baştir û pîroztir didît. Min rabûrdûya xwe tev dikire kûrte sînarîok. Ew bibûn wesiyetê min û tolhildana heval Azad. Tenê peyvên minê mayî bi bankirina hevalê Çekdar, ji zimanê min derdiket. Tevî ku xwe kuştin çend caran kete bîra min jî, lê min ji xwe re digot; “berî ez şehîd bikevim bila ez çend eskeran jî bikujim” hîn ez di nava ponijîna xwe de diçûm, min hew dît agir bi pûşê şûna zoman ket. Dûmanê her dever di nava tarîtiya xwe de hişt. Vê yekê hişt ku êdî guleyên eskeran zêde ber bi min ve newin. Dûmanê hinek cesaret ji bo meşê da min. Hema min çeka xwe kir mîna kopalekî û ez li ser meşiyam. Jixwe armanc û hêviya min ne xilasbûn bû. Ya rast min hêza xwe ji bo vê yekê nedidît. Êdî dijmin ez nedidîtim. Bi zorê min xwe ji wê derê dûrxist. Heya ku ez bi ser wan neketim ez nesekinîm. Eskeran jî wisa fêm kirin ku ez jî hatim kuştin. Ji ber vê yekê ew dol bêdeng bû. Tev derketin li ser wan tehtên bilind. Paş bêdengiya kêliyekî, min dengê tarameya heval Çekdar bihîst.

Wî jî eskerek li wir kuşt. Hingî di nava wê xwîna birînê xwe de û tevî wê roja zor û zehmet, ken hate ser lêvên min! Bihîstina dengê çeka heval Çekdar hêz û tiwaneyek mezin da min. Min wisa dizanibû ku, ew jî şehîd ketiye. Lê bi wî dengê re, weke ku mizgîniyek bighe min, ez kêyfxweş bûm. Lê êdî her yekî ji me bi derekî ve direve. Kî wê sax bighê hevalan, kes nizane.

Tevî ku ez jî şûna şer dûr ketibûm jî, lê mayîna cenazê heval Azad xeyal û fikrê min ji wir dûr nedixist. Ew cara yekem bû ku min xwe bêhêz didît ku qîmettirîn tişta li ba xwe ku hevalê min e, li şûna xwe bihêlim, nexasim ew heval şehît ketibe.

Min meşa xwe heyanî ber êvarê domand. Bi qasî kîlomitrekî ez dûrî şûna şer bûm. Devera ku ez gihiştimê de, tev dar bû. Ji dûr ve kesî ez di nav de nedidît im. Piştî çend katjimêrên meşê min kunek di bin kevirekî mezin de dît. Halê min yê meşê, piştî vê roja dirêj, qet nemabû. Devera ku ez lê rawestiyam dîsa li rojhilatê Mardînê bû. Ji bo ku ez hinekî bêhna xwe vedim, min pêşî çenta xwe di derekî de veşart û paşî derbasî wê kûna bin latê bûm. Hingî teng bû, ez neçar mam ku cercûlê çeka xwe, ji ser rakim. Min ew yek jî kir. Ji bo veşartina cihê xwe min çiqilên darê nêzî jêkirin û di devê kûnê de kom kirin. Bi armanca ku kes nizanibe çiqilên darê hîna nû jêbûne û cihê min newe nasîn, min xwe li şûna hatî birîn xist û paşî derbasî hundirê kûnê bûm. Tevî ku min ew der baş veşartibû jî, min pîmê bûmbên xwe û çeka xwe hazir kirin. Li ber ronahiya tava heyvê, min sola tijî xwîna min bûyî, ji piyê xwe derxist û li birînê xwe nêrî. Heya wê çaxê jî min ji ber birînan av venexwaribû. Jixwe gava min baş li çente û cilên xwe nêrî, hingî hijmara guleyên ku li min ketî baş diyar dibû. Çentê min nêzî pazdeh heya bîst kûn lê hebû. Cilên min ji jor heya jêr, ji şûna guleyan kûnî û parçe parçe bibûn. Tenê şûna ên min hijmartî nêzî çil kûnî bû. Wate çil carî mirinê silav dabû min.

Heya saet yazdê şevê jî ez di bin tehtê de bûm. Gava min dît ku kes nehat û dengê tu tiştî nîn e, ez derketim ji bo baş bi

wê deverê ewle bibim. Dema ez derketim ji dervê min dîmenê Mardînê weke ê roja yekem didît. Mixabin, ev car ez bi tenê bibûm temaşevanê wî dîmenê bedew. Heya wê demê xwîn ji birînan rawesta bû, ji bo vê yekê, min tîbûna rojekî bi ava wê deverê şikand. Tevî ku min ew roj bêxwarin derbas kir jî, lê birçîbûn qet nediket bîra min. Tenê kişandina cixarekî ji bo min pir bi wate bû. Lê tûtina min jî nebû.

Piştî ku min hinekî din temaşeyê deştê kir, dîsa ez ketim rêya şûna mayîna hevalan. Lê rêya nîv saetê min bi zorê di çend katjimêran de dibirî. Gava ez gihiştim jortir, min bi cihaz bangî hevalan kir. Heyanî hingî kesî ji hevalan nizanî bû bê çi bûye. Dema min ban kir, wan bersiv da. Ew jî ji bo me hatibûn nêzî Mardînê. Wê gavê bi tenê vegera nava hevalan ji mirinê jî xirabtir bû. Di heman demê de, pêwist bû ku, tişta qewimî jî ji wan re bê gotin. Ez di nava ponijînê de careke din ketibûm rêyekî bêdawî. Ji ber birînên xwe ez li wir mam. Piştî demekî pênc heval hatin û ez gihandim hevalan. Lê hîn jî heval Çekdar, mîna balindeyekê ji refên xwe qût negihiştibû hevalan min dixwest ku ez bibim çîrokbêjê serpêhatiyên serkeftî!

Lê ev car min bûyerek bi jan ji heval û hogirên xwe re vegot. Bûyerek ku hevalê Azad bi xwîna xwe neqişandibû. Êdî min zanî ku, ger mirov bibe qurban jî pêwîst e ferman û quralên partiyê çi be, çi bibin wê serpêhatiye ne tenê bandor li ser min kir. Ew bû dersek mezin ji bo jiyana min di nava şoreşê de min fam kir ku ger te kêmasiyek pir biçûk jî xiste destê dijmin de, dijmin te efû nake! Bi serê xwe ew ders bû hêzek mezin ji bo min. Vegera heval Çekdar jî piştî çar rojan li deştê bû keyfxweşiya herî mezin ji bo min.

Êdî min kesayeta xwe ji nû ve, mîna filmekî di berçavê xwe re derbas dikir. Lê heya niha jî, mayîna cenazê heval Azad di cihê şer de, mîna birînekî bêderman di dilê min de cî girtiye.

***Vegotin: Hogir Bagok***

# XATİR XWESTİNEK, BÊDENG

***"Êdî min jiyan mîna pelek dara payîzê zer û li ber weşandinê didît. Lê tişta ez pê diêşiyam ew bû ku; min nikarîbû peyvekî ji hevalên xwe yên salên dirêj re bibêjim."***

Heftanîn qadekê ji hêla gerîla ve xwedî rolekî dîrokî ye. Gava navê Heftanînê di nava gerîla de tê gotin, tê wateya desthilatdariyê û hêz girtinê. Di be ku ev yek, kokên xwe ji dîrokê werdigire. Ji ber ku Heftanîn di dîrokê de bûye şûneke biwate. Li gor gotinên bav û kalan, di serî de Heftanîn bi navekê din dihat nasîn. Jê re digotin; "Tenîn." Tenîna doh, Heftanîna îro, mîna pirekî Bakurê Kurdistan û Başurê Kurdistan bi hev ve girê dide. Ji ber şerê di navbera eşîrên wê demê de, heftanîn dibe du beş. Beşêk li bakur, yek jî li başur. Ên ku beşê başur dixistin destê xwe, ji ber xweşikbûna xwezaya wê û dewlemendiya di deşt û zozanên wê de, nav lê baştir e. Beşê ku li hêla bakur jî ma, navê wê her ma Tenîn. Lê di roja îroyîn de herdu alî jî bi Heftanînê tên nasîn.

Yek ji çiyayên bilind û bi nav û deng di Heftanîn de, xantûr e. Kî destdane li ser Çiyayê Xantûrê, dikare çar hawîrdor têxe di bin desthiladdariya xwe de. Ji ber vê yekê gerîla di şerê 15 salan de, ev çiya mîna kelehekî ku nakeve, bi kar anîn e û bi xwîna gelek paqrewanan hatiye xemilandin. Çar hawîrdor ê Xantirê, mîna gerdena bûkekî xemilandî ye. Ji hêla bakur ve Geliyê Pisaxa, ji hêla başur ve bajare Zaxo heye. Bi şevan bilindahiya çiyan, Zaxo û Xantir ji hev cuda dike. Li rojhilat a Xantûrê, Gundê Banikê û

Kelha Şabanîkê hatine avakirin. Kelha Şabanikê xwedî dîrokeke kevin e. Ew keleh navê xwe ji navê “Şahê Banikê” werdigire. Wate “Kela Şahê Banike” ji hêla rojava ve çiyayê Cudî jê ve xuya ye. Mirov her sibeh bi tîrejên şefeqê re, bilindahiya Cudî dibîne.

Belê, Gulana 1997 an, em di nava vê xwezayê de bûn. Ew bi salan bû ku heval û hogirên me ev erdnigarî mîna rûniştgehekî bi ewle didan bi kar anîn. Em ne yên destpêkê bûn ku li vir diman, ne jî ên dawî bûn. Bi serdeman bav û kalên me di nava wan zinar û daristanê wan çiyan de bi cî bibûn, şer kiribûn û çiyayên mîna Xantûrê bibû meydanên cengê ji bo cengawerên Kurd. Paş salên dirêj gerîla ji bo vegerandina hêviyên wendayî, li wan deran bi cî bibûn. Dijmin jî mîna ku di dîrokê de gelek caran ew çiyayên bedew kiribûn gora mêrxasên Kurd, dixwest ku me jî li wan deran tûne bike. Lê ev car çerxa felekê ne bi daxwaza wan digeriya. Ne jî şervanên kurd mîna en berê bûn. Êdî hesabê sûk û malê li hev nedihat. Dijmin bi hêviyek êrîş dikir, lê bi zorê xwe xelas dikir. Wê sala ku em li Xantûrê diman jî, gelek caran em rû bi rûyê êrîşên dijmin diman. Cara dawî ku em di nava pevçûnê de bûn, 14 ê Gulana 1997 an bû. Wê rojê dijmin bi hêzekî mezin dest bi paksaziyê fermanên amadekariyên li dijî paksaziyeke dirêj dabû. Wisa hatibû diyar kirin ku ev êrîşa dijmin û paksaziya wan, wê şeş mehan dirêj bikirana. Yekîneya me jî, xwe parastin ji her hêlî ve kire armanc. Ji bo pêşîgirtina zinarên zêde zêde tirî, hevalên me di ber pala Çiyayê Xantûrê de bi cî bûn. Me tevahî hewildanên xwe ji bo ku dijmin me nebîne, bi kar dianîn.

Kêmasiyên me ên serekî, di hêla xwarin û vexwarinê de bûn. Tenê kîsek şekirê me hebû, mixabin ew jî di sê rojên şer de bi dawî bû. Me di çend rojên destpêkê de, tevgera dijmin şopand. Ew ji katjimêr 4 ê sibehê heya 12 yê nîvro di geliyan de diman. Ji nîvro û şûn ve, hildikişan girên bilind. Me heşt roj bi xwe veşartin û şopandina tevgera dijmin derbas kir. Lê ji ber ku bi dawîbûna xwarin û vexwarina me, biryar hat

girtin ku  neh heval biçin hinek pêdiviyan ji Geliyê Pisaxa ku şûna veşartina pêdiviyên me bû, bînin. Paş amadekariyan, bi katjimêr yek û nîvê paş nîvro em ji ber pala Çiyayê Xantûrê bi rê ketin. Di navbera cîyê  me û Gundê Perex de ku di Geliyê Pisaxa de bû, nîv katjimêr hebû. Di rê de em bi hişyarî diçûn. Bi her gav avêtinekî re, me li dora xwe dinêrî. Bi baldarî  me destê xwe jî çeka xwe venediqetand. Di meşa xwe de, me gavên xwe bi îhtîmala derketina eskeran davêt. Bê ku tu tişt biqewime em gihan Geliyê Pisaxa, nêzî Gûndê Perex. Di cî de min û hevalê Şiyar, ard derxist û dest bi hevîrkirinê kir. Hevalên din jî bi karên din rabûn. Çemê ku di gelî re diherikî, hingî baş û xurt bû, kesî ji dengê xûşêniya wê, dengê kesî nedibihîst. Heya gelek caran hevalan bi dengekî bilind bang li hev dikirin. Hîna deh deqe di wê navê re derbas nebibûn, min dît ku hevalê Şiyar tevgerek dikir. Di cî de min bang lê kir:

-Heval çi bû? Tu çima wisa tevger dikî?

Dema wî bersiva min ne da, min bi hêla ku wî meyze dikir ve serê xwe zivirand. Wê çaxê min dît ku esker û pêşmerge mîna moriyan ber bi me ve tên. Ew pir nêzî me bibûn û ji bo ku em xwe bidin dest, bang dikirin. Heval Cengawer ku yek ji hevalên bi me re bû, ji bo ku em xwe bi cî bi kin herdu destên xwe hildabûn. Leşkeran wisa fêm kirin ku, ew xwe dide dest. Lê heval Cengawer ji bo me wisa dikir. Di cî de min destên xwe ji nava hevîr derxist û rahişte çeka xwe. Jixwe gule tim li ber avêtinê bû. Hîn wisa min berê çekê da koma leşker û pêşmergan. Tişta ku min dît, bi gule barandinê re, çend leşker û pêşmerge ketin. Lê bi sedema rastbûna cihê min, min xwest xwe di paş kevirê nêzî xwe de veşêrim. Hîna min xwe nezivirandibû, guleyek li çena min ket. Bi qasî çend saniyan ez bêhiş ketim.

Piştî ku min çavên xwe vekirin, min dît ku mîna ewrek taviya destpêka biharê gule di ser cihê me re dibûrin û dibarin. Wê çaxê her heşt hevalên min ketibûn nava şer de. Dema min da xwe ku ez bimeşim, hêza min bes nebû. Tenê

min dikaribû ku xwe bighênim paş wî kevirê nêzî xwe. Dema ez li paş kevir rûniştim, ez ketim nava deryaya xeyalan de. Ez ditirsiyam ku dijmin ew hevalên din şehîd xistine û canan parçe parçe kiribe. Hovitiya dijmin tu carî jibîr nediçû. Me dizanibû ku gava gerîlayek birîndar, an jî şehîd bikeve destê wan, her şêweyê karên kirêt û pîs, bi wan dike. Ez gelek caran bibûm şahîdê wan dîmenên bi jan ên hevalan. Min mîna wan dîmenan di tu filmê tirajîkî de jî nedîtibû. Hîna ez di nava xeyalên xwe de bûm, ji nişka ve, dengê çekan rawestiya! Dîsa dengê çem di gelî de bi tenê dengveda. Rawestandin dengê çekan ez careke din xistim nava fikarên bêqirax de. Min êdî dest da xwe ku hevalên xwe yê rojên xweşî û nexweşiyan, hevalên ku em bi salan li ba hev bûn, hevalên rojên kêf û ên xemgîniyê meyze bikim. Gava min serê xwe hêdîka ji paş kevir derxist, ji nû ve xûnçeyên hêviyê di dilê min de bişkivîn. Ji nû ve sûlava keyfê bi ser lêvên min re hate xwar. Min dît ku hevalên min yek bi yek bi ber min ve tên. Dema ew nêzî min bûn, ez pir dilşa bûm. Wan bi dîtina sikûr û singa min a bixwînê hatiye pêçan, zanîn ku ez birîndar bûme. Lê ji ber ku pir xwîn ji birîna min daketibû, wan nizanî bê ez ji kû derê birîndar ketime. Ew li hember min rawestiyan. Hingî tevî hewildanên min jî, min nikaribû ku peyvekî jî ji wan re bêjim, ne jî şûna birîna xwe bilêv bikim. Tenê bi destê xwe dixwest bêjim;

-Heval dest ji min berdin û xwe xilas bikin.

Lê qerîna heval Laleş, mîna erdhejekî di asta herî bilind de ez hejandim:

-Heval! Va hevalekî birîndar li vir e, em wî jî bi xwe re bibin.

Heya wê kêliyê tu tişt ji hevalan pê ve nedikete bîra min. Lê qerîn û giriyê hevall Laleş mîna defa hewarê di guhê min de dengveda. Tenê bi wê hewarê min xwe mîna zarokê bi çalepkan xwe dixişkîne, dît. Heya hingî birîna min nediket xeyalê min. Lê niha, weke ku teze gule li min bikeve, min destên xwe yên di nava xwînê de sorbûyîn, danî ser birînê

xwe. Êdî xwe mîna barekî li ser milên hevalên xwe yên di şer de didît. Bi wê qîrê, min xwe weke nêçîrekî li ber mirina ku her kêlî bi bûxçika xwe ya sipî re, li wir digeriya, hîs dikir.

Hevalê Cengawer ku yê dawî bû, ez dam kêleka xwe û em bi hev re meşiyan. Jixwe hêza meşê jî bi xwîna birînê re, ji min dûr ketibû. Tevî wê yekê jî min gavên xwe ber bi pêş ve davêtin. Ji bo ku şopa me bi xwînê newe dîtin, min destê xwe dikirin mîna kovikekî û her ku dibû xwîn, min dirijand û qûma Xantûrê bi ser de dikir. Lê xwîna ku mîna berfa vê mehê dibû av û bi latan de diherikî. Hingî diçû hêza min a meşê ji min distand. Piştî kêliyekî ji meşê, min hew dikarî ji cî bilivim. Ez li ber darekî ku ava berfa vê mehê tînê wê, mîna şikeftekî kolan bû, rawestiyam, min biryara xwe di bin darê de veşartinê da. Mixabin guleya ku li min ketibû, ziman, qîr, axîn û keser ji min sitandibûn. Mîna zarokê ku hîn zimanê wî li ser peyva "dadê" venebibû be, li min hatibû. Êdî her xwestekên min, her peyvên min, bi destên ji xwînê, mîna hineya roja zemawendê sorbûyî wer xwest ku, min li wir bihêle û biçe. Tevî ku min bi ziman jî jê re ne got, ew tê gihişt ku ez çi dixwazim bêjim. Lê wî destpêkê çûna bê min û hiştina min a li wir, nepejirand. Mixabin hêza min ya meşê nema bû. Jixwe mayîna li wir û şehîdketin tevahî xeyalê min dagirtibû. Êdî min jiyan mîna pelekî dara payîzê zer û li ber weşandinê didît. Lê tişta ez pê diêşiyam ew bû ku, min nikarî bû peyvekî ji havalên xwe yên salên dirêj re bibêjim. Min gelek caran ji xwe re digot: "Ger ez şehîd bikevim, bi kê mayî ezê tiştên di dilê xwe de berî şehîdbûnê bibêjim." Lê niha gava ku birîn  bûye bendavek li pêş pêlên peyvan, gava ku tevahî gotinên ferhenga temenê min, li ber lêvên kilîtkirî sekinîne, ez xatir ji hevalê xwe dixwazim bê ku tu tiştî bêjim. Gotinên dawî ên ku her mirovek berî mirinê dibêje jî, min nikarî bû ku ji hevalê Cengawer re bibêjim. Tenê bi çavên xwe yê tijî rondik û bi kovaniyê rûçikên xwe, min xatirê dawî dixwest û dilê min dibû keştiya peyvên min ê ku dibûne

kul û derd di deryayek bêdawî de. Ji ber ku min hêvî ji jiyanê qût kiribû, min çek û rextê xwe da heval Cengawer. Tenê bombeya ku heval Cengawer bi destên lerizî dayî min, li ba min ma. Min ji xwe re digot; "Qet nebe bila çek û rextê min nekeve destê dijmin de." Gava ez derbasî hundirê wê kuna binê darê bûm, bi awira dawî min xatir xwest. Heval Cengawer jî piştî hembêz kirina rûçik û canê min ê di nava xwînê de mayî, bi rondikên qûtbûna ji min, hinek pelên darê, ji derve de danîn ser devê kûnê. Wê çaxê bi danîna pelan destê wî direcifî. Çav tijî rondik bibûn. Min di nava rûyê wî yê kovan de, qûtbûna ebedî didît. Ji ber vê yekê heya li wir bû, me destên hev diguvaşt û bernedida. Te digot qey heval Cengawer ji ser gorekî radibe, wisa hêdî da xwe. Pelên darê jî li ber çavê min dibûn gulên ku li ser goran tê danîn. Ji wir û şûn ve, êdî ez û rêhên dara ku bûyî parezvanê min, bi tenê man.

Dengê eskeran, her ku diçû nêzîktir dibû. Wan dengan hişt ku bombeya heval Cengawer ya ku bêdilê xwe dayî min, têkve tevgere. Di cî de min pîma wê ji bo kişandinê amade kir û danî kêleka xwe. Lê ji ber ku xwîn ji birînê ranediwesta, min awêne ya xwe derxist û lê nêrî. Bi parçe şûtikekî min xwest ku guleyê ku xwîn jê dihat, bigirim. Wê çaxê min kesekê nû di awêneyê de didît. Çena min bi hêlekî din de xwar bibû. Min diranên jor ji ên jêr, nedinasîn. Dema parçe ya şûtikê di şûna birînê de bi cî bû, damar li hestiyan ket. Wê çaxê ji nû ve êşê dest pê kir. Bi tevzînkên canê min re, ez ji ser hişê xwe çûm. Bi qasî 30 deqî ez wisa bêhiş mam.

Gava ez bi xwe hisiyam, wê çaxê dengê leşkerên dijmin her ku diçû dûr dibû. Min fêm kir ku êdî bi şûn ve diçin. Wê çaxê saet bibû çarê ber êvarê. Di wê navberê de, dengê hevalê Sînan û çend hevalê din hat. Jixwe wan hêviya xwe ji mayîna min ya jiyanê birî bûn. Hevalên ku ji min cuda bibûn jî, gotibûn ku heya niha jiyan nake. Ew kî ba jî, ku rewşa min bidîta bawer nedikir ku ez jiyan bikim. Hevalê Sînan û

hevalên din jî, nehatibûn ku min bi saxî bibînin, wan xwe amade kiribûn ku, cenazê min ji wir derxin û bibin ba hevalan. Ji ber ku ez wê çaxê nû hatibûm ser hişê xwe, ez wisa têgihiştim ku min di xew de heval Sînan dîtiye. Lê gava xiş xiş ji jor hat, min di nav pelan re li jor nêrî. Wê çaxê sîmayê heval Sînan ket ber çavê min. Wê çaxê qîra min, bibû mîna nal nala zarokekî di pêçekê de. Min di cî de destê xwe ber bi jor ve paland û çîlo da aliyekî. Hevalê Sînan ku hatibû cenazê min bibe, ji dîtina min bisaxî bawer nekir. Hema bê ku raweste bi hevalên din re ez ji wir derxistim û çena min baş pêça. Wî dît ku sînga min tev bixwînê sor dike. Di wê demê de min bi destê xwe, jê re nîşana "yek" da diyar kirin. Wî fêm kir ku tenê gule yek li min ketiye. Çavên heval Sînan tijî rondikên şadiyê bibûn. Jixwe mîna ku heval Cengawer ji min qût bû bê ku peyvekî ji min bibhize, heval Sînan jî ez dîtim bê ku peyvekî bibhîze. Min bi bêdengî xatir xwestibû, niha jî bi bêdengî xêrhatin li hevalên xwe dikirim.

***Vegotin: Rêber Qamişlo***

# ME BÊŞER HÊVİYA XWE PARAST

***"Ji bo ku girîn û nexweşî ne be şensê nivşên pêşerojê jî, me çek hilgirtibû. Niha jî ew şaşitî bûba emê ketiban çi rewşê?"***

Wê çaxê tevahî beko, diketin nava tevgerê û dixwestin ku me û rojê, ji hev cuda bikin! Wê çaxê jiyan bibû bêjingek, baş û xirab, rast û derew, ronî û tarî ji hev dida cuda dikir. Êdî her tişt zelal bû. Neviyên Zerdeşt, "baş diramiyan, xweş dipeyviyan û rast pêkdianiyan!" Ên din jî mîna gurên çavsor û birçî dixwestin bi me xuriniyê xwe bişkînin. Lê gava destê wan negihişt van çiyan û bi me nikarîn, xwestin rojê ji me dûr bixin. Di wê rewşê de herkes, bêdeng bû. Rojava şerim nedikir! Ji bîra wê çûbû ku şaristaniya xwe ji ku girtiye. Saziyên mafê mirovan, li biryarên xwe poşman bibûn. Ew jî mîna afranderên xwe, bibûn bazirganê canê zarokên şaristaniya rojhilat! Lê wan nikarî vî karê bigemar bighînin dawî. Bi sedan zarokên rojê, xwe dişewitandin û dibûn xelekek ji agir li dora roja rojhilat. Piştî roja reş (15 Sibat) herkes li ser piyan bû. Her yekî li cihê xwe tol ji rûreşan distand.

Wê çaxê, wate sal 1999-meha Nîsanê, em li Zapê bûn. Wê demê biryara çalakiyên tolhildanê hate wergirtin. Ew çalakî ên yekem bû ku wê di biharê de bihata kirin. Heya hingî jî ez beştarî nava şer nebibûm. Jixwe paş 15 Sibatê hêrs û kîna me gihiştibû astekî herî bilind. Her yekî di dehma xwe de, xwe ji bo tiştekî ku pê bikaribe dilsoziya xwe bi Serokatiyê re bide nîşan, amade dikir. Jixwe ji bo min

beştarbûna nava şer di vê demê de xwedî wateyek pir cuda bû. Ji hêlekî ve heya hingî ez tevlî tu çalakiyekî nebibûm ji hêla din ve her tiştê ku dihat pêkanîn, ji bo tolhildanê bû. Ji her hêlî ve tevlîbûna min a vê demê, watedar bû.

Amadekariyên yekîne ya me, ji bo êrîşkirina li ser erebeyekî çetan bû. Şûna ku êrîş wê lê bihata kirin, di navbera Zap û Metîna de bû. Jê re tê gotin "Amediye, Gundê Fileha." Ew dever dikete sê koşeya Zap, Metîna û Garê de. Herkes ji bo wê rojê bêsebir bû. Pêşî hevalan ez tevlî guruba êrîşê nekirim. Wan hîna ez nû didîtim. Lê ji ber israrkirin û gerimbûna mîn a ji wî şerî re, hevalan tevlîbûna min a wê çalakiyê pejirand. Zor û zorahiyên rê û çalakiyê tev li hêlekî bû, tevlîbûna min a yekem çalakî di jiyana xwe de, li hêlek din bû. Baweriya ku hevalên yekîneyê didan min, moralê min hîn behtir bilind dikir. Êdî her tişt ji bo min bibû ew roj. Bendewariya roja çalakiyê roj li ber min dirêj dikir.

Berî roja çalakiyê, komcivîna me ji hêla hevalê Dijwar ve hat lidarxistin. Şêweya çalakiyê bi êrîşa du hevalan û parastina sê hevalan re hat zelal kirin. Her pênc hevalan ji bo ku çalakî serkeftî bi dawî bibe, çekên xwe ceribandin. Êdî em amade bûn. Ji ber ku şûna çalakiyê ji me dûr bû, pêwist bû ku em berî wê bi çend saetan bi rê bikevin.

Piştî amadekariya, em saet çarê ber êvarê ji noqta Şehît Qehreman ku li jêrî girê Hekkarî bû, derketin. Mîna evîndarê ku bi ji wan be û biçe jiwangeha xwe, her gavekî min davêt, min xwe nêzî hêviya xwe hîs dikir. Bi şevê re em gihiştin nêzî Gundê Filehan ku girêdayî Amediyê bû, li nêzî rêya ku ji Amediyê tê wî gundî, me keşifa xwe kir. Heya wir jî her tişt serkeftî derbas dibû. Derdorê me tev girên bilind bû. Tenê dolek hebû ku ji bo di rewşek nebaş de mirov paş de vegere.

Li gor nûçeya ku gihiştibû destê me, erebe wê saet 11 bihata. Berî wê bi saetekî her yekî ji me cihê xwe girt. Di jarjulê çekê me gişan de, guleya ku li destpêkê bû, ji ên din tevan şanstir bû. Ji ber ku a pêşî ew dibû pênûsa ku dest bi

xêzkirina vê şevê bike bû. Bi cî girtinê re, rext û çekê me, di ber milê me de bi cî bûn. Her yekî ji me, bi hişyarî tiliya xwe ber bi tetîkê ve bir. Êdî berê çekan tev li rê bû. Katjimêra bêsebiriya me, mîna gûrekî bi dûv katjimêra jiyanê ketibû û jê dixwest ku zû bimeşe. Gava wexta diyarkirî hat em tev amade bûn, lê erebe nehat. Em qederek din li wir man. Mixabin bêfeyde bû. Wê şevê erebe derbas nebû. Tevî wê yekê jî min hêviya xwe qut nedikir.

Dema ku erebe nehat, me rê girt û biqasî sê saetan bi girekî ve hilkişiyan. Pêwîst bû ku kes me li wir nebîne, ji bo vê yekê me ew şev li girekê bilind, ku jorî rê bû derbas kir. Me her pênc hevala ku em didu keç bûn û sê xort bûn, me ew şev li wî girî derbas kir.

Lê ji bo ku kes me nebîne, em sibehê heyanî saet çarê pişt nîvro li wir man. Di hêlekî de me bêhna xwe vedikir, di hêla din de, me li ser çalakiyê dan û sitandin dikir. Heyanî piştî nîvro em li wir man. Gava dema pisû avêtinê hat, me xwe berda nêzî rê, cihê ku roja berê em çûbûnê de, wê çaxê mîna zarokê ku li benda roja cejnê be li min hatibû. Her kêliyekî dibû sal li ber min. Tevî ku di şer de şehîtbûn jî heye, lê keyfxweşiya çalakiya yekem, tevahî tirs û guman ji min dûrxistibûn.

Dema me cihê xwe girt, me dît ku du gundiyên jin li jêrî me ne. Bêhnek di wire derbas bû didu yên din jî gihiştin wan. Wê gavê em tirsiyan ku çalakî eşkere bibe. Ji bo ku gundî me nebînin, me xwe veşart. Em li benda wan man ku biçin, lê belê, wan sifre li wir danîn û dest bi nan xwarinê kirin. Gava me dît ku wê dereng bimînin û ji bo komkirina kerengan hatine vir, du hevalên me çûn ba wan. Ji ber ku baran bariya bû, em ditirsiyan ji bo ku bizanin em ka li kû ne, şûna piyên me dîtibin û hatibin. Lê piştî demekî ji mayîna herdu hevalan, û vegera wan gundiyan hin tiştên nû gotibûn! Armanca me ew bû ku em êrîşî ereba çeteyekî ku roleke mezin di şerê li hemberî partiyê de dileyst, bikin. Lê tişta ku gundiyan gotibû, ez di cî de behîtî hiştim. Ger wê çaxê kêrek

li min biketa, belkî dilopek xwîn ji canê min nehatiba. Wê gotina gundiyan ji hêlekî ken anî li ser rûçikên min, ji hêla din ve destê min ê ku çek hildigirt weke pela dara li ber bayê bihêje, wisa lerizand. Wan gundiyan ji hevalan pirsî bûn:

-Ma hûn ci dikin?

Hevalan:

-Karê me heye! Lê em dixwazin bipirsin: ereba mirovekî dewlemend di vê rêyê re derbas dibe, ma kengî tê?

-Ereba ku hûn qal dikin sibehê derbas bûye, lê a ku wê gavek din derbas bibe, ew jî mîna wê ye. Lê ne a wî zilamî ye!

Heval:

-A kî ye?

-Ew ereba ku niha derbas bibe, a zarokên bêdê û bav in! Jinek dewlemend wan xwedî dike û her roj wan dibe mala xwe û vedigerîne şûna xwedî kirinê!

Ew ereba ku ev du roj bûn em li bende disekînin, ne ya ê çete bû. Dema min ev yek bihîst di cî de min ji hevalên xwe re got:

-Hevalno baş bû me doh bi şev li erebê nexist! Ji ber ku ereba wan zarokan jî, li gor ku gundiyan gotibû, bi şev derbas bûye. Wê gavê min xwe mîna herî mirovê bişens di vê dinyayê de hîs kir. Ger me wê şevê êrîş bikira û ew zarok tûne biban, heya henaseya dawî a jiyana xwe, minê êşa wijdan bikişanda. Mane em bi xwe ji bo ku zarokên vî welatî bi aramî û azadî bijîn derketin serê çiya. Ji bo ku girî û nexweşî ne be şensê nivşên pêşerojê jî, me çek hilgirtibû. Niha jî ku ew şaşitî bûba, emê ketiban çi rewşê? Ew çalakiya yekem bû di biharê de! Ew çalakî bi tunebûna wan zarokan bi dawî biba, min tu car xwe efû nedikir. Lê piştî me zanî ew ereba zarokên yetîma ye û me erîş nekir ser, min ji hevalên xwe re car din got:

-Yekem çalakiya di jiyana min de, bi serkeftinek herî mezin derbas bû!

Erê! Ew çalakiya ku gule tê de neteqiya, serkeftina herî mezin bû di temenê min de. Wê çaxê tevahî gotinên Serokatî ên di derbarê zarokan de, di hizirê min de yek bi yek derbas dibûn. Di vî welatî de tişta herî binirx şehîd û paşî jî zarok in ji bo Serokatî. Niha jî hindik mabû ku em wan firişte yên bêtawan bi destê xwe bikûjin.

Hin ez di nav kêyfxweşî û hizirinê de bûm, erebe hat. Lê ev car hevalan ne bi çekan bi ken û şadî pêşwaziya wan kir. Gava em ji rê dûr diketin, her min li paş xwe dinêrî. Ew rê, ew dever bibû kaniya coşiya min ji wê rojê û şûn ve. Ne tenê ez, her çar hevalên min ji min keyfxweştir bibûn. Tevî ku min ew zarok nedîtin jî, lê ew heya niha di dilê min de cih digirin. Her çend ew çalakî heyf hilandin bû jî û me nekir, lê mayîna wan zarokan li ser rûyê vê dinyayê bi serê xwe tolhildana herî mezin bû dijîm.

***Vegotin: Sêal Dêrikî***

# SOZ Û PEYMAN
# Dİ RÊYA WAN DE

***"Lê her çiqas leystikekî bi vî rengî li ser me dileyîstin, ewqas hêrs û kîna me jî li hember wan zêde dibû û me dixwest di demekî kurd de wana ji vê herêmê dûr bixin."***

Ji heyaman bihar, ji mehan Gulan bû. Meha dawî a biharê. Giya û kulîlkên çiya deşt û zozanên welat her roja ku derbas dibû ber bi çilmisînekî ve diçûn, kanî û rûbarên welat jî ber bi zuhabûnê ve….Dawiya bihara sala 2000 an, ji rojan rojeke germ û xweş bû. Serê sibehê dinya sayî, asîman ji asoyekî heyanî asoya din tev de şîn bû. Rojê ji rojhilat ve tîrêjên xwe li ser xuyangên welat direşand, li ser kanî û rûbaran beriqandineke bêhempa dida çavên me. Ji dûr ve dengê qebe qeba kewan, ji nêz ve jî dengê çûk û bilbilan tevlî dengê şireşira ku ji herikandina avê derdiket, dihat gohên me, hestên me ji xewa hênkayiya serê sibehê hişyar dikir, xweşî û şadî dixist nava dilên me.

Em bistûpênc yekîneyên fîdaî li herêma Kelatuka, di bin siya kendal û hendefan de bi cih bibûn. Meha Avrêlê bi dawî bibû. Di dawiya her mehekî de civînên bi navê civîna mehane dihat li dar xistin. Îro jî, ji bona hevalên ku di yekîneyê de cihê xwe digirin kom bibûn û nirxandina reng û rewşa jiyana meha Avrêlê ku derbas bibû, dikirin. Rexnedayîn û rexnekirina vê mehê tev di wî rojê de tên kirin û jiyan tê sererast kirin, kêmasî û qelsiyên tên jiyankirin bihêz dikin û rê û rêzanekî ji nû ve didin jiyanê.

Demekî dirêj bû ku em di civînê de bûn. Dema me navber da civînê, di navberê de hin hevalên rêvebiriyê kom bibûn û di nav xwe de nîqaş dikirin. Ji libat û tevgerên wan dixuya ku rewşekî neyînî dihat jiyan kirin. Bi livên dest û rûyê xwe li der erdnîgariya Kelatuka gotûbêj dikirin. Navber deh deqe berdewam kir. Civîn ji nû ve dest pê kir. Piştî ku tevahî heval ketin cihê civînê, bala min kişand ku hevalê Selman tevlî civînê nebibû û derketibû cihekî bilind, bi laserkê diaxifî. Piştî ku hevalên dîvanê derbasî cihê xwe bûn, hevalê ku platform berhêlî  dikir bi dengekî bilind axifî û got:

-Hevalno! Pêşmergeyên YNKê bi hêjmarekî zêdê derûdora Keletuka dorpêç kirin e. Bila her hevalek di bin venêra yekîneya xwe de kom bibûn. Armanca YNKê gelekî berfireh û leystîka ku dileyst jî gelekî qirêj bû. Dixwest, ji Zelê heyanî Kanî Cengê têxe bin venêra we. Lê belê, di van araziyan de cihê stratejîk tev de di bin venêra me de bû. Di destpêkê de me leystîka YNKê baş fêm nekiribû ku dixwaze çi bike. Dema wan derdora herêma ku em lê diman dorpêç kirin, me jî tedbîrên xwe yê şer girtibû. Nêzikî du mehan bi vî awayî hat derbas kirin. Piştî demekî kin me armanca wan fêm kiribû. Dixwestin ku bi awayekî me bixapînin û ji vê herêmê derînin. Leystîka wan ê qirêj derketibû ser rûyê avê. Lê, ma nizanibûn ku vê xakê bi fêlbazî, xapandin û hileyan nikarin ji me bigirin! Ev xaka ku bi xwîna dehan hevala hatiye avdan û ji êş û jana kişandibûn qelîştek tê de çêbibûn. Kanî û rûbarên wê tev ji stêrk û rondikên çavên dayîkên dilşewat bû û ji bo vê yekê me weke dayîkan hembêz dikir. Ev der warê şehîdan û çavkaniya jiyana me bû. Ma hêj fêm nekiribûn ku derketina me yê ji van xakan wê ne bihêsanî be û heta dilopa xwîna me ya dawî me yê li ber xwe bidana.

Têgihiştina leystoka wanê qirêj û sivik zêde ne zehmet bû. Dixwestin hêzên me yê li van herêman tev de li Dola Kokê kom bikin û di zivistanê de êrîş li ser me bikin û me tûne bikin. Lê bi serketina van leystokan ewqas ne hêsan bû.

Ji ber vê yekê jî çi rê û rêbazên qirêj hebûn, hemû li hember me bi kar dianîn. Hevalên me yên ku li nava gel, xebatên rêxistinî dikirin tev de ji aliyê wan ve dihatin girtin, binçavkirin û di cizaret û şikenceyan de dihatin derbas kirin. Dîsa li çiya êrîş anîn ser me û rêyên me yê lojîstîkê asê dikirin û nedihiştin ku em pêwîstiyên xwe pêşwazî bikin. Dîsa, tîmên kontra ku her şevî êrîşên tacizî li ser me dikirin, dixwestin baweriya me bişkînin û me ji vê herêmê derxînin. Lê her çiqas leystikekî bi vî rengî li ser me dileyîstin, ewqas hêrs û kîna me jî li hember wan zêde dibû û me dixwest di demekî kurd de wana ji vê herêmê dûr bixin.

***

Kela rojekî ji rojên havîna germ bû. Êdî çiya û kulîlk tev de hişk û zûha bibû. Gelek kanî û rûbar çikiya bûn. Guleyek, çirûskekî agirê an jî perçeyek şûşe pir bi hêsanî dibû sedema şewitandina wî çiyayê hişk, darên çilo û maziyan. Jixwe piştî her pevçûnê agir bi van araziyan digirt û ji ber derfetên tefandinê tunebû, ev agir bi rojan berdewam dikir. Yekîneya ku ez lê dimam û yê ku heval Selman lê dima, ji hev cuda bûn. Lê ji hev jî zêde ne dûr bûn. Rojek ji van rojê havînê yê germ, hevalê Selman hat ba min û got:

-Ji bona çûyîna peywirekî, ez û tu hatin erkedar kirin. Min ji bo te jî destûr girtiye.

-Hevalên me yên stî, çar pêşmergeyan dîl girtine. Pêwîste em biçin wana bînin vê derê.

-Baş e. Li benda min be heya ku ez çeka xwe bigrim û bêm.

-Zû were ha. Ez li vê derê li benda te me.

Min bi lez û bez çû çeka xwe da milê xwe û vegeriyam. Dema ez hatim hevalê Selman li ber siya zînarekî mezin rûniştibû û pal dabû. Ez çûm cem wî û em ber bi cihê hevalên stî ve meşiyan. Li ser şîverêkekî teng, ku carna keviyekî wî bi kendal û hendef re, min li pey wî dimeşiya. Hevalê Selman di sala 1992 yan de tevlî refên ARGKê bibû.

Ji Zagrosan bigirin heyanî Amanosan û Botanê li gelek cihê welat gêrîlatî kiribû. Gelek rojên bi zor û zehmetî derbas kiribû. Gelek hevalên kêleka wî şehîdketibûn. Bibû şahîdî gelek qehremantî û gelek leheng û egîdan nas kiribû. Gelek caran tîn birçî, gelek caran jî xizan û hêjarî dîtibû. Her wiha gelek caran xayîntî û nemerdî jî li wan hatibû kirin. Lê tu carî ji şop û fikra xwe derneketibû. Lewra jî westandin, bes dîtin an jî bêbawer bûn tu caran layîqê xwe û hevalên xwe jî nedîdit. Piştî demekî kin ku em meşiyan hevalê Selman bi dengekî nizim banî min kir;

-Hevalê Şevger ji te re tiştekî bibêjim.

-Bêje!

-Rêxistina me dixwaze li dijî tîmên kontra, tîmekî taybet ava bike.

-Birastî? Gelek baş e.

Li min meyze kir û axaftina xwe berdewam kir.

-Û hevalan min ji bona serbaziya vê tîmê guncaw dîtine. Min destpêkê tu tişt negot. Lê piştî du roj derbas bûn min biryara xwe da û min got ez dikarim bikim.

-Heval Selman çi pêwîst bû, piştî du rojan te biryar da. Ez bûma hema minê di cih de biryar dabana û minê bigota ez dikarim bikim.

Rûken li min meyze kir û got:

-Min te jî pêşniyar kir û hevalan jî pejirand. Pişt re jî biryar hat dayîn ku tu bibî aligirê min. Nizanim tu vî yekê dipejirinî an na?

-Pêwîste du raj şûnde biryar bidim. Ma, heval Selman mizginiyek ji vî xweştir tu dikarî ji min re bibêjî? Ma ez çawa napejirînim?

Hevalê Selman dest bi kenekî kir. Ez jî pê re keniyam. Ez gelekî kêyfxweş bibûm. Bi taybetî jî, bi hevalê Selman re di nav rêxistinekî wisa de cih girtin tiştekî gelek cuda bû. Me zû de soza xwe dabû. Me gotibû, ger tîmekî bi vî awayî were avakirin, di herî rêza serî de yê divî tîmî de cihê xwe bigirin, ez û wî bûna. Ji xeynî me şeş hevalên din jî pêşniyar kiribû.

Ew jî hatibûn pejirandin. Ew heval jî hevalên bi moral û di şerê xwe de xurt bûn. Piştî em çûn gel hevalên stî û me peywira xwe bi cih anî, roja din bang li me heşt hevalan kirin û civîna tîma taybet hat çêkirin. Wate û girîngiya vê tîmê ji me re hat gotin. Yek jî wan hevalên di tîmê de cih digirt jê jî hevalê Şoreş bû. Hevalê Şoreş bi aslê xwe, ji Zaxo bû. Lê hêj dema ew zarok bû, malbata wan diçe Rojhilata Kurdistanê û zarokatî û xortaniya wî li wê derê derbas dibe. Piştî komploya 15ê Sibatê biryara xwe yê tevlîbûna refên gêrîla dabû. Hevalekî germ, bi coş û peroş bû. Ji hêla leşkerî ve jî gelek jêhatî bû. Kesekî ku demekî dirêj bi hevalê Şoreş re mabe, misogere pirsa:

-Heval Şoreş! Me tu caran nedît ku tu bêmoral bibî an jî nexweş bikevî.

Ji hevalê Şoreş dipirsî. Her tim ji bersiva hevalê Şoreş ji vê pirsê re amade bû. Digot:

-MÎrovekî şoreşger tu caran bêmoral nabe. Ji ber ku heta jê tê îdeolojîk û karker e. Ji ber vê jî, bêdisîplîn û bêmoralî li derveyî prensîbên şoreşgertiyê ye.

Ev gotina hevalê Şoreş ne tenê di axaftin de dima. Heta dawî li gotina xwe xwedî derdiket û xwediyê xîret û cesaretekî mezin bû jî. Dîsa gelek girêdayê nirxan bû. Li ser girêdayîna nirxan û mirov wiha digot;

-Girêdayîna te çiqas ji şehîdan û ji Serokatî hebe jî, hewce nake tu vê yekê bigotin bînî ziman. Ya girîng ew e ku kesên te nas dikin ew vê yekê bînin ziman.

Germbûn, cesaret, girêdayîn û moralê van hevalan gelek bi rûmet bû. Nêzikê sê mehin ku me her heşt hevalan bi hev re derbas kiribûn. Gelek caran tîn û birçî, gelek caran jî bêxew man. Lê hertim bi bîr û bawerî bûn. Me bi hevûdu re kişfên xwe yên li ser dijmin çêkir û me bernama xwe û krokiya armanca xwe deranî. Kîjan yekîne wê êrîşê kîjan cihî bike tevde me diyar kiribûn.

Me heyameke din jî li dû xwe hiştibû. Heyameke din çûbû ava û heyemake nû dest pê kiribû. Heyama payîzê,

xuyanga xem û keseran hikim li ser xwezayê dikir. Daran pelên xwe ji xwe şexitandibûn û li her alî reşandibûn. Serê Çiyayên bilind bi mij û moran bibûn. Cihên bilind xwe bi berfê xemilandibûn. Me xwe berdabû nêzî deştê. Baran ji deştê kêm nedibû. Nûçeyên ku me ji herêmên din dibihîst carna dilê me xweş dikir û şadî dida me, carna jî jan û keser dixist dilê me.

Dîsa di wan rojan de nûçeyek li ser herêma Karox û Botî hatibû. Pêşmergeyan êrîşê ser hevalên me kiribû û hevalê Merwan şehîd xistibûn. Çar hevalên me jî ji gelek cihên bedena xwe birîndar bûbûn. Ji ber ku yekîneyekî bi tevger bûn, nikaribûn hevalên birîndar li gel xwe bihiştina. Ji bona wan hevalên birîndar, ji gel me çar heval bipeywir kirin ku herin wana bigihijînin cihekî bi ewle. Beriya ku hevalên peywirdar derkevin ser rê, hevalê Selman ban min kir û got;

-Hevalê Şevger, bila heval hemû li cihekî kom bibin. Ez dixwazim hinek agahiyan bidim we.

Min tevahî hevala li bin siya darekî kom kir. Piştî hevalê Selman hat û li ser rewşa wan her çar hevalê birîndar agahiyan da me, di dawî de wiha got;

-Em hemû jî di amadekariyên şer de ne. Em hemû jî dixwazin bi germahî û moral tevlî şer bibin. Lê rewşa van hevalan gelek xirabe. Pêwîste ev heval werin rizgar kirin û ji herêma şer werin dûrxistin. Heke em wan hevalan bi saxitî rizgar bikin, ew kesên ku herî bişeref û birûmet wê em bin.

Piştî van axaftinan dema li hevalan mêze kir, dît ku heval hemû pê tesîr bûne. Ji ber vê yekê jî gelek kêfxweş bûbû. Her hevalek êdî ji xwe bawer bû ku wê bikaribe hevalan ji wî rewşa xirab rizgar bike û bikaribe peywirdarê vê peywirê. Hevalê Selman vê rewşê fêmkiribû û ji nava hevalan bangî hevalê Şêrciwan û Şoreş kir.

-Bila ev heval bi min re bên, hevalên mayî jî, ku şer dest pê kir bila bi hevalên din re tevlî şer bibin.

Wan hersê hevalan amadekariyên xwe yê ser rê kirin. Hin tiştên xwe yên zêde jî li gel hevalên mayî danîn, heyanî

vegerin. Tenê hinek derman û ji bona xwe jî têra du rojan xwarin li cem xwe birin. Hevalê Selman jî ji ber ku çentê min biçûk bû, hat ba min û çentê min ji min xwest û got;

-Bila çentê min li gel te be heyanî ez vegerim. Lê belê albûm û lênûsa min di çentê min de ye. Ev du salin ku min nedaye destê tu kesî. Hêvîdarim ku tu yê wan baş biparêzî.

-Heger te baweriya xwe bi min aniye tu dikarî hêvîdarbî ku heyanî tu vegerî ezê wan weke çavên xwe biparêzim.

-Lê heger em hev û din nebînin wê çawa bibe?

-Eger me hev û dû nedît, wê demê ezê bi hin hevalan re ji te re bişînim.

Hevalê Selman bi rûken li min nihêrî û got:

-Heger tiştek bi min hat, wê demê mirovên me li Mexmurê hene. Soz bide min ku tu yê teslîmê wan bikî.

Ez ji nişka ve di cihê xwe de ceniqîm. Tu caran tiştekî bi vî awayî nehatibû bîra  min û ne jî min dixwest were bîra min. Min bersiveke hestiyarî da Selman, lê min nikaribû li rûyê wî mêze bikira.

-Na hevalê Selman, na! Ez axaftinên wisa navêm…

-Divê ku tu li bena wî bî jî. Di şer de her tişt dibe.

û berdewam kir;

-Tu yê soza pêkanîna tiştên ku min got bidî?

-Ji ber ku şer e û dibe ku her tişt bibe ez soz didim.

Rêheval Selman bi van gotinên min gelek kêfxweş bûbû. Lê heyanî min bersiva wî da, gelek zehmetî kişand. Di demên wisa de mirov gelek bihestiyarî nêzîkê hev û din dibe. Mirov wî hêzî di xwe de nabîne ku serê xwe rake û li rûyê hevalê xwe mêze bike. Piştî ku min soz dabû wî, hişk destê min girt û me xatir ji hev xwest. Berê xwe da min û wiha got;

-Baweriya min wê her tim ji te hebe. Hûn jî baş li xwe binêrin…

Piştî ew çûn bi çend rojan şer dest pê kiribû. Di pêngava yekemîn de, narincoka hevalê Berxwedan di destê wî teqiya bû û şehîd ketibû. Yên ku karibin li ser bingehekî rast wate

bidin şehadeta hevalên xwe, ew kes her tim ji wan hevalan wê hêz bigire. Her çiqas perçeyekî dilê me jî bi xwe re dibirin, hêza serkeftinê ew bi xwe bûn…

Erdnîgarî bi tevahî di wênera me de bû. Piştî çend rojan min bi laserkê bi wan re axifî. Di demekî kin de wê bigîhiştana me. Roja ku hatin ez li Qendîlê li gira herî bilind bûm û min muhabere dikir. Du hevalan nûçeya hatina hevalê Selman û wan hevalên din ji min re anî bûn. Wê şevê emê bi hev û din re biçûyana çalakiyê. Dema ez gihiştim cem wan li ser çokan rûniştibûn û plansaziya çalakiyê dikirin. Ez bi dizî çûm pişt hevalê Selman û min destê xwe danî ser çavên wî, lê di cih de wî ez nas kirim. Bi dîtina hev em gelek kêfxweş bûbûn. Li min mêze kir û got;

-Baş bû ku tu hatî. Ji bona ku em bi hevûdû re biçin çalakiyê min agahî daye hevala.

Piştî me rewş û hewalê hev û din pirs kir, ji bona amadekariya çalakiyê ez ji gel wan çûm cem hevalê Şoreş. Emê bîstûçar heval bi hev û din re biçûyana çalakiyê. Hevalê Şoreş cihê xwe di nava her şeş hevalên ku di koma êrîşê de bûn, cihê xwe digirt. Serdarê koma êrîşê hevalê Birûsk û Rêdar bûn. Hevalê Serdar jî, di nava koma taqwiyê de cih digirt û ew jî ji şeş kesan pêk dihatin. Ev herdu kom wê bi hev re biçûna cihê çalakiyê. Min jî cihê xwe di nava duwanzdeh hevalên mayî ku di koma parastinê de bûn digirt. Me yê saet heştûnîvê êvarê biketana rê. Kêf û morala hevalan di cih de bûn. Piştî em ketine rê û demeke kin meşiyan hevalê Selman ji rêza xwe derket, hat gel min û wiha got;

-Divê tu wê sengera ku li hember te ye bi lez bêtesîr bikî.

Ji ber ku çeka min BKC bû, pêwîst bû ku min wê sengerê bêtesîr bikira.

Em nêzîkê sirtê çiyê bûn. Dinya tarî bibû. Heval bi hişyarî dimeşiyan. Diviya ku em ji hev qut nebûna. Koma êrîş û teqwiyê jî wê berwar biçûya ser hedefa xwe û em jî sirt sirt biçûyana. Tu asteng li pêşiya me derneket û bi vî awayî

me cihê xwe di sengeran de girt. Me dixwest ku bi hevalên din re bi laserkê biaxifin. Lê belê bersiva laserkê nedihat dayîn. Em hemû di nava şayîşekî mezin de bûn, ka çima heval bersiva laserkê nedidan? Gelo laserka wan xirabibû? Gelo nobedarê dijmin wan dîl girtine an jî…Na, ger wan bidîtina wê dengê teqîna çekan bihata û wê şer dest pê bikira. Çi qewimî bû kes nizanibû.

Nêzîkê çarîkek bi vî awayî derbas bû. Ji nişkêve ji cihê ku ew lê diman dengê teqîna çekan hat. Rêheval Birûsk nobedar kuştibû û bêtesîr kiribû. Nobedarê duyemîn jî li heval Rêdar xistibû û heval Rêdar şehît ketibû. Li wê derê tevlîheviyek derketibû. Çar heval jî birîndar bibûn. Rêheval Selman ji bo ku wana xilas bike diçe, lê pêşmerge narîncokên destê xwe davêjin ser wan û nahêlin. Narîncokekî bêbext di navbera hevalê Selman û Şoreş de diteqe û herdu heval jî tevlî karwanê şehîdan dibin. Di wê qeyrana pevçûnê de her hevalekî ban li hevalên din kiriye ku bizanibin kî sax maye kî birîndar û kî tevlî stêrkên asîmanan bûne. Çar heval tenê xwe xilas dikin û hevalên birîndar bi xwe re tînin. Destpêkê pêşmerge sengera xwe berdidin û diçin. Lê piştre dîsa vedigerin û nahêlin ku hevalên şehît ketine ji aliyê hevalên din ve werin veşartin. Em hemû di bin gulebaranê de mabûn. Tu axaftin di laserkan de çênedibû.

Em di parastina hevalan de bûn. Hevalan ji me re gotibûn, paş ve vegerin. Lê tu kes ji me nizanibû ku heval şehît ketine an jî birîndar henin-tunenin. Em hemû di nav bêhedaniyekî bêpênase de bûn. Nema axaftin ji me çêdibû. Êdî me îdare nekir û çûn cihê ku me biryar da bû û li benda hevalan sekinîn. Hevalekî xort hevalekê bayan bi birîndarî bi xwe re anî bû. Hevalê Zinar ji me re got ku çar heval şehîdin û çar jî birîndar in. Divê ku em bi lez biçin wan ji wê derê bînin. Min jî ji bona parastina xwe peywirdar kirin. Lê hîna jî di derheqê hevalê Selman û Şoreş de tu agahî negihiştibû me. Ez çûm cem hevalê Zinar û rewşa wan hevalan pirsî. Hevalê Zinar sekinî û li min nihêrt. Di çavên

wî de xemgîniyek xuya dikir. Nedixwest bersiva min bide û çavên xwe ji min direvand. Kêliyekî meşiya û ji min dûr ket. Di nava min de dudiliyekî hebû. Di aliyekî de min dixwest ku bersiv bigirim, di aliyekî de jî tirsekî di nava min de hebû ku nedihişt ez bi rastî jî bersiv bigirim. Hestên gelek cuda di nava min de hebû û ger bi germahiyekî dikelijiya, carna jî wekî cemed girtibe sar û matmayî dima. Dîsa jî li hember hemû tevlîheviyên  hestên xwe ji nişkê ve li pey heval Zinar ketim, milê wî girt û jê pirsîm;

-Hevalê Selman li ku derê ye? Te bersiva min neda!

Di wê keliyê de ji çavên wî yê sor û şilî de rondik bariyan û bi kelagirî;

-Heval Selman, Birûsk, Şoreş û Rêdar tevde tevlî karwanê şehîdan bûn, bûn stêrk û çûn asîmanan. Cenazeyê wan jî tu derfet tunebû ku em veşêrin. Dijmin hedan neda me ku em wan li wir nehêlin.

Di wê kêliyê de hemû rojên min jiyan kirî li ber çavên min derbas bûn, ew hevaltiya ku min bi wan hevalan re jiyan kiribû hemû di nava min de şopekî ji agir dihişt û derbas dibû. Dîmenên curbecur yên wan hevalan; kêliyên me yê bi kêf, hêrs, kîn û bi heyecan di carekî de di awêneya jiyana min de xuya bûn. Tu gotin û peyv nikaribûn wê kêliyê pênase bikirana. Min bawernedikir ku ew niha jiyan nakin. Ji min re ew wekî nemiran bûn. Guhên min dengê guleyan nedibihîst.

Lewra rastî carna gelek tal be jî, rastiye. Ew şehît ketibûn. Êdî hebûna wan di dilê me de wê bijiya. Germahiya wan wê her tim di rih û giyana me de bihata hîs kirin. Min tu car wan hevalan ji bîr nekir û ne mimkune ku mirov ji bîr bikim jî. Ew giyana rihê me, hêza jiyana me nin. Tu car axaftinên Heval Selman ku di hemû jiyana min de ji min re bûye wekî fermanekî, ji bîr û ramana min derneket. Wekî doh ew dengê wî yê ku soz ji min girtibû di gohên min de ye. Lê wî nizanibû ku wêneyên wî dabûn min, min di dilê xwe de neqişandiye. Gelek hevalan wan wêneyên hevalê Selman

ji min dixwestin, lê belê fermana wî her tim di bîra min de bû û min wan wêneyan diparast ku derfetekî malbata hevalê Selman bibînim û wê fermanê bi cih bînim digeriyam. Her tim vê fermanê pêkanîn, ji bo min dibû giraniyekî mezin. Daxwaziya min ya yekem pêk anîna wê fermanê bû. Bi sebrekî mezin û bi hêviyekî xurt li benda derfet û şensekî bûm.

Carekî, di 27ê Mijdarê de, di salvegera damezrandina partiyê de, em hemû di nav tevgereke bi heyecan û coş de bûn. Amadekariyên pîrozkirina vê rojê di her cihê de pêk dihat. Ji bo vê roja birûmet moral hatibû amadekirin. Ji Mexmûrê gelek mêvanên me hatibûn. Mirovekî ku temenê xwe mezin hate gel min, silav da û rûnişt. Di wê kêliyê de min germahiyekî li hember vê mirovê hîs kir. Lê belê, ji min re wisa hat ku ev germahî, wekî germahiyekî heskirina gerîla ji gelê xwe û mirovan dihat. Bi rastî jî gel ji bo gerîla xwedî wateyek cuda bû. Hemû zor û zehmetî, êş û janên ku dikişandin çavkaniya xwe ji gel digirt. Ew ji bo me çavkaniya jiyanê ne. Erê, ev mirovê ku hatibû gel min, nedihat bîra min ku xizmê hevalê Selman be.

Dema ku wî ji min re got;

-Min ji gelek hevalan wêneyê Şehîd Selman xwest, lê belê hemû hevalan ji min re got ku tu tim li gel wî mayî.

Destê min girt û rondik ji çavan bariyan;

-Wêneyekî wî hebe, ji te lava dikim tu bidî min.

Min fêmkir ku ev misogere ku xizmê hevalê Selman e. Nema tu gotin ji lêv û devên min derdiket. Ketibûm bin bandora bîranînên xwe yê bi heval Selman re. Dîsa dilê min tije xem û keser bibûn. Hesreta wan hevalan dîsa dil min kizirand. Ji çavên min rondik bêgumana min barî. Erê, kêliya fermana hevalê Selman bi cih bînim hatibû. Di aliyêkî de heyecana pêkanîna wî peywira girîng, di aliyekî de jî hesret û heskirina wan hevalan re guvaştina dilê min, min kelegirî kiribû.

Min bi peyvên kelegerî ku ji qirika min qut qutî derdiketin, bersiva wî da;

-Erê, rast e. Wêneyên hevalê Selman bi min re hene û hin tiştên din jî hene ku ez bidim malbata wî.

Min albûm û lênûsa hevalê Selman derxist;

-Beriya hevalê Selman şehîd bikeve van dabû min ku ez bigihijînim malbata wî. Ev ji bo min gelek girîng bû. Soza min û baweriya hevalê Selman ku ezê vê sozê bîmin cih, ji bo min fermaneke gelek girîng bû. Niha vê fermanê bi cih anîn ji bo min kêliyekî dîrokî ye.

Piştre min emanetên hevalê Selman dirêj kir.

Soza min ya duyemîn, fermana min ya jiyanê yê duyemîn ma bû. Ew jî her tim bi rih û şopa wan hevalan re jiyan kirin….

***Vegotin: Şevger Sîpan***

# HÊVİYA Dİ XAKA MİRÎ DE

***“Derûdor bi giştî deşt bû, heya ku şiyana dîtina çavên te hebin, wê tu erdê rast û bêgiya bibîne. Ji dûr ve şepolên germê weke avê xuya dikir, rewrewk dibin hêmana welatekî biyanî yê ji rastiya me dûr û nenas e.”***

Ev bû demeke kurt e ku di xew ve çû ye, lewra bi dudilî ji xewê xwe dikşand. Lê bêhîle bû; ji sedema germê û kelmêşan çavên wî xew nedidîtin. Lê dîsa jî pêwîste ji hûnikiya sibehê sûd wergire. Dema herî xweş ya li vê wargehê, dema sibehê ye, jiyan bi awayekî teze û rep dest pê dike, lê dûv çend katjimêran, her tişt tê guhertin, êdî roja havînê a germ û zer, desthilatiya xwe ya estem li ser cihanê rêdixe. Her tişt zer dibe, xaka zer û şewitî, ezmanê zer û kevirên zer, bayê germ yê weke ku ji dozxê hiltê bi xwe re jî ax û gemarê li ser rûyê mirovan dixe û xwe berdide hinav û melakan.

Wek her carî, ku karekî girîng hebe, ew zû ji xew radibin, bêyî ku xwe dereng bixin, her tiştî xwe amade dikin û berê xwe didin cihê kar û bûyeran. Xebata wan wê îro gelek zor be; îro roja hilbijartina ne, her kes dilibitî, lê belê ên herî zêde ku bê rawestandin digerin, ekîba wan ya MEDYA bû.

Piştî 25 salan ji karê li ser pişta keştan, di sepeta deryayên cihanê de keştevanî kirin, hemû welatên cihanê dîtin, lê weke lawê deryayan hatibû, bi şepolên har re şîr veqetandibû. Lê di dawiyê de bîryar da ku xalekê li ser

çîrokên keştîvaniyê dayne û li ser cihana bilind bibe şervan û rojnemevan. Piştî birîndarî û xebata çend salan di hembêza çiyayên bilind de, xatirê xwe ji wan lat û çeman xwest. Niha jî bûye rêheval û yek ji endamên HPtv yê pîr.

Jiyana bajarê Stenbolê gelek rihet û bê xem bû, lê jiyana wê, piştî ku di encama qezayekê de bû nîv însan, êdî di valatiyekê de diçû û dihat. Gelek biçûk bû, lê tovên lêgerîna arzuyên azadiyê û watedariya jiyaneke rast, di raman û giyanê wê de hatibû çandin. Êdî jiyana rihet û delal, hêviyên wê têrnadikirin, lewra oxiriya xwe ji bajarê mezin xwest û berbi jiyaneke biwate ve gavên destpêkê avîtin. Dema nû hat vê xebatê, şerm dikir ku bi vî karî rabe, lê niha...

Ew ji vê derê û vî karî re ne amadebû, hêviyên wî cudabûn, tola destana jiyanê her tim di hindirê wî de weke agirê volqanê dikeliya. Qîrîniya wan dihat, arîkarî dixwastin, teqemeniya wan nemabû, lê rê dûr e û tiştek bi destê wî nedihat; tenê bêjeya “Tol” di mejiyê wî de lêdida. Lê her tişt di nîvî de ma, wî jî ji wan xakan koç kir û xwe li vê derê dît. Niha jî, keştîvan, keça biçûk û lêgerê Tolê bûne endamê yek saziyê, armanca wan yek bû û hêviya wan jî pir mezin bû.

Ji dûh de amadekariyên bi rêkûpêk dikirin, wê niha jî di qada kiryarî de xebata xwe pêk bînin. Pêwîste îro bernameyekê li ser hilbijartinan çêbikin. Derfetên wan gelek bisînor û kêm bûn; lê di vir de tu çendî karê xwe hez bikî, wê serkeftinên birûmet û mezin bi dest bixînê.

Mirovên me dema ku tên hember amêra wênegirtinê (kamera) dikevin rewşeke cuda, êdî ji xiroşyê nikarin bipeyîvin, devê wan li ber hev dikeve, û xweydan di bin lingên wan ve davêje, lê dîsa jî ekîba MDE ya wê bernama xwe çêbikine. Ew tax bi tax, kolan bi kolan digeriyan.

Roj gelek germ bû, cîhan disincirî, destê min ji xweydanê nikaribûn kamera bigirta, serê me ji germa ve gêj dibû, lê tu mafê me yê gilî û gazinc kirinê tunebû; ji xwe ma emê gazincên kê, ji kê re bikine?

Her der qerbalix bû, lê dema ku xebatkar û karmendên berpirsiyarên hilbijartinan, em didîtin, weke her carê, yekser qîrdikirin:

-Bi lez, rê ji bo hevalên çapemeniyê vekin.

Di van rewşan de, rola amêra wêneyan gelek girîng e, tew tu derî li pêşaya wê girtî namînin, her kes xwe nêzikî te dikin.

Hilbijartin hîn berdewam dikirin, her kesî ji xwe dipirsî "gelo wê kîjan berendama, biserbikeve?", lê ev yeka ji bo me tu girîngiya xwe tunebû. Piştî bêhdana nîvro hevalê Hawar (yê keştîvan) ji me qetiya, bo ku hinek agahiyên razî yên girîng bi dest xwe bixe. Lê berî ku biçe wiha got:

-Hûn li vê derê bimînin, da ku ez vegerim, hûn dikarin bêhna xwe vebikin.

Hevalê Hawar, dizanibû ku em gelek westiyane, lewra xwest bi tenê wî karî pêk bîne.

-Başe heval Hawar! Em li hêviya te ne.

Me dixwast ku ji bin rehma vê roja germ birevin, êdî şiyana me li ber vê germahiyê nemabû, ji ber ku bêmariyên me yên giran hebûn, lewra pêwîst bû em xwe biparêzin, lê belê çawa û li kû derê?

Hevala Amîle (lêgera watedariyê) ji min re got:

-Ka em biçin seyrangeha zarokan.

Bi matmayî min got:

-Seyrangeh!! Çendî ev bû nêzikî 10 meha ne ku em bi hev re li wargehê xebata Medya yê dikin, lê dîsa jî ez bi qasî hevala Amîle, hemû cihên wargehê nasnakim.

-Ew seyrangeha zarokan li kû derê ye?

-Ma tu nas nakî?!... Ne gelek dûr e, emê li wê derê li benda heval Hewar bisekinin.

Bi ber ve wî cihî de bi rêketin. Lê, çi seyrangeh, çi meyrangeh! Û çihal? Cihê lîstikên zarokan, bacan û îsot çandine! Ji xwe zarok bi çi awayî nikarin nêzî seyrangeha (yanî baxçe) xwe bibin, qîr û qîja baxçevan li benda wan e. Dema ku xebatkarê seyrangehê, çenteyên reş yê baldar li ser

pişta me dît, yekser em naskirin û bi rûyekî şad, bixêrhatina me kir. Bi rastî jî ev seyrangehê li gorî cihên dîtir, weke biheştê bû. Bayê hunik li ser me de hilat, bihna me fereh kir, vê rewşê dîsan jiyana çiyê anî bîra me, ku em bêdaxwaza û vîna xwe jê dûr ketine. Çendî ku em ji bo vegera çiyan pêşniyaran dikin jî, lê belê heta niha, ji ber gelek sedeman, tu pêşniyaz nehatine pejrandin. Tenê ji me re bîranînên wê jiyana rengala ma ne. Em ji xwe re car- car bi hesret qala jiyana û hevalên xwe ên di çiyê de dikin.

-Êdî van dîmenên zer û ziwa çavên min bêzar dikin. Min bîra dîmenên rengîn kirê ye."

-Welah! Tu çi jî bikî, te ew dîmena ne, careke din nedîtin!

Di nav bexçe de, hewzekî avê hebû. Ev bû demeke dirêje ku me aveke mezin nedîtî ye, lewra em bi dilşadî nêzî hewzê avê bûn. Hewiz 2 mitran bilind bû, bi pêldemûkan mirov diçe ser qeraxên wê.

Derdor bi giştî deşt bû, heya ku şiyana dîtina çavên te hebin, wê tu erdê rast û bêgiya bibînê. Ji dûr ve şepolên germê weke avê xuya dikir, rewrewk dibin hêmana welatekî biyanî yê ji rastiya me dûr û nenas e. Êdî ji vir û pê ve xaknîgara bilind bidawîbûna zincîra qereçoxê diqede, ev yeka jî, li ser derûniya mirovan bandorên biyanî û aşqurt diafirand. Di vê cîhana sincirî de û di nava van dîmenên ziwa û req de, ancax mirov rê li pêş herkandina bêbend ya kaniyên bîranînan vekê. Çendî ku rûpelên xembar û melul tê de hebin jî, lê dîsa ji vê dozexa yê baştir e.

Bi destên xwe, av dipeland, çilpe-çilpa ava pêldar, çem û rûbarên çiyan anîn bîra min.

-Çend xweş e ku mirov niha li kenarên Avaşîn be!

Bê yî ku hevala Amîle li min binêre, bersîva min da:

-Ava Lolanê ji hemû avan xweştir e, bi taybet jî van deman.

-Ya?

Dema ku qala Lolanê kir, bi hesret, ew gotina ji dev derket, diyar bû ku hevala Amîle gelek ji wan cihan hezdike û bîrê dike.

-Li vê derê agir bi erdê dikeve, niha li ser girên bilind jî berf heye.

-Ez ji berfê hez nakim!

Matmayî mam, min dixwest sedema nehezkirina hevala Amîle ji berfê re bizanibim. Lê, bi dûdiliyekê ketim... Lewra min gotinên xwe bêxwestek daqoltandin, û xwe bi lîstina bi avê mijul kir. Piştî çend kêlan ji bêdengiyê, hevala Amîle serê xwe kêmekî rakir û li asoyên zer mêze kir. Min dît ku du rundik ji çavên wê diherikin xwarê. Min ferq kir ku pêwîste mijara me bê gûhartin:

-Te bernama xwe ya li ser zarokan hîn neqedandî ye? Te çawa kir?”

Lê weke ku tew dengê min neçûyê, ne bersîv da, ne jî çavên xwe ji lênêrîna asoyan qerand, vê yekê jî, hîşt ku dîsa ez xwe berdim hundirê arîşê xwe. Hevala Amîle di deryayên xeyalên xwe de keştîvanî dikir, laşê wê li ser kenarê hewzê bû, lê ew bi hest û hizrên xwe li cihekî dûr- dûr bû. Rondikên germ ji çavên wê dihatin xwarê, vê rewşa xembar ez jî, xemgîn û bêzar kirim.

-Heval Amîle! Ka em biçin avahiya şehrevaniyê. Ka em mêze bikin ku çima heval Hawar heya niha nevegeriya gel me?

Hevala Amîle li demjimêra xwe mêze kir û got:

-Lezneke, hîn wext nehatê ye!

-Kêfa min ji vê derê re nehat, şêniyê gundan tîne bîra min.

-Bibûrîne Heval Can! Gotina berfê bi xwe re hevalê Nesîmî anî bîra min. Ji bo wê ez kêmekî mijul bûm....

-Tu behsa ew hevalê ku carekê di kovarê de te li ser nivîsandi bû dikî ye ?

Bi kesereke bijan re got:

-Rast e, rast!

-Ma çi peywendiya berfê bi bîranîna heval Nesîmî re heye?

Hevala Amîle, bê ku destê xwe ji avê derbixîne, û bêyî ku çavên xwe ji aso yê bêheyam biqerîne, dest bi vegotina bûyerê kir:

-Min ji hevalê Nesîmî gelek hezdikir, ez di nav refên gerîla de nû bûm, ew jî mamosteyê min bû. Nesîmî hevalekî zana û rewşenbîr bû, her tim bi min re diket dan û standinê, alîkariyên mezin bi min re dikir. Zivistana sala 2000an yekîneyên me nêzikî hev bûn. Her ku derfet bi destê min diket, ez diçûm serlêdana hevalê Nesîmî û wî jî di vê yekê de qusur nedikir.

*Hevala Amîle, bi kenekî melul, behsî hevalê Nesîmî dikir:*

Min jê re digot;

-Heval Nesîmî! Rojekê wê emê herdû jî bibin dû serleşkerên mezin, di hembêza Çiyayên Munzur ê de emê wargehên xwe çêbikin. Jixwe tu ji bo karên serbazî nabî, lê belê ez serbazeke mezin û zîrekim; wê yekîneya min şer û çalakiyan bike û yekîniya te jî karên bîrdozî û rewşenbîrtî bikê ye!”

Her tim di navbera gotinên xwe de, henaseke bikeser berdida, ev jî dibû hêman ku ev bîranina gelek bi êş û keder e. Ez bêdeng mabûm, weke şagirtekî ku li hokarê xwe guhdar dike li min hatibû.

-Wê salê berf gelek bariya bû, sir û seqem desthilatdariya xwe li ser cîhana çiyayên bilind ferişandibû. Di wan rewşan, rojek bibaran û ba yê sar de, carekê ez çûm serlêdana heval Nesîmî. Ji serma re ez dilerziyam, serê min şil bû, dema ku hevalê Nesîmî ev rewşa min ya şepreze dît, bi min keniya.

-Çima tu dikenî? Tu qerfê xwe bi min dikî? A?

Hevalê Nesîmî wiha bersîv da:

“Ma çi ji te re? Ez bi kenê xwe azadim! Ha”

Piştî ku me xebata xwe qedand, di wê sermayê de em vegeriyan yekîneyên xwe. Piştî ku em sed mitrî ji yekîneyên wan dûr ketin, ji pişt ve dengek hat :

" Heval Amîle! Ka raweste...Amîle..."

Dema min li paş xwe mêze kir, hevalê Nesîmî li pêy me dihat û gazî me dikir.

-Çi bû heval Nesîmî? û ez hêdî-hêdî ber vê de çûm.

" Vî kûmî bide serê xwe, ji bo tu nexweş nekevî, û bo ku Nesîmî bi te nekenê! Roja înê ezê bêm gel we."

-Spas... Ez li hêviya teme... Ji bîr neke, temam.

Hevala Amîle desmala xwe derxist û rondikên xwe paqij kirin û gotinên xwe berdewam kirin.

Bêhedar û li benda roja înê bûm, wan rojan berf bêbêhdan dibariya, hemû rê hatibûn girtin, cih- cih aşutên berfê diketin. Lê min dizanibû ku heval Nesîmî wê werê serdana me. Rojgar giran dibûriya û heval Nesîmî diyar nedikir. Ez ji nehatina wî gelek bêzar û bixem bûm, roja înê ber bi dawê ve dixûşiya, tarî kete cîhanê û heval Nesîmî nehat. Lewra min bîryar da ku ez sibê biçim serdana yekîneya rewşenbîran. Lê min nezanibû ku feleka bêbext çi ji min re di buxçûka xwe de veşartê ye.

Berfa pilîd li qurbanekê digeriya, hemû şêwaz û rêkên curbecur dixiste rolê, bo ku candêran di hembêza xwe ya sar de bêhenase bike, her sal ew bê destur dikeve welatê me, jiyanê diqerisîne, cihana lewaz û aşqurt dixe bin desthilata xwe ya estem û bêrehm. Geh bi narincokên spî, geh jî bi şewtandina laşê candêran û geh jî bi renî û xezebên aşutên ejderhayî êrîşên xwe bêrawestandin dibir ser mirovên ku xwe spartine hembêza çiyayên xwe. Lê ev berfa dûrî jiyanê azîne û estem dike. Lê gelo! Vê carê kî hatiye hilbijartin, bo ku bibe qurbana xwezaya pîr? Kî ye?

Lê sibehê, serleşkera min destur neda min, ez ji vê helwestê gelek tengezar bûm, min sedema vê yekê jî fêm nekir. Di rêvebiriyê de, hevalan bi zimanê Almanî bi hev re li ser tiştekî diaxifiyan, weke ku li ser tiştekî bi min re

têkildar e dipeyîvan, ji min re wiha dihat. Min hîsdikir ku tiştekî ji min vedişêrin, lê çi ye , ne diyar e. Min hemû hîs û hişyariyên xwe da ser gotin û bizavên lêv û rûyê wan. Belkî tiştekî ji wan fêm bikim. Di nava gotinên wan yên bi Almanî de, gotineke Kurdî ji devê hevalekê şemitî, yekser weke biruskê li mejî û canê min xist, devê min berhev ket, min dixwast qîr bikim, bigrîm, lê zimanê min hatibû girêdan, laşê min dilerizya, carekê bi hemû hemdê xwe min qîr kir...! Heval matmayî man û pirsiyan:

-Çi bû?...Hevala Amîle... Çima tu qîr dikê? Aram be heval...Xêr e te?

Min nedizanibû çi bêjim! Ji ber ku tiştekî berçav û zelal ji bo gumanên min tunebûn, her wiha jî giriyê di qirika min de rê li pêşiya axaftinê digirt.

Hevalan ez birim odaxê, li wê derê hevalek bi dilpakiya xwe hate gel min , ji bo li ber dilê min de, min bêdeng bike, û kerba min kêm bike.

Wê havalê nizanibû ku, tenê gumanên min hene, ji bilî wê gotinê tiştekî zelal ez li ser tu bûyerê nizanim.

-Hevala Amîle! Em hemû li ser vê rê ne, yanî tu kes ji vê zagona herdem rizgar nabê... Bîraninên wan wê her tim bi şanazî di bîr û ramanên me de bijîn.

Min nizanibû ku çima va hevala li ser van tiştan bi min re vedibêje. Lê firmêsk ji çavên min dibariyan. Şiyana axaftinê bi min re nemabû, bêjeyên min ketibûn bîreke kûr û dûr...

-Ne tu tenê ji hevalê Nesîmî hez dikî. Em hemû ji rêhevalên xwe yê şoreşê hezdikin. Xweza rehmê li tu kesî nake. Hevalê Nesîmî jî dûh bû qurbana aşutên berfê.

Di mejiyê min de wekî ku birusk lêdidan, min nikaribû vê agahiyê rabikim. Yekser ji ser hişên xwe çûm.

Wexta hevala Amîle, gîşte vê xalê, ku bi awayekî xembar, ev bûyera vedigot., min êdî şiyan nekir ku firmêskên çavên xwe bisekinim. Dilê min bû pizoteke ji agir, di laşê min de weke pêlên ceyranê lêdidan. Asoyên ziwa jî bi

me re ketin xemgîniyê. Cihana sincirî ketibû bêdengîyeke goristanî, bayê germ, dengekî weke awazên biloreke xemgîn bi ser giyanê me de dihat. Êdî derûniya min ev atmosfera xembar nikaribû jiyan bike. Min hevalê Nesîmî pir li nêzî xwe dît, çendî ku min tenê wêneya wî dîtibû, lê dîsa jî min gelek jê hezkir. Lê ax û hezar ax ku giyanê Nesîmî bi azadî li ser lotkên Çiyayê me hêlan dike.

Min dixwast ku êdî hevala Amîle li ser vê bûyerê ne axifê; lê weke ku ew jî ji zûde ve li kesekî weke min digeriya, ji bo dilê xwe bi axaftinê rehet bike, lewra wê vegotina xwe berdewam kir:

-Min nikaribû bawerbikira ku berfa bêbext û pilîd, giyanê hevalê min jê girtêye. Na! Na ez bawer nakim ... Hevalê Nesîmî soz da min ku wê werê seredana min, komê wî li gel mine, ku ji bo kom mabê jî wê werê ye vir; ew tu car soza xwe li erdê nade, misogerim ku wê werê! Wî evqas sal di zindanan de li ber xwe da, bîryara xwe neşkênand, ez wî baş nas dikim, bi asanî nabe qurbana berfê..Na!

Çend rojan li ser hev ez digiriyam, bi tu kesî re nediaxifiyam, ji tevahî jiyanê qut bibûm. Çima!? Çima ev feleka bêbext, her tim kesên ku em ji wan hez dikin jiyana wan kurt dike? Çima?

Ew li vir e, rast e li vir e! Li ser girekî bilind, gora heval Nesîmî çêkiribûn, ew bi aramî di hembêza dayîka xwe de xew dikir, li dora gora wî berf heliyabû, gîha nû şîn bibû. Ah...Hevalê min êdî dema koçbertiyê bidawî bû, geryana wî li vê derê xala kutahiyê danî bû, êdî canê ciwan ji lîstikgehên zarokatiyê xwe, ji pirtûk û pênûsên xwe, ji kenê xwe yê rind qutbûye. Li sere wî girî hewa pir sar bû, lê laşê min weke agir bibû, “ax heval Nesîmî! Çima tu çû yî?... Gelek zû bû, te gelek lezgîn ji dêwana çîrokên me yê vê jiyanê derketî, te hemû helbestên me di nîvî de hîştî, lê tu bûyî gula û serenûsa destan û helbestên rêhevalên xwe. Tu gelek êş û a-zar di kûrahiya dilê me de afirand... Çima hevalê me, çima?”

Min heya niha nizanibû ku dilê hevala min ê biçûk evqas kûl, azar û xemgînî radike. Ev keça ciwan di kûrahiya giyanê xwe de bîrîndar e, bi êş e û jan e.

*-Tu dizanî hevala Amîle? Ku tu caran jiyan ranaweste, her tim diherike, bi yeksanî hemû kesî di dawêde dixe nava lîstikên xwe yên curbecur. Niha em jî, di rêza xwe de sekinîne. Jiyan ev e. Lê tiştê herî binirx û şanaz ew e ku mirov di vî jiyana kurt de, bi vîn û pîvanên bilind bijî, mirov bûrûpoş (maske) bijî, tu car ji nerastiyan re nebêje erê û her tim ew kesên ku cihekî wan ê mezin di jiyana me de heyî, bibîrbînin, arezû û awatên wan bicih bînin. Bawerim ku niha hevalê Nesîmî di gora xwe de aram û dilniya ye!!*

Berî ku hevalê Hewar werê, me çavên xwe ji şilahiya firmêskan pak kirin, lê firmêskên dilê me weke lehiyan dikeliya. Piştî ku heval Hewar hat, em dîsa vegeriyan xebata xwe ya ji bo bernameya telvizyonê li ser hilbijartinan. Ew roja bi awayekî lezgîn dibûriya, bername jî, ber bi dawî ve diçû.

-Hûn amadene?

-Belê, kamera amade ye.

-Hevala Amîle! Tu amade yî?"

-Belê, amade me.

-Niha dest pê bikin.

Tiliya xwe da ser dugma vekirinê, dîmenê komên dengdanvana *(ku ji bo têkevin kamera yê her bizav û libat dikirin; yekî ji wan pisîkekî biçûk xistibû destê xwe, bo ku bala me bikşîne ser xwe!*) bi şêwazê Total girtin, hêdî hêdî berê kamera bir ser hevala Amîle;

-Tameşevanên hêja, niha li wargeha me, ji bo hilbijartina serok û endamên danişgeha saziya şarevaniyê, hilbijartinê demokratîk di nava gel de bi kêfxweşî û dilşadiyêke mezin de bi rêve diçe. Niha jî emê...."

Êvarê karê me bi dawî bû, em vegeriyan saziya çapemeniyê, hêz di me de nemabû, gelek mandî bibûn. Di

avahiya saziyê de, hevalê Mahîr Mîmarci li benda min sekinî bû,

-Heval CAN! Mizginiyeke min ji bo te heye, wê gelek li ber dilê te şa be.”

Min yekser ramana xwe xist tevgerê ji bo ku ez vê mizgînê têderxim, lê hewldanên min bêakam bûn.

-Ka mizgînî ji min re bibêje... Bi lez, de ka bêje.

-Pêşniyara te hat pejirandin, xwe amade bike, ji bo çûyîna çiya yan..

- H ê ê! Bijî, bijî, vaya demhat ku ez vegerm bihuşta xwe ya pîroz...

Heval Amîle, heval Hewar û hemû hevalên dîtir, ji qutbûna me ji hev gelek xemgîn bûn lê banga çiyan bi hilmên bayê bakûr, ji min re nameyên şîn tîne. Êdî bi xatirê te ey cîhana zer û sincirî, bixatirê xaka zer û bayê germ, bi xatirê zarokên pêxwas û çavkujul, bi xatirê xewnên dîtina çiyayan.

Merheba xaka pîroz, merheba, gelo çi li benda min e? Nediyar e!

Kî dizanê ku li bilindahiya Çiyayê Zaxrosê, Girê Mîros, komê dijminan di çemberê de, li benda me ne, bi niyaza rêbiriya me bikin û hêviyên me bi fişekên xwe ên neyar vala derxin; lê me waz li hêviyên xwe nehanîn û dîsa jî me dest bi risandina çîrokek nû kir û.....

***Polat Can***

# SERÛWENA KU NÎVÎ DE MA

***“Katjimêr bibû yazdeh. Stêrk li asîmanan diçirûsiyan. Hê hêyv derneketibû. Bêhedaniya koma gerîla zêdetir dibû.”***

Baranên bê navber yên meha adarê a sala 94, şîniya asîman heta şîniya avaşîn tevahî şîniyan dîl girtibû bi dilopên xwe…

Avaşîn diherike, ji ber şapebaranê bor û har bûye, di rengê heriyê de, bi awayekî şêt û dîn diherike. Di stêra qirê-bûyî de bi parastineke rikoker a şîniya xwe, dibe şînroniya çîroka Çiyayê qaf û diherike. Hem li nav hem jî, li devreyî heyam û dîrokê, bi derbûyîneke hêmin û sekan gava ku digihîje basya, bi parvekirina şîniya xwe ve diherike. Li navîna deştê ev herdu çem, xeteke şîn a yekbûyî ye. Par dibe, rast dibe, şînahiya xwe ji mirov, lawir, giya û kulîlkên deştê ve vedibêje, nîşan dide û lêdixe, diçe şûnewarên din.

Diçe wan axên ku qet naşibe cihê lê dizê.

Di nav yekîneya tevgermend a herêma Zagrosê ku li şikêr di wargehiya zivistanê de bû, kar û barekî bi ponijîn hebû.

Yekîneya ku pergalkirina biharê wê biçûya herêma Oramar, niqta şikêrî ya ku ber keviya avaşîn bû, bi xemgîniyê re têkilhev bi şabûnê li pey xwe dihêlişt. Di nava heftiyekî de amadekarî bi hendazetî û lezgîniyeke mezin pêk hatin. Beriya ku bigihêjin Oramar, li niqta Kaniya Ga ev der çar-pênc katjimêr ji niqta şikêr dûr bû. Derbasê amadekariya cuda bûn. Di ketina nav herêma Oramar da ku çalakiyekî li

dar bixin, ketin nav hewldana amadekariya. Wê rêya navbera Gever û Qerekola Oramar qut bikirana û li dijmin bixistana. Bi vî awayî herêma ku ji boyî eyaletê girîngiyek xwe yê stratejîk hebû, ji bo vekirinê wê gava yekemîn bihata evêtin. Ji ber vê yekê pêwîst bû ku amadekarî baş bihatana çêkirin.

Yekîneya gerîla ji du taqimên xort –her taqimek sê mange û taqimek bayan- ev ji du mange teşkîl bû û hêjmara xwe şêstûçar gerîla bû. Gava ku yekîne li Kaniya Ga bû, talîmata koordîna eyaletê hat, da ku ji hivdeh sitiyan, şeş heb vegerin û yên mayî jî bi bîçimê mangeyekî xwe bi rêkûpêk bikin. Ji ber vê talîmata ji nişka ve, yekîne xwe pergal kir û ber bi Oramar ve kete rê. Di navbera Gundên Kah û Şukê Birê de bihurîn, li Avaşîn xistin û bi şûtikan Latê Koh berdan Gundê Zêrî –ku çar aliyên vî gundî tev gir in- tîrêjên dawî yên tava êvarê xwe berdabû ser girên gund. Hindik mabû tarî bikeve. Ev gundê bêdeng û vala, ji ber cerdevaniyê nepejirandibûn koçber bibûn, darên hilû û gûzan ji ber bêxwedîtiyê qels mabûn. Lê hêjî bedewiya xwe diparastin. Yekîneya gerîla li ber keviya bexçeyan mange mange cih girt û ji bo bêhnvedanê navber dan. Xwearina xwe xwarin. Gundê Zêrî li wê herêmê gundê herî şêrîn û xweşik bû. Nêzîkê 40 malên gund hebûn. Di gund de yekemîn tişta berçavên mirov diket, dêr bûn. Ev dêr hundirê wan şikeft, derveyê wan jî bi kevirên mezin, lê bi awayekî rêkûpêk hatibûn avakirin. Ji demek nêzîk şûnde jî bi rengekî mizgeft hatibû bi kar anîn. Dîsa temamê xaniyên Gundê Zêrî mîna vê şûnewarî perestîje ku bi rengê mizgeftê dihate bikartanîn, bi kevirên mezin û çargoşe hatibûn lêkirin. Sê-çar odê wan hebûn û tevahî ban ji axê bûn. Ji xaniya çend hebek hilweşiyabûn, lê yên mayî mîna ku li hember heyam li ber xwe bidin, di cihê xwe de çik sekinandî bûn. Hêna jî zexim xwuya dikirin. Yekîne, li cihê navberdayînê zêde nesekinî. Pêwîstî hebû ku beriya bibe sehar xwe bigihînin latê, Dola Xirabê ku ev der li sêkûça girên sertara Cîlo bû. Dihate wê wateya ku 9-10 katjimêr bimeşiyana. Bi çek û barên xwe yê

giran, xwe li Geliyê Xirabê xistin. Da ku derkevin girê herî bilind. Piştî ku bi zehmetî derketin girê bilind vê neqlê xwe berdane Gêliyê Viran. Ji vê derê re digotin; Dola Xopê. Gava ku li Geliyê Viran xwe gihandin ser kaniyekî, katjimêr sisê yê seharê bû. Bêhna xwe dan, lê qet nesekinîn. Matere û bîdonên avê dagirtin, ji Geliyê Viran ber bi Cîlo ve ji çend geliyên biçûk bihûrîn û di dawiya dawî de xwe berdan geliyekî kûr.

Serleşkerê taqima yekemîn hevalê Şahan, komekî ji heşt kesan amade girtibû ba xwe, li dirêjahiya girekî ku ev der di navbera Gundê Zêrî û Qereqola Oramar de bû, bi cih bibûn û dest bi karê keşfê û parastinê kiribûn. Yên li ciyê yekîneyê mabûn jî mange mange cîbicî bibûn. Du heb nobedar dergetin girê yaserî Geliyê Viran. Pişt re hevalên din ji bo vehesandinê derbasê rewşa razanê bûn, ji ber ku rêwîngiyeke dirêj û zehmet wana gelek westandibû. Tenê yek heval ranezabû, ew jî serleşkerê yekineyê Qivircix Hesen bû. Ji ber pora wî gustîlok û reş bû, vî navê lê kiribûn. Bejna wî ne zêde dirêj, ne jî kin bû. Di tevger û livandinê wî de çistiyek ber çav diket û ev yek hizir bi mirov re çêdikir ku gelek li ser xwe ye. Di nav axaftinên wî de tim û tim henekên hûrbijêr peyda bûn û gava ku ev henekên hûrbijêr bi dengekî zîz û cidî pêk dihatin di derbirîna wî de xet nedihatin xwendin. Ya jî têgihîştin bi herkesî nasîp nedibû. Ji bo henekên hûrbijêr zîhnekî xwedî hêz pêwîst bû û ewî vê yekê di nav her zirûf û mercê zor de pêkdianî. Carna jî van henekan bi rengekî yarî jî bi kar dianî. Mirov di nihêrtina wî de pê derdixist ku li ba zîhnekî xwedî hêz, dilekî qirase û bi hedan pê re heye. Mirov digot qey ev herdu mifteyê jiyana bi raz û nepenî ye û jê re dibe hêz… Belkî jî… Erê!...

Tenê ew raneza bû, westa bû û pir bêxew bû. Ji bo şepitandina xewa ku kortika çavên wî giran dikir, agirek biçûk pêxistibû û ava çay Êli ser bi cih kiribû. Di dema ferecê de li şûnewarekî nû bûyîn bes bû ku dilnerehetiyê pê bide çêkirin. Ava çayê keliya. Gava ku nobedar li keviya riza

baxçe xuya kir, ewî ji dema nav kulma xwe diavêt nav çaydanê. Beriya ku rabe ser lingên xwe li benda hatina nobedar ma. Lezgîniyek li ser rewşa nobedar habû, lez bi lez û qut qutî diaxifiya:

-Hinek kes ji milê qereqolê ber bi gelî ve tên!..Leşkerên dijminin an hevalin, min pê dernexist!..

Qivircix Hesen li xwe da û rabû ser piyê xwe:

-Nobedarê dî lî ciyê xwe ye an na?

-Gava ez bi vir ve hatim ew nû diçû ciyê nobetê!

-Nexwe, niha ciyê nobetê vala ye…Derhal here ciyê nobetê! Ji milê qereqolê vir ve heval nayêtin! Ev çî sersorê ye? Şervanên nû jî, xeletiyên wisa nakin!..

Nobedar bi bazdan vegeriya ciyê xwe yê berê. Lê hê negihiştibû ciyê nobetê bû qarewana wî:

-Hevalê Hesen leşker ketin nav me!...

Leşker nêzikê 20 metreyî hatibûn ba nobedarê dî, lê ji ber şaşwaziyê gule lê neteqandibûn. Serleşkerê yekîneyê Qivircix Hesen di nav mangeyan de diçû û dihat.

-Rabin!. Rabin!

Bi destê xwe geliyê milê Cîlo nîşan dida.

-Bi jor ve derkevin, lez bikin! Zû, zû!...

Yekîne, beriya ku pê dihese ka çi lê qewimiye, hema kê çek û çentê xwe girt, ber bi ciyê nîşan dayî re beziya. Qivircix Hesen xwe li dawiyê hişt, li balê serleşkerekî mangeyekî hebû. Qivircix Hesen li dora xwe nihêrî herkes çûbû, pişt re ji nedîve ji serleşkerê mangê pirsî:

-Ka hevalên sitî? We wana şiyar kir an na?

-Heval, wana kesî şiyar nekiriye!

-Wey xwedê qehra xwe li we bike! Ev nehate bîra kesî!..

Çavên wî sor bibûn, kulma xwe ji ber hêrsa xwe dihejand. Berê xwe da serleşkerê mangê û jê re got:

-Çend havalê bi dil bila werin, em hevala ji nav dijmin derxînin.

Qasek şûn de, heft heb gerîla derketin û hatin. Di nava wan de “ez jî, ez jî!...” Sehnekirin û lexistin û çûn.

Dema ku ji bo parastinê koma gerîla xwe berda gelî, sitî di cihê xwe de hê razayî bûn. Dema Qivircix Hesen hem li ser wan, hem jî li ser leşkeran bû, bêyî ku pê bihesin dîtin ku di nava dorçepera dijmin de ne, êdî wisa li wan hat ku neguncaw bû ji nav dijmin derbikevin. Bi cihaza dest pêwendî bi hevalên dî re çêkir û rewşê ji wan re vegot. Wê gave jî hevalên li jor pêwendiya cihazê bi muhabera eyaletê re çêkirin û di derbarê operasyonê de agahî dan eyaletê. Bêyî ku dereng bikeve bersiva eyaletê bi rengekî talîmat hat:

-Çi dibe bila bibe, lê divê hûn Qivircix Hesen ji nav dijmin derxînin.

Êdî dên û bala hevalan li ser koma ku ji bo alîkarî çûbû bû. Hemû kesî vê pirsê ji xwe dipirsî "wê bikaribin dorpêçê biqelişînin an na?" Tav diqulibiya, reşî diket û sî xwe zêdetir pan dikirin. Xweza bi hatina êvarê xwe terkeserê tenêtiyekî dikir. Ax sar bû, her tişt di nav sarbûn û tenêtiyê de stûyê xwe ditewand. Hemû kes li benda nûçe û agahiyan bû, ji nişka ve parazîta cihazê bilind hat:

-Demhat! Demhat!...

-Heval, gohdar im!

-Heval, derketin pir zor e, pir zehmet e!

-Belê!

-Lê emê bicerbînin!...

Beriya ku serleşkerê taqima hevalê Şahan bersiv bide, li dora xwe nêrî temamê çavan li sirt bû. Dirêj û kûr fikirî. Yên hawîrdor tev meraq dikirin ka wê çi derkeve ji devê wî. Di jiyana xwe de biryara herî zor dabana, lê pir zehmet dihat. Pêl mandalê cihazê kir, di tariya êvarê de roniya cihazê a heşîn dida rûyê wî, bi dengekî nizim got:

-Baş e, hate fêmkirin!

Katjimêr derbas bûn. Dengê çekan her ku diçû kêm dibûn. Bayekî pir sar, rûyan mis dida. Katjimêr bibû neh, koma ku li hember girê mevzî girtibû di cihazê de bang dikir:

-Demhat, demhat!

-Gohdar im.

-Heval heya katjimêr yazdan xwe bigihînin me, em diçin, jêr re jî bibêjin bila xwe bigihînin me.

-Baş e, hevalên din?

-Operasyon pir berfireh e, pêwîste beriya sibehê em xwe bigihînin cihekî stratejîk.

Serleşkerê taqima hevalê Şahan, ji yên jêr re got, pîlên cihazê Êlî ber qedandinê bû her du aliyan de şidand.

-Hate fêmkirin?

Pişt re çend hep pirs li ser hev rêz kir. Lê belê ji hêla din tenê dengê perazîtê hat. Çend car dubare kir, lê hewldana wî bêbersiv ma. Pêwendiya cihaz bi yên jêr re qut bibû. Katjimêr dehûnîv bû, hevalan girte ba xwe û çû aliyê din. Koma alîkariyê hê jî nehatibû. Katjimêr bibû yazdeh. Stêrk li asîmana diçirûsiyan. Hê heyv derneketibû. Bêhedaniya koma gerîla zêdetir dibû. Hevalê Şahan xwest ku careke din pêwendî deynê, lê hevalê Dilovan bersiveke neyînî dayê:

-Pîl qediya ye!

-Her du cihaz jî pîlê xwe qediyane? Baş e, emê çi bikin?

-Gava em dikevin ser rê, em dikarin hevala rêkin ser depoyê!

Hevalê Şahan bersiv neda. Bi wateyeke baş e, serê xwe hejand. Koma ku çûbû jêr hê jî nehatibû. Hevalê Şahan, nêrînê tevahî gerîlayan girt. Nêrîna giştî ew bû ku heta katjimêr duwanzdehê bisekinin, ger ku newêtin birêkevin. Qut û qutdengê guleyan dihat. Weke ku xeberdarê nîşana tiştekî xirab be, di nav tariyê de hîsek bi mirov re çêdikir. Ji dûr ve dengê çeqelan dihat. Mirov digot qey xeberdana qedandina pevçûnê dide. Êdî dem nîzîkê nîvê şevê dibû. Koma alîkariyê hê jî nehatibû. Bêçare ketin ser rê. Pêwîstî hebû ku bilez şûnde bikişin. Hevalê Şahan ji rêberê komê re got:

-Baş e, dest bi meşê bike!

Koma gerîla di halê yekrêzî de kete ser rê û meşiya. Axaftin û deng qut bû. Serleşkerê taqimê Şahan, xwe gihand ba rêberê komê û bi lezgîn talîmata xwe da:

-Bi baldar bimeşe!. Qet nesekine!...Pêwîste em beriya komê seharê bighijin ciyê xwe. Heta ji destê te tê zû bimeşe!.

Vê neqlê jî meşiya ber bi dawiya komê ve. Peşengê komê çeka xwe dixwest bi cih bike li ser milê xwe, lê ji ber giraniya barê xwe nizanibû çi bike.

-Baş baldar bin, kes qut nebe, zû bikin hindik maye bibe tavehîv!

Çirên li hember nîşan da. Ronahiyek diyarî peyda bû, di navbera xeta ser gir û asîman de. Li ser girekî bilind keviya heyvê xuya dikir.

-Xem nexwe heval, kes li paş namîne, temamê hevalan xurt in!

Rêya wan ber bi Gundê Zêrî ve diçû. Gava ku di nav malan û bexçeyan de bihûrîn, heyv li yaserê wan bû. Nesekinin. Beriya sehar vebe, pêwîstî hebû ku xwe li girên hember bixistana. Dema ku gihîştin wan giran hêdî hêdî ronahî vedibû. Stêrk li asîmana nemabûn. Tenê stêrka seharê xuya dikir. Heyv li asîmana mîna meşaleyek ber tefandinê bû.

Ev sê rojbûn koma gerîla dimeşiya. Di rojeke bihara nû de, seharê zû xwe gihandin niqta kaniya gûzê! Êdî dengê çekan ji dûr ve jî nedihat, li her derî bêdengî serdest bû.

Yekemîn car yê axifî Şahan bû.

-Em saxlem gihîştin, ev baş e!... Lê hevalên din…

Keserekî kûr kişand. Pişt re Xeyrî axifî û pirsî:

-Em devriye derxin an na?

-Rast e, du hevalan bigire ba xwe, bi dûrbînê keşif bike!

Ji bo devriyê Esenya jî xwest ku biçe. Vê yekê li ser wan ferz kir. Şahan keniya û got:

-Ji bo ku tu gavên mezin bavêjî pêwîste hinek mezin bibî. Hê tu biçûkî, li paş wan bimînî ne baş e!

Esenya bi derbiraneke ji xwe bawer lê vegerand:

-Bila qet gumana te nebe, li paş namînim.

Yên din bêçare lê bi dengekî hêrs got:

-Baş e, xwe amade bike, em diçin!

Esenya pir şa bibû, bextiyarî ya wê di rûyê wê de diyar dibû. Xwe bi xwe re digot:

-Li vana binêre, xwe çi dihesibînin! Hewqas rê meşiyam li paş nemam, ma di devriyê de bimînim?

Yên ku diçûn devriyê ketibûn ser rê. Nêzîkê du katjimêran meşiyan, ya ku yekemîn car di nav daristanê de dengê lingan bihîst Esenya bû. Ji koma devriyê Hogir qîriya:

-Ew kê ye?

Hema di cih de bersiv hat:

-Heval heval!...

Fêm kirin ku hevalên wan yên di dorpêça dijmin de mabûn bûn. Ji kêf û eşqê devê wan qîç bibû. Ji wana kirî, di navberê de sal derbas bûne hewqas germ hevalên xwe hembêz kirin. Dilê wan hewqas rehet bibû ku, axaftin ji devê wan çênedibû.

Esenya berê xwe da Hogir û got:

-Min ji te re negotibû, hatina min ji bo koma devriyê oxir e, oxir!

Tev bi hev re keniyan û berê xwe dan ba hevalên xwe. Di rê de jî tiqe tîqa Qivircix Hesen bû û henekên hûrbijêr di nav axaftinên xwe de bi cih dikir.

***Rojîn Zaman***

# ÊVAR DERYA

***"Mejî, hest, hizir û raman hemû ji karkirinê rawestiyan. Weke ku bêhndana havînê de ne."***

Şev ji me re berg e, bi roj jî xewa di hembêza latên ku li vir û wir hilkişiyayî wekî şaxên ga yên ber bi ezmanan ve de. Çenteyên ku bêhna xwîdan, hilma nanê sêlê û tama xwê jê tê ji xwe re dikin balîv û palgeh. Em ezmana nakin mitêl (lihêv) wekî ku hozan û stranbêj li ser me dibêjin!! Baranpoş ebrîşîmê me ye, dolbend (kefiye) jî istebreqê me ye, ku havîn û zivistanê bi me re hevrêtiyê dike, êdî bûye parek ji jiyana me a herdem.

Jiyana me ne gelek bi nakok û serheve, ne jî belave û bêpergale; giyan û naveroka hevaltiyê şêwazê jiyana me ye. Rojekê li vir û roja dîtir jî li yek cihekî ku lingên me ên bi hedar, weke hedara H. Eyub, me bigihînê.

Her tişt li vê derê bi du aliyê! Her tişt dijminekî neyare û heman demê de, hevalekî dilnaz e; av, agir, çeka ku te diparêzê û heman dem de jî dikare xala kutahiyê ji bo jiyana te dayîne û heman tişt jî ji bo hemû tiştên ku li dora tene yan jî bi tere ne.

Her ku em dighîjin gewriya çiyayekî bilind, yan jî girekî ji girên ku ber bi erşa yezdanan ve bilind bûyî dibin, vinvina û xûşxûşa dengê bêsîman weke baranê tê gohê mirovan; di navbera yekîne, tabûr û bîryargehên ku li nava çiyan belav belav in; her yekê ji wan navekî xwe ê cuda cuda heye (Qendîl, Kawa, Botan, Herekul û hwd...) Ev yek jî dihêle ku em (grupa rênasa) dilşad bibin, û bi hêviya ku bîryara şandina

me ji bo erkekî da Besta, ber ku ev bû demeke dirêje me hîn hevalên xwe ên wê derê nedîti ne. Lewra her tim me bi bendewariyeke mezin li hêviya wê bîryarê bûn.

Demê ku hûn bi lutkên berz de hilperikîn (hilkişiyan) tu car li jora xwe mêze nekin; ber ku ew yek dihêlê ku mirov westa bibe û ji wî lutkî bitrse, gihiştina lutke jî ne mûmkun dibîne. Lewra pêwîste tu gavan bi lez bavêjî û bi xwe re bêjî "Ev lutka gelek asan û besît e, ezê niha bigêhêjim serê wî lûtkî ye."

Çendî ku lutke bilind û çetîn be, gîhîştina serê wî lutkî tiştekî gelek xweş û cuda ye, nikarim bi çend peyvan re wî hestî dadibirînim. Ked û westabûnê, hêl û vejeneke mezin ji te sitandi ye, westabûneke ku galte pê nabin. Xwîdana ji laşê te yê germ heriki ye, li te weke cawekî teze ji avşû yê dirxistê ye dike.

Lutke; çi pêzanînên te heye li ser lûtke?... Nîgareke bilind, li bin jî kendal û newalên kûr, ên ku devê xwe weke tîmsahekî birçî -bo hemû kesên bi lûtkan ve dihilperikin- vekiri yê! Hişyar be bo tu nekevî; tê weke zebeşekî hencirî bibê ye, ew jî berî ku tîmsahê birçî perçeyên te ên ma yî ji xwe re bike firavîn!

Demê ku tu dighîjî lûtkê herî bilind di herêmê de, bi dilşadiyeke mezin hîsdikî; dilşadiyeke ku ji kurahiya mêjuyê mejiyê te dertê. Mêjuyê ku ji keşta Nuh û ço yê Musa -bi hezar salan- kevntir e. Li hawirdorê temeşe bike, cihan hemûkî di bin lingê teda ye. Bajarên dûr, birqandina fener û çirayên bi xembariya xwediyên xwe dilşadin, rêkên xwar ên wekî marmasiyên avê li ser rûpela tobghrafiya hatine kişandin û deştên kapikî û belek ku weke welatê satrencê li ser xaknîgarê rêxistandî xuyadike. Tiştekî gelek şanaz û bihter e, demê ku tu çavdêriya cihana di bin xwe de dikî!! Weke ku tu di keşteke ezmanî dayî... Hun jî azmûn bikin ku rojekê bi lûtkekî bilind ve hilperikin û bi xwe azweriya vê yekê bibînin...

Li pêşiya te gelek lûtkên bilind û newalên kûr hene; evrazî û sernûşûvî, rabûn û daketin. Ev e zagona jiyanê, bilindbûn û nizimbûn!!

-Berwar berwar, berwar... berwar.....

Dengê banga bêsîmê ez ji avjaniya di olgeha deryayên lazewerdî ên aşopan de şiyar kirim. Bêsîmê bihedarî û li serhev bangî min dikir.

-Belê belê, kî bangî berwar dike?

-Berwar! Ez im- ez, Sîpan. Tu dengê min digrî?

-Rast e Sîpan.

-Silav û rêz.

-Silav û rêz Sîpan.

- Tu li kû derê bû yî? Min qenalek nehîşt û ez li te digerim e?

-Vaye em êste gihîştin nûqta Patata!

-Berwar, ku tu jivana me nasdikî ka biçê yî?

-Belê! Ez nasdikim.

Yekser min bêsîma xwe bir ser qanala ku berê me di nava xwe de diyar kiribû.

-Berwar! Notekî min a lezgîn ji we re heye.

-Fermo, gohdar im.

-(M/ 7 hene. Di h4 b....... por dirêj!!! Kv 20.... û ...!) berwar! Ma te fêm kir?

-Belê Sîpan! Fêm bû. Tiştekî din dibêjî?

-Na spas berwar. Serkeftin ji we re.

Çawa ku min bêsîm ji destê xwe danî, yekser havalên min weke mêşên hêngiv li dora min kom bûn û bagerên pirsan bi ser min de berdan.

-Ka bêje, Sîpan çi dixwast? Emê bi kû de biçine?

-Gelî hevalên hêja! Hûn dizanin berê me li kû derê ye?

-Ma emê çawa bizanibin e? Ka de bêje heval… bilez….

-Bila hevalên hêja xwe amade bikin û berê xwe bidin Besta yê….

-Min hîn gutinên xwe bidawî nekiribû, yekser ken û dilşadiyeke mezin kete nava hevalan; ji ber ku gelek bêriya

hevalên Bestayê kiribûn. Lê hevalê herî balkêş di vê yekê de, hevalê Şiyar bû. Dema ku me sedema dilşadiya wî ya evqas mezin jê pirsiyarkir, wiha bersîv da;

-Hemû nivîs û defterên min li Besta yê veşartîne, wê ev firseta derfeta dîtina wan nivîsan car din bidê min …

Hevalê Ferzad, kete navberê û got:

-Jibîr bike heval! Şeytan bixwe jî niha nizanê ka xezîneya te ya buha li kîjan derê ye. Dibê ku niha di bin erdê de rizayî ye…

- Na heval Ferzad! Min di cihekî hêmin de veşart, her wiha jî ez wî cihî gelek baş nasdikim…

-Ev edeta me ya her carê ye… Dinivsînin, dinivsînin, her tiştî dixin deftera xwe, helbest, bîranîn, rojane û çîrokên xwe… lê belê hezar car mexabin! Çawa ku dijimin derdikevê çiyan û şer dertê, yekser em defterên xwe weke termekî mirî dixin zikê gorên teng û tarî, di nav kevr û zinaran de vedişêrin, bi hêviya ku careke din lê vegerin… Lê belê, yan emê şehîd bikevin, yan birîndar bibin û heremê ji binî de bighurîn. Hop… her tişt li ber ba çû!! Ku erd her tiştê me dixwe, zikê wê tu car têrnabe…

-Tu car ez bêhêvî nabim… Ezê ji nûve wan defterên xwe derxînim û ji bo çapemeniyê rêbikme, belkî ji bo weşandinê guncaw bin

Hevalekî bi awayekî matmayî û galtewarî ji heval Şiyar pirsî:

-Heval Şiyar! Ma ev nivîsên te gelek mezinin, weke romana Mamişoğlu ne?

- Na na heval! Min li ser jiyana yekîneyeke gerîla di heyama salekê de, bi çalakî, bûyerên baldar, şehadeta hevalan, riva çend xayînan û hinek helbestên xwe nivîsandi ye

- Te li ser kîjan çalakiyê nivîsandibû?

- Min babeteke berfireh li ser çalakiya “Deryê Qaçê” nivîsand û li ser çend çalakiyên dîtir.

- Çalakiyeke gelek mezin bû…

- Heval Avareş ! Ma tu beşdarî wê çalakiyê bû yî?

-Kêmekî… « Ew çalakiya berhema ked, raman û tektîkeke gelek mezin û jîr bû, derbeke mezin di hundirê dilê dijmin de lêxist, difna dijmin xiste bin heriyê, hîşt ku ew duvika xwe bikşîne bin çaqên xwe û bêveger ji wir birive… »

Di vê dere de hevalê Kawa – ê heya niha bêdeng bû- xwe xist nav germahiya vegotina nêrîn û bîranînan : « Leşkerên dijmin weke kevroşkan direviyan !! Nêzikî nodî mirin, gelek ji wan xwe ji kendalên – ku weke quçên gayên mezin in-avîtin. Serê wan weke zebeşan ku ji serê Hemedê Oso ketibûn dipelixîn. Leşkerên ku ji ber narincok û guleyên me filîtîbûn, bibûn mevandarên gelî û kendalên kûr, ên ku hembêza xwe fireh-fireh ji wan re vekiribûn « Bi xêr hatin, ser serî û ser ça-van re hatin, fermo. Ezê we ji rovî û çeqelan re bikim e şîv û paşşîv ! »

-Lao heval ! hemû dîn û gêj bibûn… Jixwe piştî wê bûyerê, serkirdetiya dijimin neçar ma ku hemû leşker û serleşkerên heremê bighurînin »

-Ku ne hevkariya hemû yekîne û hêzên heremê ba ev çalakiya mezin bi ser nadiket… !

-Rola wê çalakiyê di bilinkirina moral û erwê hevalan de gelek hebû, bi taybet jî piştî ku her kes li ser şehadeta hevalê Rojhat xemgîn û bêzar bûn.

-Hevalno ku hûn amadene, em dest bi rê bikin, dereng e, heval niha li benda me ne…

Bi nîvbûna rojê re, em gihîştin nêzî gundekî wêran û barkirî, ku ji hovên lawirî ,mirovên hov ji cerdevan û leşkeran re bêparastin û bêdergîvan mayî ye. Ev gund û gelek gundên hawirdorê berê ji bona şoreşê piştîvaniyeke mezin di hemû aliyan de dikirin, lê xebînete ku niha bûye lîstikgeha hov û lawirên çolê ye.

-Em nêz bûn hevalno! Ka kêmekî em bilezînin. Lingên min ji erdê gav dixwarin, min hîsdikir ku kêm mayî ye- ber ve şûnwarê gundê ku biaramî di hembêza dayîka xwe ya jîngeh de bi narîniyeke bêzagon û bêpanusk de razabû- ku ezê bifirime! Min dît ku dumanek ji xaniyên gund derdiket

ezmana, min di dilê xwe de got:“ev hevalên me çiqasî bêxem in, nehişyar in, tu dibêjî qey derketina seyranê li kenarên çemê Firatê!! „. Bala min ji hemû tiştî valabû, tenê di mejiyê min de dîtina hevalan- ku ev bû demeke dirêje me ew medîtine- hebû. Vê yekê jî hîşt ku ez gelek bilez ber bi gund ve biçim. Min her bêhtir dilezand, bi sedan hizir û hestên curbecur weke pêlên agirekî gur di bin çilkên baranê de dilîstin di mejiyê min de diçûn û dihatin… Çawa ku ez gîhîştim ber xaniyê despêkê, bi hêviya ku yekser ez hevalan hembêz bikim, lê, Yekser bizav û libatên min di cihê xwe de hişk bûn, li min weke putekî ji kevr afirî hat, bêamar hest û gisikên gur û har di mejî yê min de bûne mêvan! Birusk, bager, ba û ziryan di mejiyê min de tar û bar, har û dîn bûn, weke ecacê deşta Sirocê û Herranê bûn. Vê sprîzê zimanê min bi girekorekê xirpoxe kir, çilkên xwîdana sar weke çaviyan ji memleketa laşê min ê kevirî diherikîn…

Mejî, hest, hizir û raman hemû ji karkirinê rawestiyan. Weke ku di bêhndana havînê de ne. Ê ku yekser li hembera min weke stunekê disekinî, tenê di navbera me de çend gav hene, wî jî bi sersamî û matmayîyeke bêhempa li min mêze dikir, li wî jî lerzîn, tirs û bizîn bibû mêvan. Ez bawerim ku me herdu yan jî baweriya me bi rûniştina Hîtler li ser kursiya papazê Vatîkana Roma hebû, bi firîna çêlekan di ezmana de hebû û dîtina stêrkên nîvro hebû, lê belê ku bi vî nêzikî de, rûbirû li hemberî hev weke keviran bisekinin, me tu caran ev yek hizir nekiribû.

Min hilmên henasa wî ya germ û bêzagon li rûyê xwe hîs dikir, di navbera me de tenê du-sê sapên zirav hebûn, sînorê di navbera agir û barutê de, roj û tarî yê de, di navbera erê û na de… Di navbera mirin û mayînê de! Bi awakî netebitî li min dinêrî, dizanibû ku em di çi rewşê de ne. Min amartina her saniyekî bi hemû beşên wê dikirin!! Min têderxist ku dema min û rabûna bi çi tiştî nîne. Wî jî bi rûyekî zaroktî ê bêfam û serê kurkirî li min dinêrî. Di jiyana min de ev cara yekeme ku ez dikevim rewşeke wisa, rewşeke pir çetin û bêrehm de mam. Xendeyeke melul li ser rûyê wî ê di bin komê qimijokî û cilên

belek derhat. Min re hat weke ku ew xendeya, dibêje „ Silav li temen û jiyana te ya bûrî, êdî dawiya te hat“ maf ê wî bû, insiyatîf di destê wî dabû, despêk û dawî di devê loleya MG3 a ku arasteyî sîgê min dabû, jixwe çeka min li milê min de daleqandîbû, derfeta kişandina çekê tunebû. Min li rûyê leşkerê ku weke sîhê li pêşiya min disekinî ye mêzekir. Di ber çavên min re her tişt weke biruskê derbasbûn, rûyê dayîka min ê westayî ku bi destê xwe ê narîn li serê min dixuşand, dibistan û demên zaroktiyê, şer, mirin, çalakî, hevalên şehîd ên ku min bi destê xwe ew binax kirin û her tişt bêzagon, tevîhev derbas dibûn… Nizanim! Lê min awêneyeke cuda di rûyê wî leşkerê burjuwazî de dît, nermatî û nezantiya bajarvanî yê. Min di dilê xwe de hana (dua) dikir ku hevalên min neyên, bo ku ew jî wekî min nekevin çembera dijmin.

Ez li xaleke lawaz û derfeteke biçûk -bi qasî serî derziyekî- ji bo rizgarbûna ji vê belê digeriyam. Heman dem de dengek ji pişt leşker ve hat, komek cerdevan bûn, dema ku çavên wan li min ketin, yekser kenekî weke ê çeqelan li ser rûyê wan ê weke ewrên bêbaran de derhat, diranên wan ên reş û kurisî di bin simbêlên wane kujul de xuya dikirin, te digot qey nû ji ser xwarina fişqiyan rabûne!

-Ka wî terorîstî bikuje… “haydi vur asker, vur sana… „ ka wî bike weke patatayê kelandî…“çabuk asker bitir bu terörîs-tin işini „

Cerdevanan dest bi dijûn û xeberên pîs ji min û şoreşê re kirin… Min dît ku leşkerê Tirk tiliya xwe da ser tetikê bo ku xala dawiyê ji jiyana min re dayne…“ lê na û hezar na, ey ke-sên bêrûmet ez bi asanî namirim!! Ji bo hemû kesên baş, ji bo hevalên xwe ez namirim… ku hun çibikin jî lê ez namirim „

Ez li derfetekê digeriyam bo ku ji mirina jêneriv bifilitim. Heyama di navbera derketina gulê ji devê loleya MG3 ê ta gihîştina min gelek kêm e, tew nîne! Yanî rizgarbûn weke aşop û rewrewkê diyar dikir!! Çerxa rojgarê a lezgîn zivirî, … û tiliya xwe bi ser tetikê de dagirt, êdî mirin hat!!... Lê ew deng û biruska ku ez li bendê bûm çênebû… guleya yekem

çiruk derket… Leşker jî matmayî di şûna xwe de cemidî… Yekser, bêyî ku demê winda bikim, bi hemû hêz û vejena xwe dest bi revê kir, lê min nişkav de xwe li qeraxa kendalek kûr dît!! Lê bêyî ku ez bi çi tiştî bihizirim, bê yî ku li ser encamê bifikirim, yekser min xwe ji ser wî zinarê bilind avêt jê rê… Çawa ku ez li ser erdê hişk û biring ketim, hemû hestiyên min weke kayê lê hatin, hemû laşê min weke hevîr bibû… Lê tişt nabe, ne xema min e, niha jî pêwîste ku ez ji vir birevim. Heyanî ku leşker û koma cerdevanan hatin ser hişê xwe û ji wê sprîzê derketin, dest bi gulebarana bê serûber li min kirin… Di navbera saniyan de min dest bi revê kir, ez weke bayê dibeziyam, bêyî ku guh bidime kevir, dar, strî û barana guleyên agir ê ku ji her mil û alî de dihatin… Gelek gule li kevir û latên derdora min diketin û bi xwe re qîjînî, ax û toz radikir ezmanan… Êlegê min ji sedema bayê bezê lê wekî pereşutê hatibû, guleyan gav bi gav bi min re tevdigeriyan, min didît ku gelek pizotên agir di elegê min re derbas dibin. Armanca min ew bû ku xwe bighînim dola jêrê.

Çawa ku ez gîhîştim nava daristanê, min dît ku agirê guleyan ber ve hêzên dijmin tê,‘‘bijî hevalên min ên qehreman „. Hevalên min, ji bo ku bala dijmin bikşînin ser xwe, dest bi êrîşê kirin… Ev yek jî bo sedema ku ez heman heman ji bin rehma agirê dijmin bifilitim. Min di nava daristana tarî de, komek heval (ên ku em ji bona wan hatibûn vir) dîtin, kêfê min gelek xweş bû.

-Heval! ka zû were vê derê, bilezîn e.

-Bi xêr hatî heval, maşalê çi nexweşî bi serê te de nehatî ye? Tu birîn bû yî?

Wê demê êdî ez bi azareke weke agir di tenişta xwe ya rastê de hisiyam, min mêze kir ku xwîna germ jê diherikê… Lê ji bo dilniyatiya hevalan min xemsarî nîşan da:

- Çi tişt nîn e, ez baş im baş. Hun çawan e? Maşalê hûn neketin çembera dijmin?

-Na! Nexêr, me tedbîrên xwe girtibûn.

Heman demê de, hevaleke keç bi xembarî ber bimin ve hat û got:

“Bibûrîne hevalê hêja, em bûn sedema beleyê ji bo we, ji rûyê mede tu jî birîndar bû yî… Me bi serê we de bele anîn…”

-Na heval bepirsgirêk e. Ev karê me ye, çi gunehê we nin e… Ka titun li gel we heye, dilê min cixarakê dixwaze !

Demek derbas nebû da ku dengê hirhura Kobrayê ji derdorê de hat. Agirê xwe berdida cihê hevalan, her wiha jî car car davêt nava daristanê bo ku me vekişînê libtandinê, lê em nehatin lîstika wî. Hevalên me li rexê dîtir şer germ kiribûn, ji sedema ku ew û leşkerên dijmin di nava hevdabûn lewra Kobra nikaribû bi serbestî cihê wan gulebaran bike. Hevalan dixwastin ku dijmin bi xwe re mijul bikin ta ku em xwe ji wê dolê derxînin.

-Hevalno ! Ka bi bêsîmê bi hevalên me re biaxifin da ku xwe bikşînin hêmnatiyê, bila jiyana xwe nexin xeteriyê ( Lê min hevalê xwe baş nasdikirin ku tu car bi asanî dev ji şer bernadin, jixwe ev bû demeke dirêje ku ewna li derfeteke wisa digerin bo ku dilê xwe rihet bikin, lê dîsa jî pêwîste ku jiyana xwe biparêzin.)

-Bibûrîne heval ! em nikarin bi wan re biaxifin ; rewş gelek xeter e pêwîste ku em biçin alîkariya wan.

Çend hevalan berê xwe dan cihê pevçûnê, di heman demê de firiniya moşekekê hat û li ber me teqiya, duman û ax avête ser me.

-Ez bawerim ku cihê me têderxistin, pêwîste ku em hemû ji vir derkevin.

Lê ji şansê min ê xerab ku birîna min her çû xerab bû û azarî bêhtir bûn, lewra ez neçar kirim bo ku du heval bi min re biçin cihekî dûrî gule û narincokên dijmin. Çendî ku min ev yeka nepejirand jî lê dîsa hevalan daxwaza min nepejirandin.

-Na hevalê hêja ! tu birîndarî, pêwîste ku tu xwe biparêzî, ê dîtir jî emê çareser bikine, baweriya xwe bi me bîne…

Xwîna min her diherikiya, tiştekî ku me bida ser tune bû, hevaleke keç, fanêleyê xwe qetand û ji min re kir pêçek, vê yekê jî hîşt ku hestên hevaltiya rast di dilê min de bikelin û dilê min li ser hevalên min bişewitê.

Çi ne xweş e ku hevalên te di tekoşîna di navbera mirin û jiyanê de ne û tu jî li vê derê di bin zinarekî de xwe veşêrî. Ez bêzarbûm, maşalê çi nebaşî bi hevalên min neyê. Ax xweska ez niha li gel we bama. Lê heya ku roj neçe ava, ev şera ranaweste !

(( Ey mehrîbanê şanaz û mezin, wê çi demê ev roja avabibê ye, ku dêla kirasê xwe ê sor û zêrîn bi pê xwe ve bixuşîne pişt asoyên bi ewr ? Ji ber ku em tarîtiyê baş bikartînin, dijmin jî vê yekê dizanê, lewra newêrê di taritiyê de bi me re şer bike! Ka bilezîne ey roja pîroz, ka zû biçe mala xwe! Ey roja ku ji despêka afirandina gerdûnê de roja îro her tim bi ser me de gizingên xwe ên germ û narîn didî, vê xaknîgara ku bi te tebarik dibe, ronahiya te ya ku dibe awêneya dil û hêviya hemû evîndaran, tu her tim ji pêxember û dilpakan re dibûyî rêber û ronî, ji kerema xwe kêmekî bilezgînî avabe, hevalên min di tekoşîna jiyanê li dijî mirinê de ne. Dilnaziyê bi me bike ey roja pîroz, ne tenê ji bo me ; lê ji bo ew dayîkên ku li paş van çiyayên bilind bi hêviya dîtina zarokên xwe rojan dijmêrin))

Ev çîroka bi dawî nebû, lê belê rojgar ew bê heşyarde de çîroka me sekinand ; belkî ku rojgar car din ev biryara xwe li dîwaran bixe, ku denê lîstik û xelatên me ên zaroktiyê derxîne.

Giyanên me ên li paş ewrên çiyayên pîroz veşartîne, bi hêviya ku kevir bibin aveke zelal da ku têhna me bişkîne !

Ezê ku ji roja ji Meşyana ketim, li qurtek av, bo têhbûna xwe bişkînim digerim. Ez rewrewkeke xapanok naxwazim. Naxwazim ku giyanê xwe ê di olgehên hertiştî de bixapînim

Min tê derxist ku lûtkê her tiştî bervaja wî ye !!

***Pola Can***

# AX Jİ XWÎNÊ, HÊZA XWE DİGİRE

***"Ber dilê min pir şêrîn e Wek kulîlka bi hilm û bêhn e Dilê min bûye evîn eWez bi evîna te nikarim Hela were şêrinê Derman bike birînê"***

Hevaltî çi ye? Heskirin çi ye? Ev herdu pirs di anîna ziman de pir hêsanin. Lê di kûrahiya xwe de pir watedarin. Du pirsên ku Şoreşa Rizgariya Netewî bi xwîna salan a pakrewanan avdayê û hîna jî av dide, du pirsên ku di bin alewên agir û ronahiya wan ezmanê tarî, ronî dike û mirovan serxweş û sermest dike. Ger destek dirêjî wate û pîrozahiya herdu pirsan bibe, bêgûman ew dest ku pola jî be, wê were birîn. Ew herdu peyv (hevaltî û heskirin) bi sala bû, mîna gerdena sûkra bûkekî, di dilê şervanên azadiyê de bi cî û daleqandî bû. Bi sala bû gerîla li çiyayên serbilind, mîna agirê Zerdeşt van gotinên pîroz, dihebandin. Hevalan bi dirêjahiya 15 salên şer li ser van gotinan, çeka xwe dikirin alava tevnê jiyaneke pîroz. Bi sedan, bi hezaran kes bibûn qurban ji bo parastina wateya rasteqîne a van gotinan. Te digot qey wateya hevaltiyê bûye hz. Îbrahîm Xelîl û ferman dide, wisa şervanê azadiyê xwe dikirin qurban.

Çalakiya Bamernê ku mîna morekî şûna xwe li başûr hişt, ji bo pênc pepûlan, pênc sitêrên ji dilan rijiyayî, pênc rêhevalan dihate lidarxistin. Pênc lehengbûn ku, bûne kaniyên xwînê û tîna xaka welatê li ber xwe dan, şer kirin û di dawî de tevlî refê pakrewanan bûn. Ew pênc heval ku bi

birîndarî dikevin destê PDKê de, piştî îşkence kirinê, bi destê pêşmergan têne şehîd kirin. Li ser bingehê tolhildana van pênc hevalan, me biryara êrîşkirina li ser Bamernê da. Heya wê çaxê peyvên heval Xoşnaf ku yek ji her pênc hevalên şehîd bû, di gohê me de deng vedida. Heval Xoşnaf dema ku birîndar bû, bi cihaz ê bêtêl pêwendî bi me re çêkir. Wî bang dikir ku heval wan xilas bikin. Mixabin êdî wext derbas bibû. Hêzê îxanetê ew tev şehîd xistibûn. Piştî wê bûyera dilbiêş, me dest danî li ser Bamernê kire armanca çalakiya xwe. Berî roja çalakiyê, ew çend roj bû ku me amadekarî dikirin.

Bajarê Bamernê dikeve herêma Behdînan. Ew demek dirêj bû ku dijmin ew bajar mîna devereke bingehîn a êrîşkirina li ser gerîla bikardanî. Derûdora bajar tev bi tangan hatibû xemiliandin. Ji ber girîngiya wî bajarî me êrîş li ser wir, kir armanc. Wate di şûneke wisa stratejîk de, me dixwest ku çavê îxanet û dijmin bi tirsînin.

Plana çalakiyê bi çar taburan hate amadekirin. Ji her reng û şêweyê haziriya çekê gerîla, dihate kirin. Ew cara yekem bû ku, bi hejmareke wisa zêde çalakiyek wê bihata kirin. Berî roja cengê bi çend rojan, keşfeke dorfireh hate kirin. Encama keşfê, armanca çalakiyê dida diyar kirin. Pêwîst bû ku senger li nêzî bajar werin kolan. Cihê rêveberiyê wê sê kîlometre jora Bamernê hate nîşandan. Grubên êrîşê, parastin û alakariyê jî cihên xwe nasîn. Hevalên pusuyê (xefik) jî şûna xwe fêr bûn ji bo ku di dema çalakiyê de, ji deverên din alîkarî ji dijmin re newe, girtina reya ji Zaxo tê Bamernê, rêya ji Qadîşkê, Enîşkê û Şeladizê ve tê Bamernê, wê were girtin.”

Li ser bingehê plana li jor, me tevî çalakiyê nasîn. Bi hatina roja çalakiyê, me tevan xwe amade kir û bi êvarê re em bi rê ketin. Her çar tabûr ne li ba hev bûn. Tabura me ku li serê Çiyayê Metîna bi rê ket, wê li nêzî Bamernê bi gihişta hevalên din. Di wê rojê de me soz ji Metîna re dabû ku, tola wan pênc hevalan li erdê namîne. Her ku em dimeşin,

ronahiya bajar a Bamernê mîna xelekan diyar dibûn. Me soz dabû! Ger ew bajar tev bibe leşkerên şer li pêş me em venedigeriyan. Di rojek mîna wê rojê de şehîdbûn, mîna xelatekî pîroz bû. Şehîdbûn, mîna peyvên Mihemet Şêxo bû:

Ber dilê min pir şêrîn e
Wek kulîlka bi hilm û bêhn e
Dilê min bûye bi evîn e
Wez bi evîna te nikarim
Hela were şêrînê
Derman bike birînê!

Belê, pênc heval di dilê min de bibûn birîn. Şehîdbûn jî derman bû ji bo me. Bi rêya wê, me wê bar bikira cihana wan hevalan. Her gavekî hêrsa me zêdetir dikir. Êdî tevahî xeyalên me bibû çalakî û serkeftin bi dest xistin. Em bi wê hêrs û ponijîna xwe, yek bi yek derbasî cihê xwe yê diyar kirî bûn.

Wê gavê saet çarê sibehê bû. Em tev mîna xirîstiyanên ku di roja yekşêmê de li benda zengilê dêrê bin, wisa li benda dengê doçkayê bûn ku me yê bi wê dest bi çalakiyê bikira. Her yek û bi taybet ez, di nava ramanekî kûr de bûn. Mîna her carê me xwe ji her tiştî re amade kiribû. Bêdengiya wê sibehê, tenê bi dengê dîkan dihate dagirtin. Perda wê bêdengiyê, bi terqêniya doçqayê parçe bû. Dengê wê dihate wateya dest pê kirina çalakiya dîrokî. Deng fermana tolhildanê da. Êdî ji her hêlî ve, mîna taviyekî biharê, gule ber bi bajar ve çûn. Hêdî hêdî grubên êrîşê diketin nava kolanên bajar de. Şer bû şerê bajaran. Piraniya pêşmêrgeyan xwe di nava qeleya nav bajar de veşartin. Me piraniya hêza xwe da li ser qelê.

Gruba ku heval Hesen serkêşî jê re dikir, di sirên pêş ên êrîşê de bû. Gava ku wan di kolanekî de şer dikir, ji nişka ve, gule ji paş ve li ser wan de barîn. Li wir heval Hesen birîndar ket. Hevalên li ba wî, bi tevahî fedakariya xwe ew hilgirtin û li deverekî bi ewle veşartin. Heval Hesen her çendî li ser grubê radiwesta jî, mirov ji dilnizmiya wî hîs nedikir ku ko-

mitan e. Ji hêlekî ve hevalê hevalên xwe bû, ji hêla din ve komitanekî fedekar bû. Wî li her deverî rola xwe a şoreşgerî bi cih danî. Ew di nava şoreşê de pijiya bû. Tevî ku ew çend sal bû li çiya bû jî, mîna vê carê bi giranî birîndar nebibû. Şûna ku jê birîndar bibû, xwîn jê nehat. Wate xwîna birînê bê ku derkeve, di nava hinavan de dima. Mixabin hîna bijîşk negihiştî ser, li wir, li şûna çalakiyê şehîd dikeve. Berî ku heval Hesen xatirên xwe bixwaze, tenê çend gotinên mîna xunafê li ser pelan ji ser lêvên wî daketin:

-Min tim û tim şehîdbûn, dixwast. Lê îro û di vê kêliyê de ez pir hêrs bû me. Şehîdbûnê naxwazim! Ji ber ku xwîna min tevlî vê xakê nebû! Her di hundirê min de ma! Hevalno silavên min ji tevahî hevalan re hene.

Erê! Mixabin heval Hesen bêyî ku hesreta dilê xwe bi cî bîne, bar kir. Wî tim dixwest ku bi xwîna xwe vê xakê bineqişîne. Lê ew xwestek bi mayîna xwînê di cerg û hinavên wî de, bi cih nebû. Wî tim wisa bawer dikir ku; “ax hêza xwe ji xwînê digire” lê xwîna wî bê ku biherike ser axê, li ba wî ma.

Çalakî bi serkeftî û bi encamên ku me dixwest bi dawî bû. Lê heya em gihiştin şûna xwe jî, hîna kesî ji yekîneyê, bi bûyera heval Hesen nedizanî. Tenê xebera rêvebiriyê ji vê yekê hebû. Tevî wê yekê jî, me di rê de tiştek ji meşa xwe kêm didît. Lê ma, me yê kengê bawer bikira ku heval Hesen kêm e?!.

Ya rast me nedixwest ku em bawer bikin jî, her yekî hîs dikir ku ew şehît ketiye. Lê kesî jî nedixwest qal bike. Dema ez vê gotinê dibêjim jî, belkî ne li gora zagonên şer e: “Ez bawer nakim!” Lê ev rasteqîna şer bû. Girî li hember heskirina hevaltiya rasteqîn mîna dilopek ji ava çemê Firatê ye. Tevahî şehîdbûn bi wate ne. Lê şêweyê şehîdbûna hevalê Hesen mîna birîna wî di dilê min de bêderman e.

***Vegotin: Zelal Gûyî***

# PEPÛLEYA ÇAREMÎN

***"Lê mixabin pepûleya çaremîn dereng mabû, ew hingî gihişte şuna hersê hevalên xwe, gava wan barkiribû cîhaneke din."***

Demsala havînê, meha Tirmehê bû. Gerîlayên welatê agir û rojê xaka qehweyî a bii berhem di qelişandin. Sê cotling dimeşiyan. Bi hêcan û lez bûn. Ji gelek hêlan ve awirên îxanetê ew dişopandin. Pişt re xakên me tên avêtin. Rengê qehweyî vediguhêze rengê sor!

Sê rêheval! Sê mirovên dûrî welatê xwe. Dûr ji xaka xwe dijiyan. Songul, Seygul û Serdar! Hersêyan navê welatê xwe û li ser xaka xwe jiyankirin kiribûn armanc. Berê agir, êş, şer û mirin nas nedikirin. Pişt re wan bihîst ku pir dûrî cihê ew lê dijîn, welatek heye. Navê wî welatî, welatê rojê ye! Welatê ku weke parçeyeke ji bihuştê ye. Başe! Lê gelo kî bûn ên li ser vê xakê? Zarokê agir kî bûn? Tiştek çawa ye ku mirov ji agir be? Wan meraq kir û ji dayîka xwe ya dîrok ew pirsana pirsîn. Wan sir û nehêniya pirsa xwe; "çawa mirov ji agire" nezanîn û nenasîn. Lê dayîka dîrok, çîrok ji wan re, vegot;

-Her çar pirpirîk, lehengvanê sira agirin! Wan biryar da ku rastiya vê yekê bizanin. Pirpirîka yekemîn li dora agir digere û dibêje:

-Agir ew e ku ronahiyê dide.

Pirpirîka duyemîn, hinekî nêzî agir bû û got:

-Agir ew e ku germahiyê dide.

Pirpirîka sêyemîn piştî ku nêzî agir dibe û alevên agir perê wê dişewitîne, dibêje:

-Agir ewe ku dişewitîne.

Lê tu kesî ji wan negihişt sira (nehêniya) agir. Lê, pirpirîka çarem bi van namîne, lii dora agir digere, wisa dizivire ku heya dişewite, di nava pêtên agir de winda dibe û diçe jiyana bêveger! Ew bi tenê gihişte nehêniya agir, lê...

Piştî li çîrokê guhdar kirin, pirpirîka çaremîn bandorek mezin li ser hersêyan kir. Wan êdî biryar dan ku ji vir û şûn ve nehêniya agir ji hev derxin û mîna pirpirîka çaremîn bijîn.

Songul keçeke kurd bû. Ew bedew bû. Hesdikir û dihate heskirin, dikeniya û dida kenandin. Ew li Anadoliya hundirîn, hatibû dinê.

Saygul û Serdar xwişk û bira bûn. Li Erzîncanê ji dayîkbûne, lê mixabin wan Erzincan nedîtine û her tim li Stenbolê jiyane. Saygul keçeke kurd ya mêrxas, zana û dilsoz e. Serdar jî, ciwanekî kurd e, bi înat, jîr û bi mereqa milîtaniyê ve tijî ye. Her sê jî, xwendevanên zanîngehê ne. Li wir hev dinasin, bûnê heval û Hogir. Li wir jî, têkoşîn naskirine. Li wir dest bi legerîna nasîna sira welatê roj û agir kirine. Wê demê, gava dihate xwestin, roja wan tarî bibe, wan fêmkir ku dema rêwitiya ber bi rojê ve hatiye. Dema ku biryar dan, çar kes bûn. Gava kincên xwe yê bi yek rengî girtin, êdî dema çûnê hatibû. Mixabin tenê sê kesan dikaribû vê carê herin. Ji ber vê yekê, yek ji wan dima. Ew ê biçûnan welatê agir. Wê çiya bi çiya, zozan bi zozan, çem bi çem bigeriyana. Berî ji hev qutbûnê, Songul got;

-Em diçin meskenê pirpirîka. Ji bo derxistina sira agir, em diçin bibin pirpirîk, em ê li benda te bin heval!

Ew 24 katjimêran li paytexta welatê xwe, li Amedê man. Ew cara yekem bû ku ewqas nêzî welatê xwe dibûn. Wan her sêyan şadî û bextewariya vê rojê parve dikirin. Yekem karê gerîla ew bû ku, ji wan re nav bibînin. Lê wan nav ji berê ve amade kiribûn. Her sêyan jî, ew navên diyarkirî pejirandin. “Arjîn, Berfîn û Şervan.” Ji bo wan her sêyan êdî jiyanek nû

dest pê dikir. Ew her sê jî, mîna hev bi coş bûn. Hîn ew negihiştibûn biryargehê nûçeya wan li wir jî belav bibû û herkes bi meraq çav li rê bû. Jixwe tevlîbûna herdû xwişk û bira, bandor li ser her kesî kiribû.

Wan her tiştê nû, meraq dikirin. Şal û şapik, bombe û rext, kefî û bi taybet jî jiyana gerîlayan mîna xewnekî bû ji bo wan. Niha jî, ew xewin pêk tê.

Ji hatina wan, hefteyek pir zû derbas bû. Ew her roj di deverekî cûda re derbas dibûn. Roja dawî jî, berî ku rêwitiya meşa xwe bidomînin, her sêyan bi hev re şal û şapikên xwe, wêne kişandin. Ew ê êdî biçûna şûna ku heval lê diman. Lê, di şeva heftan de, piştî wêne kişandinê, her sê jî xemgîn bûn û di rê de bêdeng dimeşiyan. Her sê jî, li ser negihiştina hevalê xwe yê çarem difikirîn. Hevalan ji her sê yan re gotibûn;

“Bi lez bimeşin.”

Ew tu deman bi kemînên xayîn nedifikirîn. Rastiya bi qirêj a deshilatên li ser welatê rojê, qet neketibû xeyalên wan. Hîn wan meş didomand, ji nişkê ve fîşek teqiya! Dengê teqînê bilind û zêde bû! Lê dema li hev nêrîn, pir şa bûn, Ji ber ku hîn li cem hev bûn. Bibûn yek laş, yek dil û yek hizir. Niha di vê kêliya zor de her sê jî, pirpirîka çaremîn di dilê xwe de hîs dikin. Şervan bi wê hestiyariyê got;

-Heft roj û heft şev derbas bûn?

Berfîn;

-Em ê sira agir ji hev derxin”

Arjîn, di dawiyê de got;

Pirpirîka çaremîn!!

Lê, mixabin pirpirîka çaremîn dereng mabû. Ew hingê gihişte şûna her sê hevalên xwe, gava wan barkiribûn cihaneke din. Wan tenê heft şev û heft rojên bihara temenê xwe jiyan kirin. Her heft roj û şev jî, bi lêgerîna sira agir derbas kirin. Di dawî de jî gihiştin! Ew hersê bûne pakrewanên agir û riya rêhevalên xwe ronî kirin.

# WÎ BAŞTİR DİDÎT

***"Ev deh sal bû ku bala xwe li çivîkan ne xistibû, ne jî bala wî kişandibû. Lê niha bi dengê xwe jiyan dida wî, hêza dîtinê dida wî."***

Nizanîbû korbûn çi ye?

Ew deh sal bûn şer dikir.

Biyaniyê jiyana tarî bû, jiyana veşartî, jiyana bi tenê!

Têra xwe temaşeyî çiyan dikir. Teht û zinarên tûj, gilover û renga reng. Di şevên tarî de, berê xwe dida stêrkên ku asîman dixemilandin. Li ser dengê hevalên xwe çavên xwe vedikir. Diçû şûna pêwaniyê û li ezman temaşe dikir. Demên dirêj bi meyzekirina asoyê sor derbas dikir. Ew çax hêviya rojeke nû di dilê wî de aj dida. Bi coşî dikeniya, diponijî û rojên şerê giran dijiya.

Tevahî dol, gelî, berpal, kevî, kendal û zinarên çiyayên welatê xwe didît û lê digeriya. Geliyên kûr ên Amedê, teht û zinarên Dêrsimê, deşt û zozanên Agirî, gir û firekeyên Çiyayê Çolemerg û Şemzînanê, daristanên Botanê û di dawî de jî, dol gir û darên Qendîlê dîtibûn. Li ser lûtkeya çiyayên welatê xwe temaşeyî bajarên welat dikir û dijiya! Rengê tevahî kulîlkên çiya dîtibû. Tevahî di dil û majiyê xwe de hilgirtibû.

Ma kêm caran kerengên Çiyayê Gever û Gabarê di beroşa çelexwehrî de sor kiribûn? Ma kêm caran tolika ber palên Bagokê kom kiribû?

Wî pir dabû hev û dijiya! Dîtibûn!

Deştên Batman, Bismil, Sêrt, Mûş, Gever û di dawî de jî deştên Qendîlê dîtibû. Ne tenê ew ger di wêne de be jî, wî Serokatî jî dîtibû. Bi hevî û baweriya wî dijiya. Wî tim dixwest berî ku şehîd bikeve û hîna tu bela nehatin serê wî, Serokatiyê bibîne.

Lê mixabin wî nedît û hêviya dîtinê jî winda dibû! Serok li İmralî, ew jî li Qendîl.

Ew bi hêviya dîtina başûrê welat hatibû Qendîlê. Lê hîna salekê wî tijî nebibû, şer derket. Xayînan êrîşî ser sengerên hevalan kirin û şer dest pê kir.

Di şevekê hişkesayî de, êrîş çêbû. Bi zext û zoran bandora tolhildana hevalên xwe yê şehîdketî, êrîş dikirin. Bi rik û hêrsa li dijî xwînmijî û xayîntiyê, şer dikirin. Bi hêviya gihiştina rojên aram, rojên dildarên azad, rojên gihiştina hestên roja nû, rojên rûxandina diwarên ewantiyê, şer û têkoşîn dikirin.

Ew jî, li kêleka rêhevalên xwe, li ser sînorê mirinê dijiya û dimeşiya. Di dema êrîşkina ser hêzên xiyanetkar de, narîncoka ku hevalê wî davêje, li ber wî dikeve û diteqe. Çirûskên narîncokê, li wî belav dibe. Weke ku deng ji dilê wî derkeve, xwe avêtibû erdê. Tenê herdu destên xwe danîbû ber çavên xwe!

Çavên wî şil bibû. Lê ne ji rundikan, ji xwîna gerim bû! Piyên di meqeba reş de gerim bibûn. Bê ku wisa bisekine, hêdîka di cihê xwe de rûnişt. Hew dikarî êrîşê bidomîn e. Di serî de wî jî nizanibû bê çibû ye. Hevalên wî jî tu tişt nedîtin. Bi germbûn êrîş didomandin.

Ew jî li ber pala Qendîlê, li ser girekî rût û tazî runiştibû. Li ser deşta Singeserê re bû. Li dijberî hêzên xiyanet bû. Êdî roniya heyvê jî nedidît. Rengê gul û hevalên xwe êdî nedidît.

Hevalên wî paş çalakiyê ew anîn şûna hevalan. Berî ku wî bibin nexweşxanê; dixwest ku çemê Zelê, Qeletûkan û Dûkan bibînê, lê nikaribû...

Hertim bibû şev ji bo wî, weke dema razayî. Wî nizanibû bê bigrî an jî bikene. Tenê axînan şûna her tiştî girtibûn.

Sala 2000 î mîna şevekî reş derbas bû. Gelek zarokan çav ji ronahiya dinê re vekirin. Gelek gulan rûdane rojê.

- Lê ez..! Hîna wisa me…..

……Min hîn jî gelek deverên welatê xwe nedîtiye. Ma dîtina Silêmanî; Hewlêr, Qamişlo, Efrîn, Mihabat û Sinê wê bimîne xewna tevahî temenê min? Hîn min tevahî deşt, gelî û zozanên welatê xwe nedîtibû. Min hîn jî gelek hevalên xwe nedîtibû, min hîn jî Serokê xwe nedîtibû.

Wê demê dengê awaza çivîkekî li ber guhê wî ket.

-Çi dengekî xweş e, lê çawa ye? Ma rengê wê reş e an sipî? Kesk e an jî belek e? Lê çawa be bila bibe, deng xweş e!

Ew deh sal bûn ku bala xwe li çivîkan nexistibû, ne jî bala wî kişandibû. Lê niha bii dengê xwe jiyan dida wî, hêza dîtinê dida wî. Wê kêliyê xweza bi dengê xwe temaşe yê wî dikir. Niha jî hêviyekî bêsînor dida wî û dilê wî dadigirt.

-Ma ez nabînim! Bi çavê kor be jî mirov ji gelek kesî zêdetir dibînim!

Hingî dibû hîn zêdetir zirav û dil şad dibû. Wî êdî ronahiya tavê di hundirê xwe de hîs dikir. Bêhna werzê bihara ku mirov salê carekî didît, wî tim hîs dikir. Azara dilê evîndaran, êşa dilê dayîkan di dilê xwe de hîs dikir. Ew çax wêneyê Serokatî bi çavên bêronahî didît! Ji her demî zêdetir hestên girêdana bi Serokatî yê re di dilê xwe de hîs dikir. Xwe li İmrallî dizanî. Zerdexaneyek ket ser lêv û rûçikên wî. Serê xwe rakir. Çavên wî girêdayî bû. Lê tevahî deşt, aso û xweza didît.

-Ez bi hîskirina xwe her tiştî dibînim. Tiştên ku mirov bi çavan jî nabîne, ez dibînim!

Bi hêvî bû, didît!

***Vegotin :Hejar***

# BERFA SOR

***"Şevek tarî…Mij û dûman Ji her alî berf û baran Ne hîlal û ne estêra Li ser guzê kundekî dixwend Gilokê berfa sor Xwe alandin li hevala Bêdeng kirin, Bêreng kirin, Xortê hêja Û dilovan"***

Xweza gelek caran bûye sedema êşên mezin, gelek caran jî bi xweşikbûna xwe di tevahî cihanê de bi nav û deng e. Xweza ya Mezopotamya ya Yezdanî, bi hesanî nayê behskirin û taswîrkirin. Ew gelek caran bû helbest li ser zarê helbestvana, gelek caran jî bû sitran û awaza hûnermenda , lê heya roja îro jî tu tiştî nikariye vê xwezaya pîroz ya ku serdemê Kurd li ser dijin, bi tevahî bînin ziman. Ev xweza ne bi tenê bi bedewbûna xwe navdar e, ew bi dîroka xwe jî xwedî şûnekî herî taybet e di dinyayê de. Lê bi sedema şer û pevçûnên ku heya sedsala bîstan dirêj kir û hîn jî dirêj dike, gelek şûn û cihên wê yê dîrokî, bûne kûrbana şerê lawê mirov.

Di Têkoşîna Rizgariya Netewî de jî, xwezayê Kurdistan du rolên serekî leyîstiye. A yekem, gelek caran xweza bûye şûneke pir bi ewle ji bo cengewarên (gerîlayên) Kurd. A duyemîn jî, bi sedan û bi hezaran gerîla bi sedema mercên

zor û zehmet ên zivistanê şehît ketine. Berfê ku li çiyayên vî welatî dibare ewqas pir e bi metiran berf li ser hev kom dibe. Gelek dever li Kurdistan hene ku, ji ber ku berf lê nahele çiyayên ji berfê çêbûne. Li gelek, deveran jî, çemê avê di bin berfê de dimînin û berf dibe mîna piran li ser rûbaran û gerîla jî mîna rêyan bi kar tînin. Gerîlayên Parastina Gelê Kurd jî, ji bo xwe ji zehmetiya zivistanê biparêzin, hîn di havînê de amadekariyên zivistanê dikin. Ji hêlekî ve şûnên ku lê dimî-nin ava dikin. Ji hêla din ve ji ber ku di zivistanê de gera gerîla kêm e, amadekariyên ji bo xwe perwerde kirinê tê ki-rin.

Sal 2001 li herêma Soran, Çiyayê Qendîl, meh meha Sibatê bû. Ev meh di nava kurdan de mîna meha dînik tê nasîn. Car caran reqe-reqa ewran e. Carna roj serê keçelan wisa dişewitîne ku mirov dibêje qey bûye havîn. Carna jî toviyên baranê cihokên avê diherikîne. Lê Sibata 2001 ê, ne mîna tu sala bû. Di wê mehê de takêşên (dengê) yê xwezayê serobino bibûn. Dola Kokê ku xeta di navbera başûr û rojhilat a Kurdistanê de ye, wate sînorê di navbera herdu perçayan de ye, bi zozanên xwe yê tazî ku ji goniya pê ve tu tişt lê nîne, tê nasîn. Tenê li qiraxê çemê Dola Kokê de dar şîn dibin. Ev der jî bi piranî cihên gûz, giwîj, hinar, kizwan û çinara ne. Li Qendîlê deverên herî zêde berf lê dibarin yek jî Dola Kokê ye. Ev demek dirêj bû ku heval Çekdar, Ednan, Xelîl, Sîpan, Dana, Sîlwan û hijmarêk din ji hevalan bi hev re li Dola Kokê diman. Wan cihê xwe yê perwerdê li jêr, wate di dolê de çêkiribûn. Her yekî ji wan hevalan, bi salan di çiyan de mabûn û bibûn xwedî tecrûbeyên mezin. Hevaltiya di nava wan de bêhempa bû. Heval Çekdar ji A-madê bû. Ew bi salan bû mîna bazekî, çiya ji xwe re kiribû hêlîn. Kesayetiya wî a şoreşvanî mîna hevîrekî, di tişta zor, zehmetî û rojên giran a şer de hatibû sitirandin û gihiştin. Ew gelek caran di şer de birîndar bibû, cara dawî jî ji serê xwe bi parçek mezin birîndar dibe. Lê wî xebata xwe ya bêsekin û bêhnvedan nedihişt ku kes bizane ku ew birîndar e. Ya rast

wî bi tevgera xwe û kena lêvên di simbêlan de, şerekî herî mezin bi bîrana xwe re dikir.

Hevalê Sîpan ji Hewlêrê bû. Dengê wî dema dihat gohên mirov te digot qey “şehîd Serhed li ser Hewlêr dilorî ne.”

Hewlêr qêrîna zarokan
Hewlêr lorîka dayîkan
Hewlêr kilê çavên bûkan
Hewlêr bi xwîna şehîdan....

Ew deng mîna lorînekî bi êş dihate gohên mirov. Ne tenê ev, heval Sîpan di karkirina xwe de jî bêsekin bû. Ger mirov li navekî din ê Sîpan bigere, mirovê navê “karkir” bibîne.

Heval Delîl jî ji Qamişlo bû. Wî bi salan di nava gelê welatparêz de xebat kiribû. Wî civaniya xwe di nava partiyê de derbas kiribû. Dema li Dola Kokê dima, êdî bi kopal dimeşiya. Tevî nexweşî û temen mezin bûnê jî, wî coşî dixiste dilê her hevalekî kêleka xwe de.

Ev hersê heval mînaka wê yekêneyê bûn. Ew yekîne mîna guldanekî lê hatibû. Her hevalekî jî mîna gulekî cihê xwe di gûldanê de çêkiribû.

Belê, meha 20 Sibatê 2001 ê bû. Piştî şerê ku di sala 2000 an de li Qendîl qewimî, partiya me PKK xwest ku xebatên rêxistinî di başûr de bi hêz bikin. Heya wê çaxê gelek rastiyên pîroz ji hêla gelê başûr ve, berovajî dihatin nasîn. Ji bo ku rastî naskirina armancên têkoşîna partiyê ye, di vê demê de li Dola Kokê konferansek dihat lidar xistin. Ji ber vê yekê partî gelek hevalên ku di nava gel de diman, vexwendin vê konferansê di nava wan hevalan de gelek hevalên başurî jî mînak heval Arî, Pola û hwd, gelek hevalên din hebûn. Her di wan rojan de berfeke bêeman dibariya. Pêşî berfê sipî her dever pêça. Paşî te digot qey, herî dibare wisa berfek rengê xwe sor dibariya. Darên guza ên Dola Kokê mîna pîrekî pişt qof, di bin berfê de xwar bibûn.

Şûna ku em lê diman, nêzî cihê wan hevalan bû. Ew çend roj bû ku heval Pola, ji bo çûna konferansê li ba me disekinî. Heya roja ku çû jî, hevalên li kêleka xwe keyfxweş û dil aş

dikir. Roja ku ew çû, hîna konferansê dest pê nekiribû. Lê ji bo amadekirin şûna ku konferans lê dihate dest pê kirin, tev di wê berfê de dixebitîn. Roja 23 ê Sibatê dema ew ji şûna xebatê vedigeriyan, hevalê Arî û Pola diçin serdana heval Çekdar, Sîpan û hevalên din. Roj hîna neçûbû ava. Van piştî li rewşa hev pirsîne, dest bi gotina serpêhatiyên xwe ên rabûrdu kirin. Dengê qundê ku li ser dara guzê diwen, dihate nava civata wan, ev bala herkesî kişandibû. Bi taybet di vê mehê de ku mitreyek û nîv berf bariya bû, xwendina qund ji bo herkesî nîşana xeberekî nexweş bû. Xwendina qundan di nava gelê me tê wateya bê siudî û malxirabbûnê! Lewra di zanyarî de jî ev gotin wateyekî xwe yê zanistî jî heye. Qund heywanekî pir hessas e û berî ku di xwezayê de an jî di cihê ku ew dimîne de bûyerekî biqewime ew hîs dike. Ji ber vê yekê jî bi berî bûyerê ew bi dengê xwe agahî dide derdorê xwe. Gerîla ku bi xwezayê re ewqas bûye hevkar, helbet hemû heywanê xwezayê jî dinase û wateyekî dide hemû helwestên heywanan…Xwendina qudê ji ber vê yekê nexweşiyekî di nav hemû hevalan de aj da.

Tevî ku bêr ji destê hevalan nediketin, lê bi hatina evarê re, barîna berfê zêdetir dibû. Deverên ku dihat paqij kirin, piştî çend deqan wek berê lê dihat. Berfa ku dibariya nebes bû, bahozê jî, ji girên jora me berf li dola ku em lê diman kom dikir. Wê şevê heya dema razanê me sê caran berf li ser mangên xwe avêt in. Lê bêfeyde bû. Berfa ku dibariya û a bi bahozê re li ba me kom dibû, tirsa hatina aşûtê di dilan de zêdetir dikir. Wê şevê kes ji me raneza. Ya rast cesareta xew kirinê li ba kesî ji me, nemabû. Her bihnekî hevalek an didu, dibû erikdarê avêtina berfê. Ê ku ji derve dihate hundir, te digot qey bi rengê sor hatiye mekyaj kirin. Poz, lêv û rûçik ji serman sor dibûn. Jixwe sobeya me a ku li ser darên berfê dihate gerim kirin, di wê şevê de rola xwe zêdetir dibû. Mîna zarokên ku di wê şevan de li dora pîrika xwe rûdinin û li çîrokan guhdarî dikin. Em li dora sobê kom bibûn. Ew rewşa me heya katjimêr 1:15 deqe dirêj kir. Wê kêliyê dengê

xumêniyek hat. Pêşî me nizanibû çi qewimî. Lê hîna kêliyek di wê navê re derbas nebibû, dengê hawarekî hat. Hingê diçû hewar nêzikê me dibû. Me ji deng zanî ku yê qîr dike û alîkariyê dixwaze, heval Kanî yê Kubanê bû. Dema em derketin derve û ber bi wî ve çûn, me ji nû baş jê fêm kir bê çi bûye. Qêrîn û girî li ser heval Kanî tevlî hev bibû. Tenê gotinek digot:

-Hevalan xilas bikin. Heval di bin berfê de man!

Heval Kanî ji serman re direcifî. Me ji wî zanî ku, manga heval Çekdar, Sîpan, Xelîl Ednan ku heval Arî û Pola jî mêvanê wan bûn, di bin aşûtê de man e. Pêşî kesî nedixwest ku bawer bike. Tevahî hevalên li Dola Kokê diman ji xelaskirina wan hevalan li wir kom bibûn. Bi çirayên destê xwe, em li şûna hevalan digeriyan. Mixabin te digot qey mirov di vê de rê de derbas nebûne. Berfê her dever bin xwe de rast kiribû. Ewqas bi lez û zêde aşût ketibû, darên guzan ku temenê wan ji 100 salî zêdetir bûn, ji kokê anî bûn der û bi ser manga wan hevalan de ketibûn. Hevalên ku ji bo rizgarkirinê kom bibûn, di cî de dest bi avêtina berf û daran kirin. Tilofên berfê nerim, di wê serma û bayê de mîna derziyan li rûyê hevalan ku xebatê rizgarkirinê dikirin, diket. Wê şevê bêrên li wir rane-diwestiyan. Bêr ji destek qerisî diçû destekê din. Kesî ji me li ê din nedipirsî, her kesî bi dil û can xebat dikir. Herkes bi hêviya xilas kirinê wan hevalan li wir diman. Rondikên hevalên bi êşa wê şeva bêbext re, bi ser şûna wan hevalan de diketin. Heya berê sibehê xebata rizgarkirinê berdewam kir. Hêdî hêdî laşê hevalan di nava berfê de diyar kirin. Keyfxweşiyê rûyê hevalan rapêçand. Mixabin keyfxweşî zêde dirêj nekir, bi derxistina hevalên destpêkê, hêviya kesî nema ku kes di bin berfê de sax mabe. Hîna xebat didomiya dengek ji koşeya milê rastê hat. Hevalên ku bi bêran kar dikirin, di cî de û bi lê ew devera ku deng jê dihat kolan. Piştî kêliyekî heval Sîlwan Efrîn û hindirîn ku di bin berfê de ew sax mabûn, hatin derxistin. Wê şevê herdu heval ji rengê mirovan derketibûn. Rûçikên wan

tev reş û şîn bibûn. Çavên wan werimîbûn. Tenê şensê wan ew bû ku, gava aşût tê, darek li ser cihên wan disekine û nahêle berf bi ser wan de zêde here. Li ser destê hevala Sîlwan nivîsek hebû. Ev nivîs silav û gotinên dawî ên wan hevalê di bin berfê de mabûn bûn. Berî ku ew heval şehît bikevin, silavên xwe ji Serokatî û hevalan re rê dikin. Heval Sîlwan jî ji ber ku nikariye defterê derîne, her tişt li ser mil û destê xwe nivîsandibû. Tevahî wesiyet û gotin di kêliyekî de li ser wî destê kom bibûn. Lê mixabin di hatina sibehê re û piştî ku xebatê rizgarkirinê bi dawî bû, me xwediyê wan gotinan bi laşê bêgiyan dîtin. Sîpan Hewlêr, Çekdar Amed, Arî Hewlêr, Delîl Qamişlo, Dana Sileymanî, Rêber Kerkûk, Pola Hewlêr, Xelîl Urfa, Ednan Qamişlo, Welat û Mîrxan bûne yazdeh berfînên Sibatê. Ew bûne yazdeh pepûleyên nû di nava artêşa pepûleyên pakrewanan de, bûne yazdeh stêrkên ji ezman rijiyayî. Lê ezmanê di dilê me de bi cî bûyî. Cenaze yê her yazdeh hevalên şehîd li Dola Kokê nêzî şûna mayîna wan hatin veşartin û ew der wekî goristanê şehît hate beyan kirin. Ew êdî dibûn awaz û helbestên ser zarê hûnermendan êdî hûnermend Delîl Mîrsaz li ser wan dilorand;

“Şevek tarî...Mij û dûman
Ji her alî berf û baran
Ne hîlal û ne estêr e
Li ser gûzê kundekî dixwend
Gilokê berfa sor,
Xwe alandin li hevala
Bêdeng kirin,
Bêreng kirin,
Xortên hêja û dilovan
Berfa reş a tawanbar
Tê çawa bersiv bidî,
Van rondikên ku çavên
Dayîkan tenê xwar
Tu yê çi bibêjî,

Wan hevalan ku ,
Dilê wan di qefesa singa wan de
Hilnayê
Tu yê çawa serê xwe hildî,
Li hember peytaxta welatê min?
Bajarê qele û minareya
“Holaka ya bi zêr
Goristanê bavê felek,
Li bajarê evînê.
Tu yê çawa bidî razî kirin
Van çîçekên ku ,
Rengê Ednan, Çekdar û Xelîl didin
Bêje berfa reşa tawanbar
Bêje,
Bêje,
Bêje!

Dilê Amedê dilerizî
Qamişlokê dil helandin
Ji hawara dengê Hewlêr
Silêmanî çav gerandin,
Dana,
Arî,
Sîpan,
Pola,
Çava digerînin,
We nebînim.
Li ber kelehê bendewarê we me.
Ji bo tu xwe bidî lêbûrandin,
Ji bo tu rondikên Kurdistanê min bidî
Rawestandin.
Ji bo yazdeh xûçeyên di gulîstana,
Welatê min de careke din
Bi bişkivin û bi bihizîn,
Divê tu dariv î berfa sora bêwîjdan

Divê tu darivî
Ji şikêr û quntarê Qendîl
Divê xwe tu berdî nava,
Bax û baxatên,
Şeqlewa,
Kerkûk
û Rûha yê.

Gul û gulzaran avdî
Bibî xunavêk,
Bi herikî bibî sûlavek.
Bila dengê xuşxuşa te,
Bibê orkestraya evînê,
Û di dilê xort û keçê welatê min de bijene
Bijene berfa sora malwêran
Bijene-bijene.

***Doxan Xezna***

# RASTİYEK Jİ AWİRAN DÛR

***"Êdî ew zarok bibûn desthilatdarên xeyalên min. Eger ez bibêjim; 'min wê çaxê Helepçe û Filîstînekî nû dît wê neşaş be."***

Ew du sal bû ku ez li nava çiyayên bilind û bi heybet ên Qendîlê de bûm. Bi sala bû ku min navê Qendîlê bihîstibû. Bi taybet jî, di dîroka Têkoşîna Rizgariya Netew a Kurd de, Çiyayê Qendîlê mîna dayîka ku zarokê xwe hembêz dike, wisa têkoşer û peşmergeyên kurdan hembêz û parastibûn. Heya niha jî li ber her çemekî, latekî, berpal û girekê Qendîlê, bêguman yan şehîdekê Kurd heye, yan jî şûna şerekî, diyar dibe. Dema navên Çiyayên Qendîlê têne bîra mirov, ev rastî pir zelal xuya dibe. Mînaka herî zindî jî, navê Çiyayê Qeletûka, Kanî Cengê û hwd. Ev herdu nav bes in ku mirov wateya Qendîlê a dîrokî binase. Belê piştî salên dirêj, êdî gerîlayên kurd li Qendîlê bi cî bibûn.

Dema ku cara yekem ez gihiştim refên gerîla, li Çiyayê Qendîl bûm. Hevalên min ên pêşî jî, min li Qendîlê nasîn. Ew çiyayê ku heya meha Temmûz û Tebaxê berf li lûtkeya wî dimîne, mîna dayîkekî bû ji bo me. Dayîk tevî ku gelek caran li zarokên xwe jî dixe, dîsa jî zarok pir pê ve girêdayî

dimîne. Tevî zor û zehmetiyên Qendîl jî, dîsa me pir jê hesdikir. Ji hêlek din ve, Qendîl gelek caran mîna dildaran bêxwezginî keçek kezî reş yan jî xortekî çavgeş ji me dûr dixist. Dûrxistineke bêveger! Ew keç û xort, rêhevalên me yên salan bûn. Bi çûyîna her yekî ji wan, girêdana me bi deşt û zozanên Qendîl re hîn bêhtir xurt dibû.

Qendîl ne tenê bi navê xwe navdar e, ew bi deşt û zozan, daristan, kanî, rûbar û keskahiya biharên xwe, mîna bihûşta ferdewsê, tim diyar e. Di dirêjahiya biharê de, zozanên Qendîlê ji reşmalên koçeran tê xemilandin. Mirov li wir bi dengê bilûra şivanan û sitranên berîvanan re xêrhatina biharê dike. Li Qendîlê pêwîst nake ku mirov mîna li bajaran gul û nêrgizan ji bo bêdewiyê biçîne. Bihar bi hatina xwe, tevahî Qendîlê mîna gulîstanekî xwedî her rengê gulan dixemilîne.

Belê du salan li kêleka heval û hogirên xwe, min di nava vê xwezaya yekta de jiyan kir. Piştî wê dema dirêj ji bo tevlîbûna perwerdeya li ser çapemeniyê, pêwîst hate dîtin ku em ji Qendîlê cuda bibin û biçin Xinêre. Min qet bawer nedikir ku ezê rojekî ji Qendîlê cuda bibim. Lê gava min xebera çûnê bihîst, du sal mîna du kêliyan di ber çavê min re derbas bûn. Tevî ku min du salên li Qendilê mîna du pirtûkên çapkirî di pirtûkxana dilê xwe dihiland jî, lê wê xeberê bandoreke mezin ya xemginiyê li ser min kir. Bi wê xeberê re, navê Xinêre ku em rêwiyê rêya wê bûn, mîna dengekî li gûhê min de deng vedida. Êdî her ku kêlî diçûn, rûpelek bi navê Qendîl dihate pêçan û yek bi navê Xinêre vedibû.

Roj 25 îlona 2001 ê, saet yek û nivê pişt nîvro. Piştî amadekariyên du rojan, me xuçikên rêwitiyê datanî ser milan. Piştî xatirxwestina ji rêhevalên du salan, bi xemginiya qûtbûyînê, em ketin ser rêya Xinêre. Li gel hevalên xwe "Tapo, Kawa, Herjîn û Cihan" em ji Radyo ya Dengê Gerîla bi rê ketin. Li dûv du salan ji mayîna min a li radyoyê, ev cara yekem bû ku ez dibûme koçerê rêyek wisa. Hevalan berî

derketina me, gotibûn ku heya “Xinêre” 6-7 roj meş e. Lê ji ber ku di rê de heval pir in, hûn zêde zehmetiyê nakişînin.

Jixwe di wê rojê de xemginî bibû koçerê rûçikên me. Min wê rojê bîranînê xwe yên du salan xistin binê xurçika xwe. Dema em bi rê ketin, her ku me gavêk davêt, min li paş xwe, li şûna ku radiyo dima dinêrî. Piştî meşa nîv saetî, em gihiştin girê jora radiyoyê. Ji wir meyzekirina me, cara dawî bû ku me li şûn xwe dinêrî. Tevî kovaniya cudabûnê jî, em bi çûna perwerdê pir dilşa bûn. Ew demek dirêj bû ku, me perwerde nedîtibû. Ji ber vê yekê me bi tevahî daxwaza xwe dixwest ku rojek berî a din, bighên Xinêre. Piştî çend saetên meşê, em gihiştin girê herî bilind ê Şehîd Harûn. Ji ber ku berî niha em li wir diman, min erdnigariya biryargeha Şehîd Harûn baş nas dikir. Hevalê Cihan ku bi temenê xwe ê herî mezin bû di nava me de, tim li paş me dima. Ji ber vê yekê gava em gihiştin serê gir, me navberek da meşa xwe. Wê çaxê roj li ber ava bû. Aso yê sor rengekî bedew dida deşta jêrî me. Hîn me çavên xwe ji meyzekirina wê bedewiyê têr nekiribûn, heval Cihan gihişte me. Heya em ji serê gir derketin dola biryargehê, roj çû ava û hêdî hêdî dinya tarî dibû. Bi tarîtiyê re em gihiştin nêzî çemê dolê. Xûşeniya çem, di dolê de, dengvedida. Ez û heval Tapo, ji ber ku li pêş hersê hevalên din bûn, em li cem çem sekinîn heya hevalên din jî gihiştin. Bi kombûyînê re, em berê xwe dan şûna ku heval lê diman. Hîna em dûrî wan bûn, ji nişka ve dengek hat.

-Ew kîne?..Ew kîne?

Heval Kawa di cî de bersiv da:

-Hevalin heval! Em ji Dola Kokê tên!

Wê çaxê nobedarê ku bangî me kir, ber bi me ve hat û got:

-Hûn bixêrhatin hevalno. Kerembikin.

Piştî bixêrhatin û li rewşa hev pirsîn, hevalan şîv ji me re, amade kirin. Lê ji ber ku em westiya bûn û pêwîst bû ku em sibehê zû rabin, paş şîv xwarinê, her yekî ji me betaniya xwe

girt û raketin. Ji ber westandina rê, em çiqas raketiban me nedigot bes e. Dema dengê hevalan hat jî: “roj baş. Roj baş” min got ku, ev şev çiqas zû derbas bû.

Ji Şehîd Harûn û şûn ve, min tu deverên din neditibû. Ji ber vê yekê, gava em bi rê ketin hevalê Kawa ku rê baş nasdikir, da pêş me. Di bin tava îlonê de, em heya nîvro gihiştin “Qeletûkan” Qeletûkan ku gelek caran min navê wê bihîstibû, sed qet ji tişta ku dihate gotin xweştir bû. Ew dever wisa asê ye, bi sedan heval, di nava zinar û dolên wê de, perwerde didîtin. Bi dehan rengê fekî û meyve di Qeletûkan de her sal berhem dide. Xelkên gundê li Qeletûkan jî, xwedîkirina kûfletê xwe, ji dewlemendiya xaka wir digirin.

Ji ber ku heval li wir nemabûn, em çûne gundekî li ser rê. Ew gund ji dûr ve nediyar bû. Dar û bexçeyên gund her dever kesk kiribû. Heya wê rojê jî, ew du sal bû ku, min gel bi giştî û zarok bi taybetî, wisa nêzik nedîtibûn. Vê dîtinê ez ji her hêlî ve dilşad kirim. Min gelek tişt li ser rewşa gelê me yê başûrê Kurdistan bihîstibû. Lê dîtina zarokên pêxwas, dest terikî, cil qetiyayî û rê gemarî ên vî gundî, ew rastiya ku min bi gotin bihîstibû, hîn bêhtir ji min re ronî û zelal bû. Wê çaxê min hîn bêhtir rastiya rewşa vî gelê perîşan nasî. Zarokên wan jî ne mîna ên dinyayê bûn. Te li rûyê wan meyze bikira, te yê bigota qey ev zarok bêdê û bav in. Lê dê û bavên wan jî hebûn, mixabin halê wan ji ên zarokê wan xirabtir bû. Ew zarok mîna gûlên ku bi zorê di nava xakeke hişk û ziwa de şîn bibin bûn. Gelek ji wan hîna baş nedipeyvîn jî, ketîbûne kolanê vê jiyana zor û zehmet de. Ew hîn di temenekî biçûk de, mîn dê û bavên xwe, yan di bin şivan, yan jî dibinê bexçevan û bi bêrên ku ji qama wan dirêjtir bûn, şînahî av didan. Rewşa wan zarokan, mîna tabloyekî ku tevahî hûnerê ressam ji bo wateyekî tirajedîk were diyar kirin bû. Ew ne sehneyek ji tiyatroyeke tirajedîk bû. Ew rasteqîna rewşa gelê me yê başûrê welat bû. Wê çaxê min ji xwe re got:

-Ger wênekeşek bi mekîna xwe re were vir û wêneyekî van zarokan bikişîne, wê xelata wêneyê herî tirajedîk werbigire.

Hîna min wisa dinêrî û diponijîm, hevalê Kawa got:

-Hevalno em biçin wê mala hanê xwarina xwe bixwun ji bo ku em zû bighên Kanî Cengê.

Ew mal, li ser rê bû. Gava em gihiştin wir, zilamê malê hîna li ser kar bû. Lê li malê zarokek mîna ên li kolanên gund dileyîstin hebû. Rewşa wî ji ên din zêde ne cewaz bû. Dema em rûniştin min jê pirsî:

-Tu diçî dibistanê?

Mixabin tiliya xwe ya piçûk ji devê xwe dernexist. Te digot qey, bi xendeya lêvên xwe dixwest biyaniya vê gotinê (dibistanê) di ferhenga xwe ya teng de bide diyarkirin.

Di wê kêliyê de bavê wî jî hate mal û li cıvata me rûnişt. Lê awirên min ji wî zarokî cuda nedibû. Min careke din ew pirsa bêbersiv mayî, ji lawik kir:

-Te negot, tu diçî dibistanê?

Hîna peyva min di pêşwaziya livîna lêvên ê zarok de bû, bavê wî bersiv da:

-Di gundê me de dibistan û fêrgeh tune ye.

Bersiva bav, bû mîna bendavekî li pêş pêlên pirsan. Min gelek pirs amade û rêz kiribûn. Lê bersiva tevahî pirsên min, ji bîra min da revandin. Ponijîna min, şûna peyv û pirsan tevan girt. Heya wê çaxê min pirtûka Apê Musa “Birîna Reş” nexwendibû. Lê rewşa vî gundî ku mînaka rewşa başûr e, bi taybet rewşa wan zarokan, weke ku sed carî Birîna Reş bi min dayî xwendin bû. Wan zarokên, di nava jiyana bi êş û zehmetî, nexwende û di nava tarîtiyê de jiyan kirin, pêlên xemginiyê li ber qiraxên dilê me tevan jor û jêr kir. Her ku diçê min dixwest bêhtir li wir bimînin. Mixabin piştî saetêk û nîvê em neçarbûn ku bi rê bikevin. Lê vê demê kurt gelek caran gaziya Cegerxwîn ji Robsor e bi bîra min dianî.

“Ey heval Robso

Dengbêjê cihan

Ne tenê reşik
Mane bin destan,
Ew jî sipîne
Mane parîşan”

Lê êdî Cegerxwîn jî nebû ku, vê rewşê bilêv bike. Tenê me bi awirên xwe, temaşe dikir û êşan par dikirin. Dîmenê wan zarokan, navê Qendîl û Xinêre jî, ji bîra min bir. Dema em bi rê jî ketin, her kêliyekî min li wê malê û bi taybet wî zarokê ku heya bihnekî jî, destê xwe ji me re dihejand, dinêrî.

Piştî wê rojê em pênc rojên din jî meşiyan. Tevî ku min gelê deverên weke Kanî Cengê, Dola Ayşê, Berde Nazê, Berde Sorê, Hecî Umran, Kela Şînê û hwd. dîtin ji ew gund û zarok ji bîra min nediçû. Te digot qey, rûpela bi navê Xinêre jî li ber vê dîtinê winda bû. Êdî ew zarok bibûn desthilatdarên xeyalê min. Eger ez bibêjim; min wê çaxê Halepçe û Filîstînekî nû dît, wê neşaş be.

Ew dîmen bû mîna wêneyekî û dilê min jî jê re bû çerçewek (pîrwaz). Heya niha jî di şûna xwe de ye û wê her di wir de jî bimîne.

***Şivan Kavê***